


kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 73 | 2019



bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 73 | 2019

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Arvin Berçemi, İbrahim Korkmaz, Xizan Şilan,
Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Mem Xelikan, Mehtap İdeli,
Muzaffer Özgür, Ecevit Yildirim, Hesên Huseyin Deniz,
Rohat Alakom, Memê Mala Hine, Mistoyê Heco,
Hozan Chia

Adress

Navnişana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

E-post

info@apetryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:

Ewrupa: Muzaffer Özgür

Bîrnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanyay

Tfîn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medyâ Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

Abone ji bo du salan

Swêd: 400 SEK - Almanyay 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:

(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baski: Apec-Tryck AB



Bûkika ku Zara Hacî İwiş bi hunera xwe çekiriye.

Wêneyên bergê:

Şerê li ser çaw I, 110 x 90 cm, teknika tevlîbeve a li ser çaw
ji firça Hasan Huseyin Deveci

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tîn,
serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin ji, li xwedîyan
nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliyay Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

Ji bîrnebûnê 4	56	Ew bê min nake Mem Xelîkan
Alî Çiftçî		
Malmîme dîsa li bajarê Kolnê çalakî li dar xist 7	64	Pîrika Merxûr Mistoyê Heco
Muzaffer Özgür		
Nameyek ji Xorasanê 8	67	Bîranîyek ji lîseyê Cihanbeylîyê İbrahim Korkmaz
Hozan Chia		
Di kurdî-kurmançî de girîngiya ziman 9	69	Dekleresyona kurdên êzdî Rohat Alakom
Hesen Huseyîn Denîz		
Kurdên Çorumê 13	73	Westandim Xizan Şîlan
Muzaffer Özgür		
Li vir jî hene 23	74	Hevpeyvînek bi Zara Hacî Îwiş va Memê Mala Hine
Arvîn Berçemî		
Koçberiya kurdan berbi Swêdê 26	82	Helbest Seyfî Doğan
Rohat Alakom		
Gotinên çê û nêçê-1 40	84	Reşo-II- Ecevit Yıldırım
Nuh Ateş		
Kilama şînê 55	88	Kurtenasandina romana <i>Li benda keskesorê</i> Nuh Ateş
Mehtab Îdelî		

Ji bîrnebûnê

Sala 2019an bixêr hatî!

Ez tu cara heta niha ji salên nû re bi qasî îsal bi hêvî nebûme. Ez vê li ser navê xwe û her wiha ji bo kovara Bîrnebûnê jî weng dibînim.

Sala 2018an bi bûyerên xweş û nexweş me li paş xwe hişt! Bi hêvî û kelecaneke nû em ketin sala 2019an. Her bûyeraka nexweş bi xwe re yeka xweş jî tîne.

Li ser axa welatê me, sala borî pir tişt bi xweşî û nexweşî qevimîn. A ku em bikin, ji yê nebaş ders û tercuban werbigrên û yê xweş jî li her derê bi kar binin. Îro, piştî ku li Rojava û Başûrê welatê me kurdan li hember DAIŞê ji bo însanetîyê berxwedaneka pir erênî dan, zora DAIŞê birin û li cihanê sempatiyeka erênîya rind wergirtin.

Erka ku niha li ser milê me ye, em vê sempatiyeka li cihanê bo mîletê me peyda bûye rind bi kar binin. Ev jî dikeve ser milê her kurdekî ku li derveyî welêt dimê, xwe wek "diplomatekî" welatê xwe bibîne û ji lobîya kurda ya li derveyî welet re bibe alîkar. Ji ber vê ez li neslê me yê nû pir bi hêvî me ku dê bi hev re li xwedîtîya vê sempatiyê derkevin û di qada navnetewî de

em ê bi hev re nixrên xwe yê netewî biparêzin û nasnama xwe bi pêşde bibin.

Dibe ku hemû hêvîyên ku em li sala 2019an dikin ne rast bin. Lê, bêhêvî û daxwez ti karûbar bi ser-nakevin.

Tiştê ku bi rastî ez hêvî dikim danûstendineka bi hêz bi we xwendevanên birumet ên dilpak re ye. Sebeba ku me bi hêz dike her hûn in. Rexneyên we, dilxwezîyên we her me dilşad û pêşve dibin. Bi xwedîderketîna we em wek koma hevkarên Bîrnebûnê piştî 21 salan her bi hêz û berfireh bûne.

Xwendewana/ê me yê doh îro hinek ji wan bûne hevkarê kovarê, nivîsa dinivîsînîna û bi karê perwerdê û xwedî li nasnama xwe derdikevîn. Kar û xebatên pîroz dane ber xwe û kar dikin. Em ji van û hîn ji yê din bi hêvî ne ku dê ev tradîsyon û helwesta kovarê xwedî derkevin û bi hêvîya ku hejmarê van kesan hîn zêde û berfireh bibe, sala 2019an li we pîroz dikin.

Bi hêvîya ku ev hejmar jî wek yê din li gor dilê we be, bimînin di xêr û xweşîyê de heta hejmarê bê!

Ali Çiftçî

Em, kurdên Anatoliyayê li Swêdê dixwazin li hemû baxçeyên zarokan û mekteban bi zimanê dîya xwe dersa heynin.

Çima bangeka bo înzayê?

Me wekî Weqfa Kurdên Anatoliyayê, dest bi bangeka înzayê kiriye. Xwasteka me ji vê bangê ev e; li bexçeyên zarokan û mekteban dixwazin hînbûna zîmanê dayîkê li hemû bajar û şaredariyên li Swêdê bê dayîn.

Daxwaza me ne ku em ê zîmanekî nû biafirînin. Zîmanê kurdî, zîmanekî kevn î qedîm e! Lêbelê, rastiyeke me jî heye ku ev zîmanê me yê ku rojane li malê tê dengkirin, li bexçeyên zarokan û mekteban jî vere dayîn.

Ji bo ferqa zîmanê rojane û perwerdê da dê û bav zahmetî dikşînin. Loma jî ew nikarin alikariya zarokên xwe bikin. Ev jî dibe sebeba ku zarok bi sernakevin.

Ji ber heta niha bi sedan sal in kurdên me perwerdeya bi zîmanê kurmancî nedîtine. Ji bo vê yekî jî ferqa kurmancîya herêmî gelek pêşda çûye.

Ji bo ku ev ferqa devokên herêmî ji ortê rabin divê em siftê zîmanê xwe yê herêmî baş hîn bibin ku ji kurmancîya gelemperîya nivisînê re bingeh be.

Jîyana xerîbîyê ji aliyê zîman û kultur de ji bo kurdên me pir bi zehmet e. Xerîbên xwedî dewlet gelek îmkanên xwe hene. Ew xwedîyê medya ne; bi sedan televîzyon û medyayên wan hene.

Rojane ji bo ku ji zîman û kultura xwe bi dûr nekevin dikarin bi rêya îmkanên nû bişopînin. Ji ber kurdên me ji îmkanên weng bêbar in rûbirûyê têkçûn û helandinê ne! Ji ber vê rastîyê em wek waqif ketin tewgereka veng.

Daxwazên şaredariyan çi ne?

Dema me wek waqif daxwaza ku *li hemû baxçeyên zarokan û mekteban bi zimanê diya xwe hînbûna zimanê kurdî* li şaredariya kir; ji bo ku ev kar bi rêk û pêk bê kirin hinek daxwazên wan ji me hebûn. Divê em sebebê vê daxwazê pêşkeşî wan bikin. Ka çiqas kes, malbat perwerdeya zimanê dayîkê dixwaziye. Taleb çiqas e? Ku ew jî li gor vê talebê bikaribin pêdiviyên ku bên kirin amade bikin. Eger daxwazeka /talebeka mezin hebe ew ê di komiyonekê de bikaribin biryarekê bigrên û bi me ra têkevin têkilîyê. Bo wê jî ev banga me ya înzeyê karê şaredariya hêsan dike ku biryarê bigrên û bo vê jî ev banga înzeya lazim e.

Perwerdeyeka çing?

Sistema perwerdeya Swêdê wexta daxwaza hînbûna dersa zikmakî hebe li her şaredariyê qanûnî ye ku ev daxwaza bi cîh bê. Ji şeş salîya, ji sinifa amadeyîyê de ji bo hînbûna zimanê dayîkê heftê de saetek divê perwerdeya bi zimanê dê bê dayîn. Em wek waqif ji şaredariya dixwazin ku ev perwerdeya zimanê dê ji aliyê mamosteyên ku kurmanciya herêmê jî dizanin ve bên dayîn. Ev perwerde ji sinifa amadayî heta sinifa çaran divê bi kurmanciya herêmê be. Dema zarokan zimanê rojane bi rihetî dengkirin û xwendin û nivisandin rind hînbûn bi şûnda yanê ji sinifa çaran bi şunda ku dibin 10 salî, hêdî dikarin normal zimanê nivîsê pêşde bibin û perwerdeya kurdî bi gelemperî werbigrên.

Weqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê

Hunermendê me yê ji Anatolîya Navîn Malmîme dîsa li bajarê Kolnê çalakî li dar xist.

Muzaffer Özgür



Malmîme
(Hasan Hüseyin Deveci) û
John Herman
(Foto: M. Özgür)

„Krieg auf Leinwand
Şer li ser Tûal ê”

Wênekare me yê hêja Malmîme (H. Hüseyin Deveci) di roja 15.11.2018an de li bajarê kolnê di atolyê xwe de pêşengehek bi navkirina „*Krieg auf Leinwand*” li dar xist.

Yek John Herman (Hunermendê Performansê) şerwanekî kevn û xaziyê çiyayên Kurdîstanê. Yek jî Malmîme ji ber şer cîhûwarê xwe berdayê û hatiyê li Almanyayê dijî. Du hunermend hatine ba hev û ji

bo rexnekirina pîşesaziya (endustrî) çekan bernama xwe amade kirine.

Bêşa yekemîn di roja 24 gulan 2018an de hatiye li dar xistin. Bêşa duyemîn de nezikî 40 dost û hezkirên hunerê hatin ba hev.

Muzîkwanê belçikî beşdarvan bi çoşeka mezin silav kirin. Rûdaw TV jî wek bername kişand.

John Herman bi almanî û îngilizî, Malmîme jî kurdî û tirkî xeber da. Serkeftin berdeyam e.

Nameyek ji Xorasanê Tolhildan

hozanchia100@gmail.com

De sêrî da xebata we a hêja pîroz dekim. Ez kurdekî bakûrê Xorasanê me. Koka toperê(êşîr) me je Semsûrê ye. Mixabin em panced salan e je Kurdistana xwe da sewa zilma tirkên hov dûrketinê. Lê her ku çax û dem radevire eleqeya min pirtir min berve Kurdistanê va dekişîne.

Çaxa ez le bûyerên ku de ser toper /eşîr û bajarên kurdan ra derbaz kirine fikir dekim nikam pêşîya hêstiran bigirm. Heta van salên dawî komkujîyên wek Meraş û Melet, Dersim, Agirî, Zilan, Koçgirî û ... ku tê da zarok dehatin goruyandin û mezin dehatin qelişandin û kelandin bû para xweng û birayên me.

Gelê me xwedî dîroka herî kevnare û herî kême je panzde hezar salan berê pêva le ser axa Kurdistanê jîyaye. Lê heta nika jî tu mafê me yê jîyanê tineye. Gelê me yê Bakûr û Rojhelat sewa parîyek nênan yan gere dev je welêt berdin yan biwin çax û koley dagîrkeran yan wek parsek û hejar bijîn. Yê Rojava ku ta astek gîştine mafê xwe yê mirovatî tûşê komkujî û gefên tirkan û ereban dewin. Min je kovara we ya hêja hêvûsî ku bajarek wek Reqa warê eşîrên me yê resen bûye ku nika le Xorasanê jî hene. Min zanîbû ku rejîma Sûrî gelek cihwarên me rêş kirine û ereb şandine şûna kurdan. Lê ev destkeftîya mezin a Rojava we xwîna gelê me ra hat damezirandin û nika le ber hêrêşê van tirkên hov û cehadî ne.

Bapîrên me çarsed salan zimanê me yê resen kême û zêde parastin. Lê mixabin çel pence salên dawî zimanê me ro we ro rût û tazîtir dewe û berve qirbûnê

va tere. Mixabin le Kurdistanê jî ta astek rewş werganî ye. Levira wer bûye ku kesî le şûna peyvên farisî ku têketine zimanê me bixaze ên kurmancî biwêje zare wî dekin û pê dekenin. Wek mînak êdî de nav xelkê me nûsîkn bûye *çespîn* hêvirîn bûye *texrib* bûn şemitîn yan qêj bûn bûye *sur xwarin* û gelek peyvên din şûna xwe we yê farisî ra guherandine. Eger hewin jî de hinek dewerên biçûk da tîn gotin û de kûranîya bîra bavên me da mane û we mirina wan je bîr dewin. Loma kovara we pir sewa birayên me yê Anatolîya Navîn hêja ye.

Eger ziman qirbiwe gîşt hest û nirxên me yê netewatî jî pêra binax dewin. Dûra xebata me ya sîyasî û mafxwazî girîng e. Dewletên tirk, ereb û ecem berê em pêjîqandinê û em guhasîtinê Xorasan, Qezaxistan, Qirgîzistan, Efqanistan, Misir, Anatolîya Navîn û herderê. Lê em bi hêvî ne rokê vegeîrîne nav hemêza Kurdistanê û heta ku je dest me tê gere alîkarîya kurdên welêt bikinê ta welatê me serxwe biwe.

Nika tirk, ereb û ecem je Kurdistanê gaz, petro, zêr, zîv û her tiştê deguhêzin nav bêrika xwe. Eger em şe nekin teknolojîya xwe be pêş va biwin û we şe nekin de her mijarê jîyanê da xweser biwin û we şe nekin çek sewa parastina xwe çê kin tu car je koletîya kujerên xeng û birêne xwe nafilîtinê. Ez hertim kovara we deşopînim û dexwînim. Pir pêra şa dewim. Hêvîdar im xebat û lêkolîn û hay kirina we her ku dem radevire zêde biwe û bandora xwe pirtir de ser gelê me ra raxine. Sipas je we ra!

Di kurdî-kurmancî de girîngiya ziman

Hesen Huseyîn Denîz

Zimanê peyvîkî

Zimanê peyvîkî ji devê mirov di nava lêvan re bi guherandina hilma ji keze-bê tê, derdikeve. Ji nava heyîneyan tenê mirov dikarin zimanê peyvîkî bi kar bînin. Mirov ji bo hest, raman, daxwaz û armancên xwe bikaribin ji yekî/ê din re bînin ser ziman, zimanê peyvîkî bi kar tînin. Bêguman ev ziman bi hêsanî derneketiye holê; di nava kar, xebat û jiyana civakî ya hezarên salan de saz bûye. Mirov berê dikarîbû deng derxe, lê nikarîbû bipeyive. Ji bo peyvîvandîne, çêkirina peyvan û ji bo vê jî derxistina dengên cuda cuda tê xwestin. Divîbû ev deng tev ji ji aliyê mirovên wê civakê -ango wê girseyê ve- bi awayekî hevpar hatiban pejirandin û bikaranîn. Mirov her ku fêrî axaftinê bûn, ji bo her liv, kar û tevgera xwe dengêkî cuda derxistin. Mînak; ji bo karê çûyîne, gotin; 'diçim', ji bo karê hatîne, gotin; 'têm' û hwd.

Bêguman ji bo bikaribin van peyvan ji dev derxin, pêdivî bi dengan hebû û her dengêk wek tîpekê hat diyarkirin. Ev tîp destpêkê tenê bi awayê dengdar (bêdeng) dihatin bikaranîn lê bi pêşveçûna ziman re tîp an dengên dengdêr jî lê hatin zêdekirin.

Mirovahî her ku li pêş ket peyvandina xwe dewlemendtir û zelaltir kir. Di dema şaristaniya sumeriyana de gihişt qada bikaranîna nivîsandîne. Bêguman di pêşveçûna zimanê peyvîkî de derbasbûna nivîsandîne pêngaveke pir grîng e. Mirovahî heta roja me li ser vê pêngavê bûye xwediyê çand, wêje û dîrokeke mîratemayî.

Bi dîtina nivîsandîne êdî mirovahî ji zimanê peyvîkî derbasî zimanê nivîskî dibe.

Zimanê nivîskî

Zimanê nivîskî ji ber ku bi çav dikare were dîtîn, di ziman de rastkirin, rêzîkdanîn û xemilandineke rêzîmanî bi xwe re derdixe holê.

Zimanê peyvîkî çawa were bihîstin, wiha tê axaftin, lê zimanê nivîskî ne wiha ye; bi çav tê dîtîn û bi rêka fêrbûne mirov li gor armancê dikare bîne ser ziman. Dîsa zimanê peyvîkî bi rêka dev û guhan çiqasî dirêj bijî jî herdem dikare winda bibe û li qayî hilweşînekê were. Lê zimanê nivîskî bi sed salan jî dikare li ser parçeyê çerm, li ser berekî yan li ser rûpelekê wek xwe bimîne, qet winda nabe. Zimanê peyvîkî jî, zimanê

nivîskî jî, ji bo vegotina mirovan bi awayekî berfireh tên bikaranîn. Mirov tenê bi vegotinê dikare hest, raman, daxwaz û armancên xwe ji mirovên din re diyar bike. Çi bi rêka nîşaneyan be, çi bi rêka peyvan be û çi bi rêka nivîsandinê be, mirov bi rêka xwevegotinê bûye mirov. Vegotina nivîskî û ya peyvî bi rêka ziman pêk tên lê divê ev vegotin bi ramanê werin stiran û bi armanc û wateyê li gorî rêzik û planekî werin hûnandin. Ger ne wiha be, her axaftin an her rêzkirina peyvan li pey hev nabe vegotin. Vegotineke baş bingehe xwe ji nivîsandin û peyvandineke rast digre. Mirovekî şaş bipeyve, nikare xwe rast vebêje. Dîsa mirovekî daxwazeke xwe şaş nivîsandibe, nikare gazindan ji xwendevanan bike, bêje ‘hûn şaş têdigihêjin mebesta min’.

Zimanê kurdî jî zimanekî herî kevn ji yên mirovahiyê ye. Ji sedema negihîştina jiyaneke azad a li ser erdnîgariyê serbixwe, zimanê kurdî jî her di bin bandora zimanên din ên li derdorê de maye. Bi dîtina û bikaranîna nivîsandinê jî, ji ber van sedeman zimanê kurdî derfeta vegotina nivîskî nedîtîye û demeke dirêj tenê xwe bi awayê vegotina peyvî jiyandîye. Ji ber vê yekê ziman ew derfeta gihiştina rêzikên rêzimanî yên ji aliyê herkesî ve werin pejirandin û

bikaranîn bi dest nexistiye. Bêguman her zimanek di nava xwe de xwe-diyê rêzikên rêzimanî ye, lê gava ev neyên nivîsandin û bi rêka fêrkirin û fêrbûnê derbasî nîfşên bînan, di navbera dev û guh de wê hilweşandin û çewtkirinekê bijîn. Ger zimanê kurdî ne zimanekî zêde bi bingehe ba, niha ji mêj ve wê ji holê rabûba. Lê zimanê kurdî ji sedema xurtbûna xwe, tevî hemû astengiyên, xwe daye jiyandin û bi taybetmendiyên xwe yê li gorî xwe, ev sedemên çewtkirin û hilweşandinê ji bo xwe kiriye navgîna xwenuhkirinê.

Di kurdî-kurmancî de hilandina peyvan a pev ve

Ji ber vê yekê zimanzan dibêjin, ‘Peyv li ser ziman çawa hêsantir werin, ziman li gorî wê xwe nuh dike. Ji bo vê jî gelek tîp ji nava peyvan dikevin an hildiweşin. Lê kurdî bi vê hilweşînê ji cewherê xwe dernakeve, bêhtir xwe nuh û dewlemend dike. Mînak; peyva ‘ev roj’ bi demê re bûye ‘îroj.’ Her du tîpên ‘e’ û ‘v’ ketine, tîpa ‘î’ hatiye şûna wan. Bi vê yekê him peyvandin siviktir bûye, him peyveke nû ya kurdî li xurçika zimanê kurdî zêde bûye û him jî di gotina peyvê de xwenuhkirinekê çêbûye. Ger ji bo vê xalê em çend mînakên din bidin, em dikarin wiha rêz bikin:

Ev sal: Îsal
Nuh: Nû
Ev şev: Îşev
Destpêk: Despêk
Sitêrik: Stêrk
û hwd.

Wek zimanê kurdî, malbata ku di navê de cih digre jî xwediyê xurtbûn û dewlemendiyekê ye. Zimanê kurdî di nava malbata zimanên hind-ewropî de cih digre û zimanekî bingehîn ê jî vê malbatê ye. Malbata zimanên hind-ewropî îroj li ser erdnîgariyeye berfireh, ji Rojhilata Navîn heta Ewropa û Amarîka û gelek deverên din tê bikaranîn.

Di kurdî-kurmancî de zayend

Zimanê kurdî-kurmancî xwediyê rêzik û taybetmendiyên li gorî xwe ye. Ji vana yek jê, bikaranîna zayendan e. Di zimanê kurdî de her navek û peyvek li gorî sazûn û bikaranîna xwe yan zayenda nêr, yan zayenda mê, yan jî zayenda nêrûmê (notr) diyar dike. Kesên piştî fêrî zimanê kurdî dibin di bikaranîna zayendê de zahmetiyê dikşînin û pirayî şaş bikar tînin, lê yekî jî dayika xwe fêrî ziman bûbe zayendan rast bikar tîne. Mînak; peyva 'sêv' navê fêkiyekî ye. Dema bi tenê serê xwe be bi awayê nêrûmê wek 'sêv' tê nivîsandin. Lê gava di nava hevokê de were

bikaranîn, divê nêr an mêbûna xwe diyar bike. 'sêva min.', 'sêva bi darê ve.', 'sêva di selikê de.',...û hwd.

Di vê derê de tîpa 'a' ya hatiye dawîya peyva 'sêv' zayenda mê diyar dike. Di zimanê kurdî de tîpa 'a' zayenda mê, tîpa 'ê' zayenda nêr dide diyarkirin. Ev ji bo kitbûna peyv an navan wiha ye, lê dema bibe kom, nêrbûn û mêbûn ji holê radike û wekhevî çêdibe. Mînak;

Mê: *sêv / sêva sor / sêvên sor*

Nêr: *dest / destê min / destên min.*

Ji vî awayê tewandinê re **veqetandek** tê gotin. Wek di van mînakên de jî tê dîtin ev rêzik û taybetmendiyê zayendî hevsaî û dewlemendiyekê dide zimanê kurdî.

Zayenda di veqetandekê de gava navdêrek û navdêrek, navdêrek û rengdêrek, navdêrek û cînavkeke xwedîtiyê, yan navdêrek û hokerek bi hev re werin bikaranîn xwe nîşan didin.

Ger em hinek mînak bidin:

Navdêrek û navdêrek:

Sêva Şîlanê

Navdêrek û rengdêrek: *Sêva sor*
navdêrek û cînavkeke xwedîtiyê:
Sêva wê

Navdêrek û hokerek: *Sêva li vir*

Gava em li van bikaranînan dinêrin, em dibînin li dawîya Şîlanê jî tîpa ê li ser navê Şîlan hatiye zê-

dekirin. Di vê rewşê de êdî tewang derdikeve pêşberî me.

Tewang jî berûvajî veqetandekê gava navek bi tena xwe be û bi navdêr, rengdêr, cînavk an hokerekê re girêdana xwe tine be, yan bi pey de lêkerek were derdikeve holê. Em mînakekê ji bo tewangê jî bidin:

Sêva Şîlanê: ê ya dawî tewanga mêbûnê ye. Mirov vê tewangê ji cînavka xwedîtîyê ya kesa mê nas dike.

Sêva wê: ev ê ya dawî û ê ya li dawîya Şîlan heman zayendê didin diyarkirin.

Sêva Siloyî: î ya dawî tewanga nêrbûnê ye. Mirov vê tewangê ji cînavka xwedîtîyê ya kesê nêr nas dike.

Sêva wî: î ya li dawîyê û î ya li dawîya Silo heman zayendê didin diyarkirin.

Li hinek herêman zayenda nêr hatiye avêtin û li hinek herêman jî her du zayendan wek zayendekê bi kar tînin. Lê ev kêmkurtiyên herêmî ne û bi awayê rêzimanî divê zayend werin parastin.

Di kurdî-kurmancî de tewandina cînavkan

Di kişandina lêkeran de, cînavkên lêkeran ji bo dema niha û dema bê bi awayekî û ji bo dema borî bi du

awayan tên bikaranîn. Di dema borî de li gorî gerguhêzbûn û negerguhêzbûna lêkeran cînavk jî tên guhertin.

Mînak; dema mirov lêkerên gerguhêz (transîtîve) bikar tîne, ji bo dema derbasbûyî mirov nikare cînavên di Dema Niha û Dema Bê de tên bikaranîn, bi kar bîne:

Ez dibînim. -Dema niha

Ezê bibînim. -Dema bê

Min dît. -Dema derbasbûyî.

Di vir de mirov li şûna hevoka 'Min dît', nikare hevoka 'Ez dît' bi kar bîne, ji ber ku li gorî taybetmendîya tewandinê ya zimanê kurdî cînava 'ez' ditewe, dibe 'min.'

Bêguman tewandin jî hêsanî, hevsaî (aheng) û dewlemendiyekê dide zimanê kurdî.

Cînavkên di dema borî de bi lêkerên gerguhêz re tên bikaranîn, di dema niha û bê de erka cînavkên xwedîtîyê digrin ser xwe.

Cînavkên kesane

Ji bo dema borî **Ji bo dema niha** **ji bo dema bê**

Lêkerên gerguhêz	hemû lêker	hemû lêker
Min	ez	ez ê
Te	tu	tu yê - tê
Wî, wê	ew	ew ê
Me	em	em ê
We	hûn	hûn ê
Wan	ew	ew ê

Kurdên Çorumê

Muzaffer Özgür



Xerîta bajar û bajerokên Çorumê¹


Tê zanîn ku kurdên Anatolîyê li gelek bajaran belavbûne. Lê wek kolonî li du heremên Anatolîyê dijîn. Me di kovara bîrnebûnê de, di gelek nivîsanda behsa kurdên Anatolîyê kir. Ezê di vê nivîsa xwe de li ser kurdên li cografya/bajarê Çorumê hene/dijîn de çend agahdarîyan binivîsînim.

Dîrok û jîyana kurdên Çorumê jî ji kurdên din yê heremê ne dûr e. Di çavkanîyên dîrokî de hatîyê eşkerekirin ku kurd ji welatê xwe bi rêya koçbûnê û surgûnkirinê hatine derxistin. Ew rastîya dîrokê heta sedsala 11-12an diçe. Dema em kurdên Çorumê bînin ziman dibe ku em behsa kurdên zêde li ber çerxa asimilasyonê de helîyan û zimanê xwe bîrkirî dikin.

Di dîroka erdnîgarîya Çorumê de Şarîştanîya Hattî (BZ. 2500-BZ. 2000/1700) hebûye û dû re jî Hitît (BZ.1680-BZ. 1178) hatinê li wan deran cihûwar girtine. Paytaxta wan jî Hattûşaş (Boğazköy) e. Di herdû şarîştanîyan de şopên gelên Aryan hene. Zanistîya dîrokê de gelek lekolînwan dibejîn koka wan ji aryana tîn. Ew ne mijara me ye. Lê eger herdu şarîştanîyan koka xwe ne arî bin, kesekî arî/kurd hebûyê û şopa

¹ www.google.de


xwe di dîroka Hitîta de hatiyê dîtin. Arkeologa li ser tabletan li Hattûşaşê hatin dîtin de ev tespîtkirine û veng jî nivîsandine. Li paytaxta hitîta de li qesra kral seyîsekî bi navûdeng hebûye, navê xwe jî Kîkûlî bûye.



Hîndekarnameya Kîkûlî

Bi we nivîsê re telîmnameya (hîndekarname) Kîkûlî te gotin. Kîkûlî li ser du tableta de ji bo hesp timarkirin/Perwerdekirin û tenduristîya wan agahdarî nivîsandine (BZ.1500). Tableta wî 1080 rêz in û bi zimanê Hitîta nivîsandîye. Ew tespît hîn jî di dema niha de aktuel in. Li jêrenotê de ji bo kesê ew nivîsandî jî du agahdarîyên balkêş hene. 1-Seyîsê hespan Kîkûlî, 2-Ew ji welatê Mîtanîya ye. Ji wan agahdarîyan te fehmkirin ku li Çorumê kurdê yekemîn Kîkûlîyê kurê Mîtanîya ye!²

Îzady di pirtûka xwe ya bi navê „Kürtler“ da nivîsandîyê ku; Kurdên Anatolîyê li du cihûwar an bi hejmarên pir nîştêcih bûne. Ew jî Anatolîya Navîn û Bakûrê Anatolîya Navîn e. Nivîskar xerîtek (li jêr e) jî di pirtûka xwe de belavkiriye. Dema behsa bajarên Kurd lê dijîn yên li Bakûrê Anatolîyê dike, bajarên wek Kırşehir, Yozgat, Çorum, Tokat, Amasya, li nezîkî wan jî bajarên Kastamonu, Sinop û Samsunê dinivîsîne.



Du heremên kurdên Anatolîyê³

² www.dirokakurdistan.com / Ali Husein Kerim

³ Îzady, Mehrdad R., *Kürtler*, Weşanên Doz, 2004-Îstanbul

Tê zanîn ku eşîra reşîyan di dîroka Osmanîyan de li Kurdîstanê wek rêvabir roleka mezin lîstîye. Reşîya di dawîya sedsala XVII. de heta dawîya sedsala XIXan li Meletî, Mereş, Edene, Sewas û Çorumê desthilatî kirine. Osmanîya ji bo kurdên koçber kontrol bikin di dema desthilatîya Reşwanzade Mehmet Paşa de (Boybegê Mereşê bûyê) îdarekirina bajarê Çorumê dane lawê wî yê bi navê Reşwanzade Omer Paşayê 1.(yekemîn) (6 Nîsan 1722).⁴

Di dema tanzîmatê de li Çorumê 16 Eşîrên niştecihkirin hatine tespîtîkirin. Piraniya wan jî kurd in. Dedeslî, Cihanbeylî, Kuyumcu, Araplu, Kavlı, Cecelü, Hatal, Alamaslı, Kutlu, Çorum Ekradı, Lék, Cayan Yörüğanı-Ballı Yörüğanı, înullu, Çakallı, Şeyhbizinli û Kutluca.⁵

Nivîskarê me birêz Nuh Ateş di nivîsa xwe ya bi navê „*Batı Kürtleri Gerçekliği ve Çözüm Perspektifleri üzerine sesli düşünceler*“ de ji pirtûka Cevdet Türkyay (Başbakanlık Belgelerine göre Osmanlı İmparatorluğunda Oymak, Aşiretler ve Cemaatler) lîstek amadekiriye li gor vê lîstê Eşîrên li bajarê Çorumê jî evin. Alçul, Aliçul, Ballı, Kavilî, Lek, Milli, Milli Karılı, Muslihli, Seyyid Vend, Şeyhan, Zeyve(Zeyveli), Badilli, Bozgeyikli, Eđer Kürdü, Kıran(Kıranlı), Salar, Tayılar(Dayılar), Velili⁶

Dem a behsa Çorumê bû bajaroka Îskîlîpê roleka xwe ya taybet hebûye. Îskîlîp heta sala 1900î giredayî bajarê Kastamonuyê bûye. Paşê derbasî ser bajarê Çorumê kirine. Nivîskar birêz Rohat Alakom di lêkolîneka xwe de ji pirtûka Dîroknasê Kurd M. Emîn Zekî Beg (Kürt ve Kürdistan Ünlüleri, Apec, 1998-Stockholm) agahdarî nivîsandine. M. Emin Zeki Beg di pirtûka xwe de behsa Kurdên Îskîlîpê dike. Dinivîsîne ku gelek Kurd li wir dijîn, ew ji Kurdîstana Başûr jî bajarê Îmadîyê koç kirine û hatine li wir bi cîh bûne. Sebeba we jî bi dergeha îskîlîplî va girêdide. Birêz Alakom; Dîsa dinivîsîne ku Îskîlîp navenda kurda bûye. Dema Osmanîyan de li Çorumê ji bo pirsên di navbera kurdan de bèn zelalkirin Qadîtîya Kurdan hatiyê avakirin (ji Eröz, Mehmet).⁷

Li Tirkîyê di sala 1927an de ji bo nifûsa xwe eşkere bibe serjimarîya gelemperî çebûyê. Li Çorumê 247.926 kes hatine nivîsandin. Kesên

4 Söylemez, Faruk, Osmanlı Devletinde Aşiret Yönetimi (Rişvan Aşireti Örneği),

Weşanên Kitabevî, 2007-İstanbul

5 Ji teza Doktoraya Korkmaz, Şerif, *Çorum İdari, Sosyal ve Ekonomik Yapısı Tanzimat-II.Meşrutiyet* -Gazi Üniv.-2003

6 *Birnebûn*, hejmar 1, 1997, rûpel 13 -21


7 Alakom, Rohat, Orta Anadolu Kürtleri, Weşanxana Apec, 2003-Stockholm

zimanê dayîka xwe kurdî hatin nivisandin jî; jin: 6.687, mêr: 5.624, Tevûhev: 12.311 kes (% 5) Kurdbûne.⁸

Birêz Rohat Alakom di pirtûka xwe de agahdarîyên li ser hejmara kurdên Çorumê berfireh dike.

ÇORUM	MER	JİN
Merkez û gund	1.140	1.379
Hüseyinabat (Alaca)	260	315
İskilip	851	1.080
Mecitözü	3.054	3.675
Osmancık	19	19
Sungurlu	300	219

Di dema Dewleta nû ya tirkan de jî kurdên li dor aliyê Çorumê hatine desteserkirin. Li gor belge-nameya li jêr agahdarî hene.⁹



TC. Başbakanlık, Cumhuriyet Arşivi (1932)

Di salên 1960an de li gundên kurdên Çorumê dibistan hatine vekirin. Bi dibistanan re jî asimilekirina kurdan destpêkiriye. Di salên 1970an de kurda dev dane metropolên mezin, piraniya wan li Ankara û İstanbulê cihûwar girtine. Li welatên Avrupa jî gelek Kurdên Çorumê dijîn. Di dema 27 Gulan-10 Tîrmeh 1980 de li Çorumê li ser kesên bawerîya xwe

8 TC. İçişleri Bakanlığı, *Nüfus ve Vatandaşlık Genel Müdürlüğü İstatistikleri, 1927 Nüfus sayımı*

9 Ji arşiva komela KOMKURD-AN/Ankara. (Di sala 2017an de li gor qanûna Rewşa Awerte -2935

OHAL madde 11, benda o- Dewletê dest da ser û qedexê kir.



Elevî lîstikên dewletê çebûne û qetlîyameka mezin hatiye kirin. Nasyonalîstên tirk bi piştgirîya dewletê erîşî ser mehelleya Mîlönû ya bajêr kirin û 57 kes hatin kuştin û bi sedan jî birindarbûn. Li dawîya erîşê gelek kurd bûn koçber ketin rêya welatên Avrûpayê. Pîranîya wan jî li Almanya, Fransa û Danîmarkayê dijîn.

Kurdên li Çorumê yê bi bawerîya ewlî bi du rêyan hatine wir. Komêk di dema Osmanîyan de (1813) li dawîya serhildana Velî Paşa ji Meletîyê, komêk jî ji Dersîmê hatine sûrgûnkirin. Ji derwayî wan jî di dema serhildana hemberî Biyikli Mehmet Paşa de kurd di şer de biserneketin û ji Amedê hatine surgûnî doralîyê Çorumê bûn. Kurdên ewlî dibêjin em ji Horasanê hatinî, ji ber ku îmkanên min tunen ez lêkolînekê bikim ji vê mijarê dur dikevim. Ji bo kurdên Elewî ocaxê Şîx Çoban, ji bo kurdên sunnî jî dergaha îskîlîplî cîhekî taybet bûye.



Li aliyê çepê ji bajaroka Alaca, gundê Büyük Keşlik (Nesimi Keşlik) Ocaxê Şîx Çoban Tirba Pîr Nesimî Dede û li keleka wê jî mezelekî dîrokî heye. Li aliyê rastê jî Cemxana Ocêx.¹⁰

10 www.alevinet.com

Kultur û jîyana kurdên li Çorumê ji kurdên aliyê Ankara û Konyayê pir ne cûdaye. Ji aliyê zimande pir cûdatî tune. Lê ziman li wan deran de gelek asîmîlebûye. Çend taybetmendîya jî binivînim. Di nav Reşîyên û Canbegên Çorumê de ji aliyê bawermendîyê de elewî hene. Çima? Gerek bê lêkolandin. Li wir jî Reşî, Şexbizeynî, Canbek, Millî hene.

Ji bo tekîliya kurdên Çorumê û kurdên aliyê Ankara û Konyayê jî meriv dikane çend gotina bêje. Malbatên ji aliyê Çorumê hatin hene û li nav gundan de belavbûne. Te gotin ku nivê gundê Hacimusa (Polatlı) ji Çorumê hatina. Hatina wan li ber yasaya paşnav girtinê bûye û paşnavê malbatê jî Çorum e. Ew malbatên hatinê canbeg û hanefî ne. Li gundê Yüzükbaşı (Polatlı) malbatek heye û ji gundê Bekaroğlu (Çorum) hatine, canbeg û berê elewî bûne. Ew malbat hîro jî bi navê Bekaroğlu te naşin.¹¹

Serjimarîya gelemperîya 1990î de jî hejmara kurdên bajarê Çorumê 23.700 kes hatine tespît kirin.

BAJAR	NIFÛS	
	2017	2015
MERKEZ	294.050	274.990
ALACA	31.594	32.581
BAYAT	16.509	17.726
İSKİLİP	32.248	33.806
KARGI	15.195	15.432
MECİTÖZÜ	14.937	15.710
ORTAKÖY	6.848	8.368
OSMANCIK	42.922	43.439
SUNGURLU	48.554	50.162
BOĞAZKALE	3.686	3.866
UĞURLUDAĞ	6.074	6.738
DODURGA	5.904	6.061
LAÇİN	4.602	4.817
OĞUZLAR	5.299	5.628

Li gor îstatistikên dewletê nifûsa Çorumê di sala 2017an de 528.422 kes in. 261.605 (%49,51) mer û 266.817 (%50,49) jî jin in.

¹¹ Di sohbeta bi nivîskarê me Memê mala Hine re eşkere bûn.



Dîmenek ji gundê Dûdüklük

Straneka kurdên Çorumê

Lo Lo Xwodê¹²

Lê lê min go ezê herim pe serî zevîyan de

pe serî baxan de, pe serî maxan de

Valla min got ezî hîro pir derlime

Ezê vexwûm, ezê serxoş bibim bi serî van derdan da

Valla min îşev dîsa rinda xwe dî di xewnan de oyy oyyyyyy

Lê lê min lo Xwodê lo lo Xwodê

Valla ezî li te şikatçîme lo lo Xwodê

Valla te rinda xelkê gîşko lê ra yazmişkiriye

Te çîma rinda min ve min nedayêê ax

(DÎSGOTÎN / NAQARAT)

Lê lê min got pe min navê te ge Elîfê ge

Valla bejn zirave, teng zayîfe

Valla ezê herim rinda xwe bibînîm

De hevayî sar e baran, berfe

(DÎSGOTÎN)

Lê lê min go besê walî dirêj meke

Valla serê derdê birîna vemeke

Lê lê min got va yaziya Xwodê yê ge

Xwodê hakî yazmişkiriye ge

Valle em çi bikin jî fayde nake, fayde nake

(DÎSGOTÎN)

12 Çavkanî: Stranbêjê heremî Ali Cemdali

Dema meriv li gotinên strana birêz Alî Cemdali mezedike, ji alîyê ziman de di navbera Kurdên herema Ankara-Konya-Kirşehir-Aksarayê de pir cûda tî tuneyê. Rewşa asimilasyonê gelek pêşta çûyê û zimanê tirkî gelek ketîyê nav ziman. Stranbêjên heremî wek mînak Alî Cemdali, Selahattin Toprakçı, Hasan Yavuz, Baran Alp, Metin İstanbullu, Gopsenlî Ayhan û Grup Mesin li dawet û şahîya bi kurdî strana dibêjin û ziman didin jîyandin.

Lîsta gundên kurdên Çorumê

Bajar	Bajarok	Gund û Agahdari	
ÇORUM	Merkez (25)	GÖKÇEPINAR	
		SARAYLI	
		SARIKAYA	
		SARILIK	
		AKSUNGUR (MICIKLAR), Kurmanc, Hanefî, Canbeg	
		MEMİŞLER, Kurmanc, Hanefî, Canbeg	
		MUSTAFA ÇELEBİ, Kurmanc, Elewî	
		DÜDÜKLÜK, Kurmanc, Elewî, Kavli /Pilva /Dirêjan	
		BEKAROĞLU, Kurmanc, Elewî, Kavli /Pilva /Dirêjan	
		SANLI OSMAN (Karlıosman), Kurmanc, Elewî, Kavli	
		KADIDERESI, Kurmanc, Elewî, Kavli	
		KOZULCA, Kurmanc, Elewî, Kavli	
		MOLLAHASAN (Milhesen), Kurmanc, Elewî, Kavli	
		SOYCAK, Kurmanc, Elewî	
		SIRIKLI, Kurmanc, Elewî, Canbeg	
		AŞAĞI SALLIK, Kurmanc, Hanefî	
		YUKARI SALLIK, Kurmanc, Hanefî	
		BEKTAŞOĞLU, Kurmanc, Elewî	
		AŞAĞI ÜÇDAM, Kurmanc, Elewî	
		YUKARI ÜÇDAM, Kurmanc, Elewî	
		SARIYER, Kurmanc, Elewî	
		PEDERLER, Kurmanc, Elewî	
		MORSÜMBÜL, Kurmanc, Elewî	
		KIRAZLIPINAR(haydutoğlu), Kurmanc, Elewî, Kavli	
		KARAKEÇİLİ, Kurmanc, Elewî	
		Alaca (23)	AGUÇAN
			AKÇASOKU (Ağçasoku), Elewî, kavli, hatiyê terkkirin.
			BÜYÜKDONA
			BÜYÜKHIRKA
			BÜYÜKKEŞLİK,(Navê kevn: Nesimî Keşlik) Elewî, Kavli Bêşeka Ocaxê Şêx Çoban li vi gundiye. Eşîra Kavli girêdayî Ocaxê Şêx Çoban e. Merkeza ocaxê li Dersim/ Mazgirtê ye.
			ÇEVRELİ
			ÇIKHASAN, (Bazarlı)
			ÇIRÇIR, Kurmanc
			ÇOMAR, Kurmanc, Elewî, Reşî
			ÇOPRAŞIK
DEĞİRMENÖNÜ (Dibareş), Kurmanc, Elewî, Kavli			
GAZİPAŞA			
GÖPSEN			
HARHAR			
HAYDAR, Elewî			
KABİLKIŞLA, Elewî-girêdayî Ocaxê Şêx Çobane, kavli			
KARGIN			

	KOYUNOĞLU, Kurmanc, Elewi
	MAZIBAŞI, Kurmanc, Elewi
	NESMİ KEŞLİK, Kurmanc, Elewi
	SOĞUCUK, Kurmanc, Elewi
	ŞIHÇOBAN
	YÜKSEKYAYLA
Bayat (12)	
	AKSEKİ, (% 50, Kurd)
	AŞAĞIEMİRHALİL
	AYVALICA, (Zurnacılar)
	BEYDİLİ
	ÇAMLIGÜNEY (Kışla)
	EMİRHALİL
	İSHAKLI, (% 50 Kurd)
	KÖPÜKLÜ, (% 50 Kurd)
	KURUÇAY,(Kürtköy) (% 25 Kurd)
	SARAYKÖY, (% 50 Kurd)
	YUKARISARAY, Kurmanc, Baziki û Canbeg
	AŞAĞISARAY, Kurmanc, Baziki û Canbeg
İskilip (8)	
	AKKAYA
	AVHATYAKASI, (% 25 Kurd)
	ÇUKURKÖY, (% 25 Kurd)
	KARLIK
	KARINCALI, Kurmanc, Elewi
	KILIÇDERE, (Asimile büne, gundê dayika politikwan Naci BOSTANCIye)
	SUHİLAN
	YERLİKÖY, sunni
Laçin (4)	
	ÇEMBERLİPİNAR, Şexbizni, Haneft
	GEMET, Şexbizni, Haneft
	KARASOKU, Şexbizni, Haneft
	SITMA, Şexbizni, Haneft
Mecitözü (6)	
	FINDIKLI, Kurmanc, Elewi, kavli
	Güngörmez
	KARACUMA, Kurmanc, Elewi
	KAYI, Kurmanc, Elewi
	KOYUNAĞILI, Kurmanc, Elewi
	Kurbağalı, Kurmanc, sunni
	TOTALI, Kurmanc, Elewi
	YEŞİLOVA (Bedan), Kurmanc, Elewi
	Sungurlu
Uğurludağ (6)	
	KARAKISIK
	RESULOĞLU
	SAZKÖY
	ÜÇDAM, (% 25 Kurd)
	YARIMCA, (% 25 Kurd)
	YENİYAPAN, (% 25 Kurd)
Ortaköy (16)	
	ASARKAVAK Kurmanc, Elewi
	BÜYÜKKIŞLA Kurmanc, Elewi
	CEVİZLİ, Kurmanc, Elewi
	ESENTEPE, Kurmanc, Elewi
	FINDIKLI, Kurmanc, Elewi
	İNCESU, (% 50 Kurd)
	KARAHACIP, Sunni
	KAVAKALAN, Kurmanc, Elewi

	KIZILHAMZA, Sunni
	ORUÇPINAR, Sunni
	SALBAŞ, Kurmanc, Elewi
	SENEMOĞLU, Kurmanc, Elewi
	YAYLACIK (Göpsen), Kurmanc, Elewi
	YUKARIKUYUCAK, Kurmanc, Elewi, Canbeg
	ASAGIKUYUCAK, Kurmanc, Elewi, Canbeg
	İMAT
Sungurlu (12)	
	AŞAĞIBEŞPINAR
	ASAYİSKARAHACI
	BEŞDAM
	BEŞKIZ, Kurmanc, Elewi
	DEMİRŞEYH (KALEHISARI-TEMURLU)
	DEREKİŞLA
	HACIOSMAN
	KALENEROĞLU, Kurmanc, Sunni
	KULA
	MEHMETALİÇİFTLİĞİ
	SARICALAR
	YEŞİLOVA (Kızılbeğir, Büyükkızıl) Elewi
Osmancık (1)	
	BALTACIMEHMETPAŞA, (Karaağaç), Eşira Çakallı, 29/Za/1266 (Hicri): Di navbera Qeza Zeytun û Osmancikê de li zozana bi navê Karaağaçê de ji Eşira Çakallı merivêkî bi navê Topixozli Kurd Bekir hebûyê û li vi gundi hatiyê niştcehkirin.

116 Gund

Gotina dawîyê; bawerim ew nivîsa min amadekirî bibe bingeha lekolî-neka berfireh. Dibe ku li ser lîsta gundan kemasî hebin. Ji bo kemasî û şaşitîya leborîna xwe daxwazdikim.



Dîmenek ji Gundê Molla Hasan

Çend çavkanîyên din:

Nişanyan, www.nisanyanmap.com, İbrahim Satılmış, *Barikatlar Düşerken*, Ozan yayıncılık-Anı, 2013
 Facebook; *Çorum Kürtleri*, TC. İçişleri Bakanlığı, *Nüfus ve Vatandaşlık Genel Müdürlüğü İstatistikleri*
 Wikipedia, Google.com

Li vir jî hene

Arvîn Berçemî

Germahiyêke wiha hebû ku mîna ji erdê agir bilind bibe solên di lingan de nerm bûbûn. Binê lingan dişewitiyan. Xwêdan bênavber diherikî û beriya bikeve erdê difirûya. Her havînê di dema esrê de wiha dibû. Mirovên ku neçar diman biçin derekê yan jî karekî bikin xwe didan ber wê germahiyê. Belê bi salan wiha bû û hîn bûbûn, lê her cara ku ji siyekê yan jî ji derekê hênik derdiketin bêhna wan mirovan teng dibû bi qasî kêliyêkê. Bêguman piştî wê kêliyê ji bîr jî dikirin. Rêzwan jî ji wan yek bû ku îcar bêhna wî ne kêliyêk, demekê teng bûbû. Tûrê li ser milê wî û çenteyê di destê wî de dikir ku germahiya ji erdê hîn zêde hîs bike û zêdetir xwê bide.

Demali otogarê li ber siyekê sekinî mîna ku ji malê heta wir henaseya xwe girtibe bi carekê de henaseya xwe berda û bi tiliya beranekê dilopên xwêdanê yên li eniya xwe berhev kir û bi bêhn tengê reşand ser betona germ. Bîst deqê mabû ku otobus bi rê keve. Tiştên xwe da alîkarê ajokar ku tiştên rêwiyan di bin otobusê de bi cih dikir. Kêliyêkê li derdora xwe nihêrt, mirovên ku di nav lezgîniyekê

de bûn şopand û herî zêde guhdariya wan kir. Pir baş dizanibû ku dê heta demekê dengên wiha nebihîsta û difikirî ku dê qet dengê zimanê xwe nebihîze. Bi dengê alîkarê ajokar cara dawî li derdorê nihêrt û siwarê otobusê bû.

Hundirê otobusê hênik bû û mîna ku cemidî be hinekî bêtevger ma û paşê xwe vezeland. Di cama mezin re derdor temaşe dikir û zanîngeha xwe dianî bîra xwe. Li bajarê ku cîranê bajarê wî bû dixwend û ew havîna yekem bû. Fêm nekiribû ku ew sal çawa derbas bûbû. Havîn hatibû û xwe di nav kar de dîtibû. Neçar bû bixebite. Her havînê di karê avahiyê de dixebitî û bi wî awayî xwendina xwe didomand. Vê havînê hosteyê wî li bajarê ku bi qasî deh saetan dûr bû kar girtibû. Qet ew qas dûr neçûbû û bajarên ku jê re xerîb dihatin nedîtibû... Cihê xwe xweş kir û xwest rakeve. Çavên xwe girtibû ku ji paş dengê bihîst. Pîrekê bi dengê nerm digot ku ew rê naqede. Lê ne xema Rêzwan bû, wî dixwest ku di wê hênikahiyê de rakeve. Lê nekaribû, heta demekê çavên wî nehatibûn girtin. Piştî bêhnvedana

nîvsaetê, gava ku roj diçû ava xewê ew kiribû paşîla xwe.

Dema Rêzwan çavên xwe vekirin rojê ronahiyên xwe yên pêşîn li ser serê darên li derdora rêyê belav dikirin. Bajarê mezin ji dûr ve xuya dibû. Paytexta tirkên bû û hinek tişt bi wî nas dihatin. Mîna ku berê dîtibe hin avahî gelek nas bûn. Di demeke kin de ketin nava bajarê. Li ber ronahiyeke sor sekinibûn ku dengê pîran li paş xwe bihîst: “Dîsa neviyên min dê ji min dûr bisekinin û bi min re neaxifin.” Dengê din lê zivirand: “Çima tu wisa dibêji?” Rêzwan di navbera paldankan re bi dizîka li wan nihêrt û gava serê xwe zivirand dengê pîrê yê bixemgîn bihîst: “Ez bi tenê çend peyvên tirkî dizanim û neviyên me jî kurmancî nizanin. Loma em ji hev fêhmakin.” Kalo bi armanca dilminikirinê got: “Ma ew ê çawa hîn bibin ku derdora wan hemû tirk in û dê û bavê wan jî bi tirkî diaxifin. Bi awirên te ji tê fêhmakin, ziman ne girîng e.” Rêzwan li pêşîya xwe dinihêrt û li ser tiştên ku wan digotin difikirî. Çi zehmet bû ku neviyên û pîr ji hev fêhmakin û çî xemgînî bû ku pîrê bi zimanê xwe ji neviyên xwe hez dikir û neviyan fêhmakin. Xwe bisûd dihesiband ku her du ziman jî baş dizanibû.

Bi axaftinên wan re di nav fikirinê de bû ku bi carekê de dît ku otobus ketibû nava avahiyekê. Bi hişyariya alikarê ajokar re fêhmakin kir ku hatibûn. Çawa daket li hosteyê xwe geriya. Hosteyê wî jê xwest ku ew derkeve qata sêyemîn. Bi matmayî derdor dişopand, otogareke mîna avahiyan çêkiribûn û di her qatê de otobus hebûn. Dicirifiya. Pêşî fêhmakin nekir ji ber xwe xerîb hîs dikir an na. Dûre tê gihîşt ku hewa sar bû. Ji dibistanê dizanibû û hat bîrê ku bişev û serê sibehê sar bû wir... Piştî demeke ku li derdorê geriya hosteyê xwe û çar hevalên xwe yên gelek caran bi hev re xebitibûn dît. Wan tiştên xwe danibûn ser hev û li berojê rûniştibûn. Li benda otobusê bûn. Ew jî çû tev li wan bû. Di wê navberê de Rêzwan bajar temaşe kir. Ji qeleha bajarê wî jî bajarê wî wisa xuya dibû. Lê avahiyên li wî bajarî hîn mezin û pîr bûn. Piştî bîskekê otobuseke pîr kevn hat û ew siwar bûn. Şaş mabû; li paytexta xwe otobuseke ew qas kevn bi kar dianîn. Nêzî du saetan bi rê de çûn û li gundekî ku mîna ji demên pîr kevn mabû peya bûn. Xaniyên li derdora rê wiha bûn, lê yên dûr nûjen û gelek xweşik bûn. Li kêleka rê qehwexaneyek û dikanek jî hebû. Li ber qehwexaneyê sekinîn û

hosteyê wî telefona yekî kir û got ku di nava nîv saetê de dê erebeyek were û wan bibe.

Gundiyan bala Rêzwan kişandibû. Pir dişîbiya gundiyan bajarê wî; cilên wan, tevgerên wan. Wê gavê pir dixwest dengê wan bibihîze û bi wan re biaxife. Di wê kêliyê de mêrekî navsere di ber wan re derbas bû û silav da wan. Rêzwan bi matmayî li wî nihêrt. Rû, por, simbêl û şelwarê wî ew qas nas bû ku wê kêliyê fikirî ku ji bajarê wî hatiye. Nediket serê wî û bawer nedikir ku ew qas bişîbin hev. Hîna di nava wê tevliheviyê de bû ku hosteyî wî got ku li qehwexaneyê rûnin û çayê vexwin.

Qehwexaneyêke biçûk bû. Li ber maseyekê çar ciwan rûniştibûn û okey dilîstin, li maseyekê jî çend mêrên navsere çay vedixwarin. Maseya li kêleka ciwanan vala bû. Ew jî çûn li wir rûniştin û çay xwestin. Her kesî bi awayê veşartî li wan dinihêrt û wan jî ne mîna wan lê bi dizikî li wan dinihêrt. Bi hatina wan re bêdengiyek çêbûbû. Gava çayger çay danî pêşiya wan dîsa deng bilind bû di nava qehwexaneyê de.

Rêzwan ji hevalê xwe li kêleka xwe re digot ku ew gund û gundî bi wî nas tî, dengê li ber guhê wî ket.

Bi carekê de sekinî. Li rûyê hevalê xwe nihêrt, hevalê wî bi pistepist pirsî ku çi bûye. Rêzwan tiliya xwe ya şanîdanê bir ber lêvên xwe û bi baldarî guhdarî kir. Îcar dengê zelal hat û her duyan jî bihîst: “Ez niha okeyê li serê te xim tu bibîne.” Dengê din jî bersiv da: “Bavê te jî were nikare okeyê lê xe.” Keneke zirav derdor dagir kiribû ku Rêzwan li wan ciwanan nihêrt û rastî awirên xortekî bi bejn û bal hat. Bi qasî kêliyêkê li hev nihêrtibûn ku Rêzwan pirsî:

“Hûn kurmanc in?” Xort bi rehetiyêke aşkere got:

“Erê.”

“Ji ku ne?”

“Ji vir in.” Rêzwan bişîrî û bi tatêl pirsî ku ji eslê xwe ji ku ne. Wî xortî bi bişîrîn got ku ew ji wir in û kurdên Enqereyê ne. Rêzwan bawer nedikir ku li paytexta tirkên kurd hebin û kurmancî biaxifin. Di rê de gazinca pîrekê guhdar kiribû. Ji maseya kêlekê mêrekî navsere şewqeyê di serê xwe de danî ser maseyê. Bi tiliyên qusiyayî porê xwe yê zivîn xurand û di nav simbêlan re got: “Li vir jî hene. Li vir jî kurd hene.” Rêzwan bi matmayî yek bi yek li wan nihêrt û bi fedokî qultek ji çaya xwe vexwar.

Koçberiya kurdan berbi Swêdê

Rohat Alakom

Kurd berê xwe didin Ewrûpayê

Angorî yek ji wan efsaneyên ku di derbarê Silêman de tê gotin qiral Silêman qasî 500 rihan sirgûn dike û wan dişîne serê Çîyayê Zagrosê. Paşê ev ev rihên esraringîz û bisir ku wek cin tên nasandin berê xwe didin Ewrûpayê bona her yek ji xwe re bedewekê hilibijere û bi xwe re bîne. Di dawiya van zewacên balkêş de kurd peyda dibin.¹ Angorî şaxeke din Silêman qasî 40 dêwan dişîne Ewrûpayê bona wî 40 jinên xweşik bînin. Dema vegeêrê dibînin ku Silêman miriye. Ew jinên Ewrûpayê dibin yên wan.² Angorî şaxeke vê destanê Silêman bona harema xwe nû bike, jinên xweşik ji xwe re bîne 500 şervanên xwe dişîne Ewrûpayê. Lê belê dema ew vedigerin tên, mêze dikin ku Silêman miriye. Ew vê carê van jinan ji xwe re dibin serê çîyan. Zar û newiyên wan li hev zêde dibin, di dawiya van zewacên

bi kîtelevî de bavik û kalikên kurdan peyda dibin.³

Di derbara vê mijarê de nivîskareke emerîkayî E. A. Nolan pirtûkeke zarokan bi forma çîrokan nivîsî. Pirtûk berî du salan bi zaravayê kurmancî û zazakî der çû. Di vê pirtûkê de nivîskar berê 500 kurdan dide Îrlandayê. Kurd bi xaliçeyên xwe yên efsûnkirî difirin diçin Ewrûpayê. Keçên xaman yên îrlandî van kurdan bi dilgermî pêşwazî dikin. Paşê xortên kurd û keçên îrlandî gotinên xwe dikin yek û bi dilşahî vedigerin Kurdistanê.⁴ Di dema seferên vîking û xaçperestan de têkiliyên gelên ewrûpî û kurdan jî mimkûn e bi forma zewac û mêrkirinê pêşta çûne, rêyên hin kurdan li Ewrûpayê ketibin. Di dîrokê de çawa em dibînin ji ber sedemên cihê gelek kurdan berê xwe dane Rojavayê û çûne derketine Ewrûpayê. Angorî lêkoleran van têkiliyan gelek şop li pey xwe hiştine. Tîpên porzerîn û

1 Margaret Kahn, *Cinlerin Çocukları*, Avesta, 2002, rûp.11.

2 Ingmar Karlsson, *Inga vännar utom bergen*, 2017, rûp.27.

3 Kurderna, *Aftonbladet*, 2/7 1959.

4 E. A. Nolan, *Hêstirên Graniyê*, Apec, 2016. Bona danasîna pirtûkê binêre: Rohat Alakom, Hêstirên Graniyê, *Birnebûn*, nr 64/2016, rûp.65-67.

çavşîn ku li hin deverên Kurdistanê tîn dîtî di dawîya encamên van tîkiliyan de pêkhatine. Ev tîpên nordic (bakûrî) gelek bala lîkoleran dikşîne. Çawa tê zanîn zimanê kurdî yek ji wan zimanan e ku di nav zimanên Îndo-ewrûpî de cih digre. Tîkiliyên zimanî û çandî yên hevbeş di nav komên neteweyî de bala gelek lîkoleran kişandîye. Kurdistan û Ewrûpa dîsa nêzikî hev dibin.

Di encamên şer, pevçûn, lêdan û sirgûnê de gelek kurd mecbûr mane welatê xwe hiştine çûne gelek herêmên dûr û biyanî. Van bûyeran şopa xwe di folklorê kurdî jî hiştiye.⁵ Herêmên ku di dîrokê de wek Trakya, Rumelî û Balkan hatine navandin gelek caran bûne mekanên kurdan. Wek mînak di sedsala 15an de perçeyê Stembolê yê Ewrûpayê sê gundên kurd saz bûne. Bi sirgûn çûne wir. Ji ber êrişên moxolan kurdan berê xwe dane Rumeliyê. Hebûna kurdan li Balkanê bûye mijara lîkolînekê.⁶ Ji çavkaniyên dîrokî em fêr dibin ku Bedirxan Paşa xwestîye xwendekaran bişîne Ewrûpayê. Di dawîya vê serhildanê de dewlet gelek

kurdan dişîne sirgûnê, hinek ji wan wek mînak tîn Nivgrava Balkanê. Ji-neke kurd ji herêma Maraşê bi navê Fata Reş di sala 1854an de bi 300 sîyarên xwe ve tevayî diçe Stembolê û li ser Bûlgarîstanê re diçe tevî Şerê Qirimê dibe. Angorî rojnameyekê dema vegeerê tenê ji wan 300 sîyarîyan 12 kes li bal hebûne.⁷ Gelo çi hate serê wan 288 kesên din? Hin kurd tek tek di demên cihê de hatine Ewrûpayê. Sîyarekî kurd di manevreyê leşkerî ku di sala 1835an de ji aliyê Prusya û Rusyayê de li Polonyayê çêdibe bi tevgerên xwe yên akrobatîk serketineke mezin nîşan dide. Ev kurdê ji aliyê Surmeliyê paşê tê Berlînê.⁸ Belkî jî ev kes kurdê yekem e ku vî bajarî zîyaret dike. Di sedsalên 19 û 20an de çend kurd wek înfîrmator û alîkarên rohilatnas û kurdologan hatine Ewrûpayê. Wek Ehmet Xan ji eşîra Baban ku di sala 1853an de hatiye Parisê ligel Chodzko Alexander di derbarê zaravayên kurdî de kar kirine.

Di sedsala 20an de êdî kurd rêya Ewrûpayê baş fêr dibin. Gelek kurd li welatên Ewrûpayê cîwar dibin,

5 Rohat Alakom, "Kambaxa vê sirgûnê" - Di Folklorê Kurdî De Stranên Xeribiyê, *Birnebûn*, nr 29/2006, rûp.36-45.

6 Ali Husein Kerim, *Balkan Yarımadası'nda Kürtler*, Evrensel, 2011.

7 *Türkiyet, Göteborgs Handels- och Sjöfartstidning*, 28/10 1854.

8 Rohat Alakom, *Kurd li Polonyayê (1835)*, <http://krd.riataza.com/2017/06/10/kurd-li-polonyaye-1835/> (Reya Teze, 10/6 2017).



Kurdên Swêdê di meşeke Yekê Gulanê de (1966)
 “Aştî ji kurdan re- Aştî ji Rohilata Navîn re”

dixwînin û dixebitin. Kurdên ku di nav Cemîyeta Îttîhat û Terakkiyê de cîh girtibûn bona textê Siltan Ewdilhemîd bînin xarê li gelek welatên Ewrûpayê belav bûbûn, wek Abdullah Cevdet û Îshak Sukuî. Di sala 1913an de li bajarê Lozanê xwendekarên kurd beşa Lozanê ya *Komeleya Xwendekarên Kurd-Hêvî* saz dikin. Xwendekarên kurd ku li hemû Ewrûpayê dimînin di sala 1956an de li bajarê Almanyayê, Wiesbadenê bi navê *Komeleya Xwendekarên Kurd li Ewrûpa* saz dakin. Cara yekem e ku rêxistineke kurd peyva Ewrûpayê li navê xwe zêde dike. Ev rêxistina heta salên

1976 qasî bîst salan hebûna xwe her berdewam dike. Hejmara endamên wê dighêje 600 kesan. Ev komeleya bi salan bi navê xwe yê îngîlîzî ve hatiye nasîn: *Kurdish Students Society in Europe* (KSSE).⁹ Di nivê yekem ê sedsala 20an de kurdên wek Şerîf Paşa, Leyla Bedirxan û Silêmanê Kurd piraniya salên xwe li Ewrûpayê derbas kirine. Di salên 1960î de bi sedan kurd wek kar-ker koçberî Ewrûpayê dikin. Îro hejmara wan gîhiştiye mîlyon û nivêkî. Tenê li Almanyayê ji herçar perçeyên Kurdistanê qasî ji nîv mîlyonî zêdetir kurd dijîn. Li jêr jî em ê bi hûralî bibînin ku li welatekî

9 Rohat Alakom, Kurd ketin defteran – Pêncî saliya sazûna KSSEyê (1956), *Malpera Nefelê* (21/11 2006).

piçûk wek Swêdê îro qasî 100 hezar kurd dimînin.

Kurdên Swêdê 50 saliya xwe tijî kirin

Sala (2015) Kurdên Swêdê 50 saliya xwe tijî kirin. Ji ber vê bûyerê li Pirtûkxaneya Kurd li Stockholmê çend çalakî hatin pêşkêş kirin.¹⁰ Di van çalakiyan de herwiha kurdên ku pêşiyê hatine Swêdê peyivîn. Ev 50 sal in ji her dever, herêm û beşên Kurdistanê mirov hatine/tên Swêdê. Îro hejmara wan li dora 100 hezarî tên hesibîn. Sala 2015an dema Kurdên Swêdê 50 saliya hatina xwe ya Swêdê pîroz dikirin zêdetir nûçeyeke nebixêr bala wan kişand. Alan Kurdî, ew zarokê 3 salî ku pêlên Behra Spî bedena wî a piçûk daqurtand û anî avîte ber reşahiya Rojavaya Tirkîyê bona mirovahiyê bû îbretke mezin. Angorî agahiyên rojnameyan Alan ligel malbata xwe berê xwe dabû welatê Swêdê, lê belê pê re negîhand û ew firsend nedît wekî gava xwe bavêje vî welatê Bakûrî.¹¹ Piştî vî wêneyî dinya wek tê zanîn rabû ser

pêyan, dilê bi milyonan mirov bona Alan lêda! Kurdên Swêdê serpêhatiya Alan jî kirin perçeyekî dîroka xwe, dan ser seran, ser çavan!

Penaberê pêşîn li Swêdê: Silêmanê Kurd (1911-1981)

Berî ku kurd di sala 1965an de li Swêdê komekê pêk bînin çawa em dibînin tek tek hin kurd hatine Swêdê, ji wan çend heban jîyana xwe li wir derbas kirine, wek Silêmanê Kurd û Selahaddîn Rastgeldî. Ji van kesan Silêmanê Kurd ku di sala 1929an de hatiye Swêdê wek yekem kurd, yekem koçber û penaberê kurd tê hesibîn. Silêmanê Kurd di dawîya Şerê Cihanê yê Yekem de (1918) hemû endamên malbata xwe winda dike. Berê xwe dide Tiflîsê. Ji wir jî diçe çend gundên alman, rûs û swêdiyan ku li Ukranyayê hebûne kar dike. Li gundê swêdî malbatek li vî zarokê kurd xweyî derdikeve û di sala 1922an dike ewladê xwe. Silêmanê Kurd êdî di nav swêdiyan de wek Alexander Knutas tê nasîn.¹² Sela-

10 Bi hevbendîya Pêncî Saliya Kurdên Swêdê di sala 2015an de li Pirtûkxaneya kurdî de hin çalakî hatin çêkirin wek semînera bi navê *50-saliya Kurdên Swêdê* (9/5 2015) û paneleke bi navê *50 sal li Swêdê: Kurdên pêşîn dipeyivîn* (10/10 2016). Kesên wek Cemal Alemdar, Omer Şexmûs û Reşo Zilan tevî vê panelê bûn.

11 Drunknade trearingen Alan var på väg till Sverige, *Dagens Nyheter*, 9/4 2015. <https://www.dn.se/nyheter/varlden/drunknade-trearingen-alan-var-pa-vag-till-sverige/> (DN 4/9 2015)

12 Rohat Alakom, *Silêmanê Kurd li Swêdê*, Apec, 2018.

haddîn Rastgeldî ku di sala 1947an de hatiye Swêdê wek xwendekarê kurd yê yekem li Swêdê derbasî dîrokê bûye.¹³ Silêmanê Kurd di sala 1981an de û Selahaddîn Rastgeldî di sala 1986an de li Swêdê çûye dilovaniya xwe. Çawa em dibînin berî sala 1965an, deh salan, bîst salan carê kurdek li Swêdê peyda bûye û têkiliyên wan ligel hev çênebûne. Ji ber vê yekê mirov nikare qala Kurdên Swêdê bike. Berî van koçberan çend kurdên din jî di salên gelek kevn de hatine Swêdê, lê belê ew kesan bi jîyaneke demî li Swêdê mane, paşê vegeryane çûne welatên din hêwirîne, wek Şerîf Paşa¹⁴ û Leyla Bedirxan.¹⁵ Seredan û hatina van kesan bêgûman dîroka têkiliyên swêdî-kurdî yên berî koçberiya Kurdên Swêdê rengîn dike.

Koma kurdên Swêdê pêk têt (1965)

Kurdên ku cara pêşîn di sala 1965an de hatine Swêdê û koma Kurdên Swêdê pêk anîne ev kes bûne: Cemal Alemdar, Îbrahîm Mamxidir, Seîd

Evdilrehman, Seîd Dizeyî. Ji van kesan Cemal Alemdar heta niha jî li Swêdê dijî. Cemal Alemdar di sala 1968an de wek nûnerê kurdan li Îskandînavyayê tê hilbijartin û dibe yek ji wan aktîvistên kurdan. Hemû ev kesan ji Kurdistanê Iraqê bûne. Ji wan hin kesan jî Tirkîyê dixwendin. Çend kes jî wan di sala 1963an de li Tirkîyê têt girtin. Angorî agahiyên rojnameyên van salan jî ber çalakiyên kurdewariyê û kurdîtiyê dozgerê tirk di dadgehê de îdama van kesan daxwaz kiriye.¹⁶ Dema serbest têt berdan di sala 1965an têt Swêdê. Bi hatina van kurdan êdî cara pêşîn li eynî cihê jî du kesan zêdetir kurd li Stockholmê dijîn. Ji ber vê yekê dîroka Kurdên Swêdê bi sala 1965an dest pê dike. Piştî çend mehan çawa em dibînin di çapemeniya swêdî de êdî cara pêşîn nûçe derdikevin ku bi sergirtî qala Kurdên Swêdê dijîn, dikin. Mirov di van nûçeyên jêrîn de jî dibîne ku di demên pêşîn de van kurdan - ji ber telûkaya tolhildana dewletên wek Iraqê- navên xwe bi vekirî ji rojnamevanên swêdî re

13 Rohat Alakom, *Xatirê Te Stockholm! Selahaddîn Rastgeldî*, Apec, 2016.

14 Rohat Alakom, General Şerîf Paşa li Stockholmê, *Nûdem*, nr 16/1995, rûp.13-26.

15 Rohat Alakom, Prensesa Kurdistanê Leyla Bedirxan li Stockholmê (1925), di nav pirtûka: *Jinên Kurd di Çavkaniyên Swêdî de*, Apec, 2016. rûp.61-69. Herwiha vê nivîsa bi tirkî binêre: Leyla Bedirhan Stockholm'da (1925), *Toplumsal Tarih*, nr 259/2015, rûp.86-88.

16 Gizli Teşkilat Kuran 8 Kürt Tevkif Edildi, *Milliyet*, 15/8 1963. 23 Kürtçü Sanığın Duruşması Başladı, *Milliyet*, 18/12 1963.

eşkere nekirine. Wek mînak di sala 1965an de rojnameya swêdî Aftonbladetê di derbarê Kurdistanê Başûr de nûçeyekê belav dike. Nûçe û şirove ji aliyê rojnamevan Anders Johansson de amade bûye. Di beşeke vê nûçeyê de wiha tê gotin: “Înformatorê min îdîa dike ku “Tiştên ku li welatê min didome ji demên berê gelek xirabtir e”. Ew kesekî penaber e ku naxwaze navê xwe eşkere bike. Ajanên Bexdayê li herderê hene, dibêje. *Ew li Swêdê benda rojên xweş li Kurdistanê ye. Ew, yek ji wan sedan xwendekaran e ku li derweyê welêt dimînin*”.¹⁷ Mirov ji vê nûçeyê dikare fam bike ku ev xwendekar ji Kurdistanê Başûr e. Bi saya vê nûçeyê mirov zane ku li Stockholmê kurd hene ku doza kurdî angorî îmkânên xwe yê piçûk û sînorkirî didin nasandin. Di destpêka sala 1966an vê carê rojnameya *Svenska Dagbladet* nûçeyeke bi vê sernivîsê diweşîne: “*Kurdekî li Swêdê qala tekoşîna azadiyê ya 5 salan dike*”. Rojname herwisa dinivîse ku vî xwendekarê kurd ev agahiyan li Dêra S:ta Clara li Stockholmê

pêşkêşî wî kiriye.¹⁸ Ev rojname jî navê vî kurdî nade û mirov nizane gelo ev herdu xwendekarên ku di van nûçeyan de qala wan tê kirin, eynî kes e yan jî du kesên cihê ne. Rojnameya *Expressen*ê di nûçeyeke xwe de qala “koçberê kurd li Stockholmê” dike.¹⁹ Di sala 1966an de rojnameya *Dagens Nyheter* cara pêşîn navê penaberekî kurd dide ku ev saleke e li Stockholmê dimîne, rojname navê wî wek Seîd Evidilrehman pêşkêş dike.²⁰

Jimareke rojnameya Aftonbladetê ku di sala 1974an de weşiyaye dîyar dike ku kesekî bi navê Seîd Dizeyî ku berî salan li Swêdê xwendiyê vê gavê li Iraqê di radyoya kurdî de kar dike.²¹ Wek li jor jî xuya dike rojnameyên swêdî wek çavkanî tek tek qala kurdan dikin ku di salên 1960î de hatine Swêdê.

Di sala 1965an de cara pêşîn jî du kurdan zêdetir kurd di eynî salê li Swêdê hêwirîne, jîyane, komeke piçûk pêk anîne. Koçberiya kurdan ji 1965an şunda bi navbirên gelek kurt heta niha her berdewam her kiriye, nesekiniye. Belê, mirov

17 Så här berättar en flykting om ett “glömt” krig, *Aftonbladet*, 14/7 1965.

18 Kurd i Sverige berättar om 5-årig frihetskamp, *Svenska Dagbladet*, 6/3 1966.

19 Nödros, *Expressen*, 26/5 1966.

20 Svenska kurdkommittén begär FN: aktion av UD, *Dagens Nyheter*, 17/5 1966.

21 “Kurdistan röst” talar svenska, *Aftonbladet*, 4/7 1974.

bi rehetî dikare bêje ku Swêd di sala 1965an de bûye welatê kurdan. 1966an de nûçeyeke gelek balkêş û giring di rojnameya *Dagens Nyheter* de hatiye weşandin. Ev nivîsa li ser pîrozkirina Cejna Yekê Gulanê ye. Nûçehîganê rojnameyê bi dûr û dirêj qala pîrozkirina vê cejnê dike. Di cîhekî vê nivîsê de rojnamevan bi sernivîseke piçûk dîyar dike ku di meşa Yekê Gulanê de koma here balkêş ew koma kurdan a piçûk bûye ku di vê meşê de beşdar bûye. Navê vê koma kurdan “**Ekîpa kurdan**” (*Kurdisk patrull*) hatiye dayîn. Di vê nûçeyê de tê gotin ku li Stockholmê ev şeş penaberên kurd ji Kurdistana Iraqê ne û penaberên polîtîk in. Du keçên swêdî ku cil û berg, kincên kurdî li xwe kirine û xwe dane pêşiyê jî sempatîzanên kurdan bûne.²² Ev nûçeya dawî wek dokument nîşan dide ku hejmarê kurdan ji du kesên zêdetir e û kurdan piçûk be jî êdî komê li Swêdê pêk anîne. Çavkaniyên devkî jî van zanyariyan piştrast dikin. Êdî em bi saya çavkaniyên nivîskî û devkî bi rehetî dikarin qala Kurdên Swêdê bikin. Piraniya van kurdên ku di salên 1965 û ji wir şunda

hatine ligel swêdiyan zewicîne, zarok û newiyên wan ên swêdî-kurdî iro êdî mezin bûne. Ji bo nivîsîna dîroka Kurdên Swêdê (1965-2015) divê ew salên pêşîn, bi taybetî ew salên destpêkê (1965-1970) baş bînin zanîn ku dîroka Kurdên Swêdê li ser hîm û bingeheên xurt bi kronolojîk bê avakirin.

Yek ji wan kesên ku di sala 1966an de ji Kurdistana Tirkîyê hatiye Swêdê Bedirxan Anter e ku di nav kurdan de zêdetir wek Bedo Anter hatiye nasîn. Di hevpeyvîneke sala 1967an li ser rewşa Kurdistana Tirkîyê agahiyên dide rojnameya *Aftonbladet*. Bedo Anterê ku wê demê 26 sal bûye li Uppsalayê beşa matematîkê xwendiyê. Ew dîyar dike ku sefereta Tirkîyê naxwaze pasaporta wî dirêj bike. Sedemê vê yekê jî kurdbûna wî û li ser kurdan dayîna sê semîneran bûye. Bedirxan Anter yek ji wan kesên ku cara pêşîn hatiye Swêdê, bajarê xwendekaran Uppsalayê.²³ Di sala 1967an de nivîseke Bedirxan Anterê vê carê di rojnameya *Uppsala Nya Tidning* de tê weşandin. Tiştêkî gelek balkêş jî di binê vê nûçeya dirêj de “*Komeleya*

22 Kurdisk patrull, *Dagens Nyheter*, 2/5 1966.

23 Hans regering vill tvinga honom lämna Sverige..., *Aftonbladet*, 29/3 1967.

Xwendekarên kurd li Ewropa-Beşa Swêdê” (Kurdiska Studenternas Förening i Europa, Sveriges Gren) hatiye nivîsîn.²⁴ Ev nûçeya nîşan dide ku kurd ji der Stockholmê herwisa hatine bajarê xwendekaran, bajarê Uppsalayê. Weşandina vê nûçeyê dîroka bajarê Uppsalayê jî dixemilîne. Paşê çend kesên din jî ji malbata Anteran koçberî Swêdê kirine. Koça kurdan berbi Swêdê yek bi yek, kêm be jî her berdewam kiriye. Wek mînak di sala 1967 Omer Şêxmûs û di sala 1969an de Memo Yetkîn li ser Îngîlterê û Polonyayê re tîn Swêdê. Omer Şêxmûs di bîranînên xwe de dîyar dike ku di van salan de 6 kurd li Swêdê hebûne, çar heb ji Kurdistana Başûr û du kes ji Kurdistana Tirkîyê.²⁵

Komîteya Kurdî ya Swêd (Svenska kurdkommittén)

Ji aliyê rêxistinî de di sala 1966an de bûyereke gelek êrînî cara pêşîn li Swêdê diqewime. Ev kurdên pêşîn ku di sala 1965an de hatine (Cemal Alemdar, Îbrahîm Mamxidir, Seîd

Evdilrehman, Seîd Dizeyî) ligel Dr. Selahaddîn Rastgeldî ku beri wan hatibû Swêdê (1947) û bi hevkarîya çend swêdiyan roja 28/3 1966an de Komîteya Kurdî ya Swêd (Svenska kurdkommittén) saz dikin.²⁶ Di civîna sazkirina komîteyê de wek kurd Selahaddîn Rastgeldî, Cemal Alemdar, Seîd Dizeyî û qasî deh swêdî, dostên kurdan beşdar bûne.²⁷ Xanimeke swêdî Märta Hansson dibe sereka wê. Di sala 1967an de vefat dike, li cîhê wê Olof G Tandberg dibe serekê komîteyê.²⁸ Doxtorê kurd Selahaddîn Rastgeldî bi navê komîteyê diçe Kurdistana başûr û piştî vegeza xwe pirtûkeke swêdî “Şerê Jibîrkirî” (Det glömda kriget) daye weşandin.²⁹ Him sazûna ve komîteyê û him jî weşandina ve pirtûkê gelek deng vedaye, swêdî di derbarê kurdan de zêdetir bûne xweyê agahî û zanyariyan. Komîteya kurd çalakîyên xwe berdewam dike heta ku kurd di sala 1970yî de dighêjin mafê otonomiyê. Selahaddîn Rastgeldî dema ve gera xwe de qelemekê dîyarî Barzanî dike ku

24 Hot och terror mot kurderna, *Uppsala nya tidning*, 24/11 1967.

25 *Invandring, forskning, politik* -En vänbok till Tomas Hammar, CEIFO, 1993, rûp.151.

26 Svenska kurdkommittén begär FN: aktion av UD, *Dagens Nyheter*, 17/5 1966.

27 Protokola sazûna komîteyê (28/3 1966). Nimûneyeke ve dokumentê di arşîva nivîskar de ye.

28 Märta Hansson-In Memoriam, *Svenska Dagbladet*, 7/9 1967.

29 *Det glömda kriget-Rapport från Irakiska Kurdistan*, Natur och Kultur, 1967. Utgiven av Svenska Kurdkommittén.



Dersên zimanê kurdî li Swêdê ku di sala 1970yî de ji aliyê
Kamuran Bedirxan de hatine dayîn

Märta Hanssonê bi navê komîteyê jê re şandîye.³⁰ Kurdên Swêdê bi xurtî piştgirtiya Teverga Kurdên Başûr dikin. Herman Lindqvist rojnamevanê ku paşê li Swêdê dibe dîrokanekî navdar jî di bîranînên xwe de qala bûyereke balkêş dîke. Dema çûye Kurdistanê li wir rastî Barzanî hatiye. Dem sohbetê xerçereke ku li bal Barzanî hebûye bala wî dikêşîne. Lindqvist dema dibêje “Çi xerçereke xweş e” Barzanî tavilê wê ji nav kembera xwe derdixe, dîyarî vî rojnamevanê swêdî dîke. Lind-

qvist dîyar dîke ku heta niha jî wî ev xerçer parastîye, di dîwarê oda wî ya xebatê de wisa dardakirî maye.³¹

“Sefîrên kurd”

Di sala 1966an de ronakbîrê kurd Îsmet Şerîf Vanlî seredana Swêdê dîke û ligel swêdiyan gelek têkiliyan pêk tîne. Rojnameya Expressen wî wek “sefirê kurd” (kurdîske ambasadören) dinavîne.³² Eynî rojname rojtira din qala “sefirê kurd ê gerok” (den resande kurdîske ambasadören) dîke.³³ Ev seredana

30 *Det glömda kriget-Rapport från Irakiska Kurdistan*, 1967. Utgiven av Svenska Kurdkommittén, rûp.16.

31 Herman Lindqvist, *Mitt i allt*, 2012, rûp.143.

32 *Expressen*, 27/5 1966.

33 TV igâr, *Expressen*, 28/5 1966.

ji bo koma Kurdên Swêdê jî dibe piştgirtî û alîkariyeke mezin.³⁴ Di sala 1970yî de Kamuran Bedirxan seredana Swêdê dike, têkiliyên xwe ligel Kurdên Swêdê pêsta dibe. Ev seredanan nîşan didin ku êdî pêwenî û têkiliyên kurdên ku li her welatê Ewrûpayê dijîn heta Swêdê berfireh dibin.

Kurd êdî wek komekê tên navandin

Kurd di salên berê de wek “*Penaberên Kurd li Swêdê*” (Kurdiska flyktingar i Sverige) hatine navandin.³⁵ Di sala 1967an de em îfadeya “*Kurdên nefîbûyî li Stockholmê*” (Exilkurder i Stockholm) jî di rojnameyan de dibînin.³⁶ Tiştêkî balkêş jî em cara pêşîn di medya swêdî de rastî îfadeya “*Koloniya kurd li Stockholmê*” (Den kurdiska kolonin i Stockholm) tînin. Di sala 1970yî de koloniya kurd cara yekem cejna Newrozê li Swêdê pîroz dike. Di rojnameya Dagens Nyheter de peyva Newroz wek “Nouroz” derbaz dibe.³⁷ Di sala

1970yî de *Komela Xwendekarên Kurd li Ewrûpa* li Stockholmê kongra xwe ya çardemîn pêk aniyê. Qasî 150 xwendekarên kurd ji 14 welatên Ewrûpayê, di sala 1970yî de li Swêdê civiyane. Ev cara pêşîn bû evqas zêde kurd li Swêdê dihatin bal hev. Ji beşa Swêdê qasî 17 kes di vê kongrê de beşdar bûne û kongrê pênc rojan ajotiyê. Eynî rojname diyar dike ku li Ewrûpayê qasî 600 xwendekarên kurd hene.³⁸ Ji van xwendekaran hin kes paşê venegeriyane, li Swêdê mane, wek Mihemed Kamil, Ebdulhamid Deqori û Kemal Cengiz. Ev civîna wek *Kongra Stockholmê* derbasî dîroka Komela Xwendekarên Kurd li Ewrûpa bû. Wek em li jor jî dibînin hejmara xwendekarên kurd di sala 1970yî de gihiştîye 17 kesan. Herwisa kurdine din Selahaddîn Rastgeldî û birayê wî Kemal Rastgeldî wek karmend li Swêdê kar dikirin. Selahaddîn Rastgeldî (1927-1986) kurdê pêşîn e ku wek xwendekar di sala 1947an de hatiye Swêdê.³⁹

34 Kurder begär FN-aktion för att stoppa gaskriget, *Svenska Dagbladet*, 28/5 1966.

35 Protokola sazbûna komîteeyê (28/3 1966). Nimûneyeke vê dokumentê di arşîva nivîskar de heye.

36 Turkiska regeringen anklagas för förtryck av kurdisk minoritet, *Dagens Nyheter*, 3/7 1967.

37 Kurdiskt nyårsfirande under veckohelgen, *Dagens Nyheter*, 21/3 1970.

38 Kurder möts i Stockholm: Vi kämpar för självstyre, *Svenska Dagbladet*, 2/8 1970.

39 Rohat Alakom. Urfâ Tarihine Hayran Bir Kürt Selahaddin Rastgeldî, *Kürt Tarihi Dergisi*, nr 21/2015, rûp.4-13. Kurdekî heyranê dîroka Rihayê, *Nûbihar*, nr 133 /2015, rûp.10-21. *Xatirê Te Stockholm! Selahaddin Rastgeldî*, Apec, 2016.

Koçberiya kurdên Anatoliyê

Îro bi deh hezaran kurdên ji Anatoliyê li Swêdê dijîn. Piraniya wan di salên 1960î de ji wan gundên derdorê Qoniya û Enqereyê hatine. Beşek ji wan bi hemû şêniyê gundên xwe koçberî Swêdê kirine wek gundên Omera û Celeb. Kesê ku cara pêşîn Swêd wek welatekî pêşketî li Tirkîyê daye nasandin û ji koçberiya karkerên tirk û kurd re rê vekirîye berçavksazekî (optiker) bi navê Abdullah Arihan bûye ku li paytextê Tirkîyê dima û kar dikir. Gelek kesên bêkar di van salan de dixwazin herin Swêdê, li wir kar bikin bona hine pere bidin hev û careke din vegerin welatê xwe. Ev koçberiya heta niha jî berdewam e. Dema hejmarê wan li Swêdê zêde dibe vê carê ev yeka bala rojnameyên swêdî jî dikşîne û rojname nûçegihanên xwe dişînin û herêma Quliyê (Kulu) bizanibin ka sedemên vê koçberiya mezin çi ye.⁴⁰ Dema mamosteyek ji şagirtê xwe dipirse: “*Tu mezin bibî tu ê bibî çi?*”, şagirt wiha bersîva wî dide: “*Ez ê herim Swêdê*”.⁴¹

Kurdên ku di sala 1966an de ji Anatoliya Navîn wek karker

hatibûn xwe hê wek kurd nedidan nasandin.⁴² Navên wan bi kurdan re girêdayî, bi hevahengî nedihate behs kirin, hin caran ev kurdan wek mînak “hemwelatîyên Tirkîyê” dihatin bi nav kirin. Lê belê hêdî hêdî haya wan ji kurdbûna wan çêdibe û zanava xwe ya kurdî (nasnameya) derdixin pêş. Wek mînak Rifkî Celeplî ku di 1967an de ji Anatoliya Navîn hatiye Swêdê dibêje ku dema di sala 1969an de çûye bal doxtorê kurd Selahaddîn Rastgeldî ji bo raporekê bistîne wî jê re qala kurdbûna xwe kiriyê.⁴³

Di sala 1966an de rojnameyêke tirkî dinivîse ku kurd li Swêdê propagandaya kurdîtiyê dikin. Piştî mehekê Rastgeldî li hemberî van dîtînan nivîsekê ji rojnameyê re dişîne û van dîtînan di cîh de nabîne. Rojnamevanekî bi navê Orhan Türel ji Stockholmê dinivîse ku Rastgeldî hin xwendekarên ku bi rêya veşartî hatine Swêdê, li wir dide xwendin û karkerên ku hatine Swêdê jî ji swêdiyan re wek “*Kurdên ji Tirkîyê sirgûnbûyî*” bi çavekî negatîf dide nasîn. Wî bi van peyvên “*Kurdên ji Tirkîyê sirgûnbûyî*” xwestiyê bêje

40 Utpekat nekar till bondfångeri, *Dagens Nyheter*, 26/10 1966.

41 Utvandrarstaden, *Svenska Dagbladet*, 22/10 2006.

42 *Invandring, forskning, politik* -En vänbok till Tomas Hammar, CEIFO, 1993, rûp.151.

43 Hevpeyvîn ligel Rifkî Celeplî, Stockholm (22/9 2015).



Komeke Kurdên Anatoliyê ku koçberî Swêdê kirine

ku Rastgeldî bi kurdên Anatoliyê re têkilî daniye û li wan xweyî derketiye. Angorî Rifkî Celeplî çend kesên ku cara pêşîn ji Anatoliya Navîn hatine Swêdê ev kes in: Yusuf Ulusoy (1965), Cemal Balci (1965), Hüseyin Uludax (1965), Haci Suvakçı (1965), Fevzi Sutci (1965), Kadir Sutci (1964) û Mehmet Suvakçı (1964). Ji van kesan Mehmet Suvakçı ku di sala 1964an de hatibû hinekî swêdî zanibû û ji kesên din re carina wergerî jî dikir.⁴⁴ Wergêrê wan tirkekî bi navê Ergun Esrek, navê jina wî ya swêdî Gunilla Esrek

bûye. Di sala 1951an de zewicîne. Ev yeka tê wê wateyê ku hin tirk berî salan hatine Swêdê. Di rojnameya Svenska Dagbladet de tê gotin sendîkayên swêdî kesekî bi navê Ahmet Ergîn Day anîne ser kar wekî alîkariya kesên ku ji Tirkîyê, Irak û Îranê tên bike.⁴⁵ Ahmet Ergîn Day di navbera salên 1966-1969an de dibe serekê *Komelaya Karkerên Tirk li Swêdê*.⁴⁶ Di sala 1966an rojname dinivîsin ku qasî 3000 kes hene ku ji Tirkîyê hatine Swêdê. Di nav wan de kurd jî hebûne.

44 Hevpeyvîn ligel Rifkî Celeplî, Stockholm (22/9 2015).

45 Delegation till Turkiet, Grekland för att hejda spontan invandring, *Svenska Dagbladet*, 20/11 1965.

Rojname dinivise ku navê vê komelê yê fermî bi swêdî wiha bûye: Turkiska arbetarnas förening i Sverige.

46 Turkiska arbetarförening har bildats i Stockholm, *Svenska Dagbladet*, 25/4 1966.

Karkerên kurd rêxistina xwe saz dikin

Di sala 1976an de komeleya kurdî ya pêşîn bi navê *Qomeleya Qarkeran a Kurdî-Swêdî* saz dibe. Piraniya kurdên ji Anatoliya Navîn hatine di nav refên vê komeleyê de cih digrin. Paşê hejmara komele û saziyên kurdî her diçin zêdetir dibin. Di sala 1981an de çend komele dighêjin hev û *Federasyona Kurd* (Kurdiska Riksförbundet) saz dikin. Salekê şunda kovara kurdî *Berbang* ji aliyê Federasyona Kurd de derdikeve. Îro ji sedî zedetir komeleyên kurd li Swêdê hene. Ne tenê komele, gelek saziyên din jî ava dibin.

Kurd bûne perçeyekî dîroka swêdî

Ev dîroka koçberiya kurdan qasî lêkolerên kurd dîrokzanên swêdî jî eleqedar dike. Bi pêşengiya dîroknas û lêkolerên swêdî berhemke ku ji heyşt cildan pêkhatî berî demeke nêzik bi navê *Dîroka Swêdî* (Sveriges historia) hat weşandin. Nivîsa vê dîroka Swêdê wek proje di sala 2009an de destpêkir heta sala 2013an berdevam kir. Ev berhema bingehîn ji

heyşt cildan pêk tê. Cildê dawîn dîroka Swêdê ya salên 1962-2012an daye ber çavan. Çawa li vir jî xuya dibe ev periyoda nêzîkî beramberî 50 saliya Kurdên Swêdê dike. Di çend cihên vî cildê dawîn de qala kurdan jî tê kirin. Mirov dikare bêje ku kurd di pêncî saliya xwe de bûn perçeyekî dîroka Swêdê jî. Di cîhekî de tê gotin ku di nav wan komên ku berî salên 2000an hatine Swêdê de kurd komeke koçberên Kurdistanê pêk tîne.⁴⁷

Di pirtûkê de dema jîyana muzikê tê kirin di cîhekî de tê gotin ku wek mînak di nav kesên xelata mûzîkê ya bi navê *Grammis* wergirtine hin kes hene ku ji welatên din hatine, di nav wan de hunermendên ji Kurdistanê jî hene.⁴⁸ Mijareke gelek baş jî ew e ku dîrokzanan ku ev pirtûk nivîsîne ew xeletî û şaşiyên ku di medya swêdî de kurd kiribûn hedefên êrişan serrastkirine û kurd bi rûsipî derbasî dîroka Swêdê kirine. Angorî van dîrokzanan wan hewldayînen ku xwestin nîşan bidin ku tiliya kurdan di bûyera kuştina Olof Palme de heye hin delîlên xurt pêşkêş nekirin û di

47 Kjell Östberg & Jenny Andersson, *Sveriges historia (1962-2012)*, 2013, rûp.21.

48 Kjell Östberg & Jenny Andersson, *Sveriges historia*, rûp.341

dawiyê de pûç derketin.⁴⁹ Ev lêkoler herwisa jî li ser bûyera kuştina keça kurd Fadîme Şahîndalê disekinî û dîyar dikin ku kuştinên bi vî tehrî bi çandên cihê re nikarin bîn girêdan. Di her civat û çandan de mirov rastî kuştinên bi vî awayî tê. Lêkoler zêdetir berê xwe didin civat, sazî, raman û dîtinên hukim-mêr (patriarkalisk).⁵⁰ Vê keça kurd bona ku bighêje dilketiyê xwe, bona evîne mirin jî da ber çavan. Di dawiyê de bona vî cesaretê xwe li Swêdê wek leheng û qehremanekê hate binavkirin.⁵¹ Lêkoler û dîrokzan êdî besa “*dîroka swêdî ya kurdan*” (kurdernas svenska historia) dikin. Îro bi sedan kurd hene ku li ser axa Swêdê çavên xwe vekirine, hatine dinê, herwisa bi sedan kesan li ser vê axê çavên xwe dane hev û hatine veşartin.

Goristanên kurd jî hêdî hêdî li Swêdê pêk tên. Kurd di dawiyê de bûne xweyê du welatan: Kurdistan, Swêd.

Destên wan jî herdu welatan jî nabe! Bi hestên (hîs) du-welatiyê dijîn. Li alîkî wan bi rengên kesk, sor û zer ala Kurdistanê dimilmile, li aliyê din bi rengên şîn û zer ala Swêdê.

Rengê hevbeş ango rengê zer dildariya kurdan a du-welatiyê sembolîze dike. Belê bajar û taxên wan jî dîroka xwe ya kurd dinivîsîn.⁵² Kurd ne tenê bûne beşeke dîroka swêdî herwiha bûne beşeke edebîyata vî welatî. Gelek nivîskarên swêdî lehengên xwe jî nav koma kurdan hildijbêrin.⁵³ Kurdên Swêdê di sala 2065an de wê 100-saliya hatina xwe pîroz bikin. Wê demê dîroka Kurdên Swêdê divê ji nû ve bê nivîsîn. Ji kîderê heta kîderê!

49 Kjell Östberg & Jenny Andersson, *Sveriges historia*, rûp.225.

50 Kjell Östberg & Jenny Andersson, *Sveriges historia*, rûp.325.

51 Ola Larsmo, Brian Palmer, *101 Historiska hjältar*, 2013, rûp.83-85.

52 När Sverige blev kurdernas land, *Stockholms Friä Tidning*, 22/2 2014.

53 Rohat Alakom, Di romana swêdî de koçberiya kurdan, *Nûbihar*, nr 144/2018, rûp.6-12.

Gotinên çê û neçê

-1-

NIFIR, AZAR, LOME û ZÊF GOTINÊN HUNDÎR VEHEŞANDINÊ û DİL ÊŞANDINÊ

Nuh Ateş
nuhates@web.de

Pêşgotin:

Di beşa yekê ya mijara gotinên çê û neçê da ezê qala gotinên neçê bikim. Gotinên ku wekî nifir, azar, lome û zêf tên binavkirin. Gotinên neçê yên ku min di kuriktî û xortaniya xwe da nivê esrê di ber ve, li gundê Xelika (Karacadag-Kulu-Konya) bihistî û di bîra min da mayî. Ku bû qismet, ez ê di hêjmareke din ya kovarê da jî qala gotinên çê bikim.

Ji hêla zimên û nivîsandinê da kêma yan zêde tesîra zaravayê (devoka) Xelika li ser gotinên neçê yên ku min li jêr komkirî heye. Ji bo î ve jî, dibe ku ev şor û gotinên ku di bîra min da mayî bi yên li gund û bajarokên kurd yên din ên li Anatoliya navîn va ji hen aliyan da hevûdu negrin û ji hev cihê bin.

Bi min weng tê ku huro (îro) ev şor û gotinên neçê êdi li Xelika mîna berê pir nayên gotin, kêma tên bilêvkirin û bihistin. Vîqasî ku di

bîra min da maye, berê nifir û azar pirtir ji devî jinan û lome û zêf jî ji devî mêran derdiketin.

Nivîsandina gotinên çê û neçê jî ji bo ziman, kultûr û civatnasînê gerek e. Ji hêlekê da jî, mijar û naverok çî dibe ma bibe, her nivîseke bi kurdî û bi taybetî jî li ser zargotinên kurdî li her cîhûwarên kurdnişîn bi serî xwe xîret û liberxwedaneke ji bo parastina çand û zimanê kurdî ye.

Li gor nihêrinên hen zaneyên mijarê, nifir, azar, lome û zêf jikî ku insan heye henin. Êw ê wan wekî beredaneke (êrişeke) êşandinî û piçûkxistinî bi nav dikine. Meriv dikane gotinên neçê mîna lêdan û rexneyên tûj jî bihesibîne. Pir caran meriv, gava ku ew ji ber qewimiyên nerind xwelî, aciz û sur dibe yan jî neçar dimîne, hêrs û cinên wî radibin dest pê gotinên neçê dike û pê hundirê xwe vedihesîne. Lê kesên ku dibin armanca nifir, azar, lome û zêfan jî tên êşandin û

piçûkkirin. Ji ber vê ye ku ew jî pir caran bersiva nifîrkar û zêfkar bi nifir, azar û zêfan didin.

Meriv gotinên neçê carina li rûyê hevûdu û carina jî di pêy hevûdu dibên. Wexta ku ew li rûyê hevûdu tên gotin, hîngê carcaran ew dibûn/dibin sebeba sûvahatin, heng û şeran jî.

Di hen gotinên neçê da kesên bi manî, yan bi şekil, sima, kar, mesleg, binemalî û teybetîyên xwe yên ji pîranî û normalîyê cihê tên eşandin û piçûkkirin. Di armanca (hedefa) zêfên ji doxinê berjêr da jî pirtir jin heye.

Gotinên neçê, hûn ê di nivîsê da nimûneyan bibînin, li Xelika û cihûwarên din yên Kurdên Anatoliya Navîn pir caran bi pêşdank yan navlêkirinên wekî magî/mago, mageyî, magê/mageyê, mak/maka tên bilêvkirin. Balkeş e, van pêşdank û navlêkirinan tenê ji devî mêran derdikevin, jin wana nabên. Van pêşdank û navlêkirinan kîngê û ji ku da hatina û ketine nav ziman û zaravêyên me û çima jin wan bi lêv nakin?

Bersiva van pirsan bi zehmet e. Lê ji gumana ne dûr e ku van pêşdank û navlêkirinan di dem û dewranên kevin da ketibin nav zimanê me û

ji dema Împeretoriya Medan da mayîbin. Û paşê, ji derbasbûna kurdan ya îslamê bi şûnda, evana bi meneyeke neçê hatibin dîtin û mitala kirin. Kî dizane, dibe ku muslimantîya pêşîyên kurdan bi mêran destpê kiribe û jin ji paşê da, dereng derbase dîne îslamê bûyîbin. Derberê vê mijarê da, meriv di serdema me da jî raste hen cudahîyên din yên di navberê jin û mêran da tê.

Hukumê hen rabûn û rûniştinên kurdan yên kevn huro jî li ser jinên kurd yên li gundên kurdên Anatolîyayê ji ya li ser mêran pirtir e. Nimûne, Viqasî ku min hay jê heye, jin naherin mizgeftê (camîyê). Jinên dîndar li mala xwe nîmeya xwe dikin. Jin, wexta ku meytî (ceneze) mirîyan dibin goristanê, mîna mêran bi rû meytî nakevin û naherin goristên û li wir teve merasîma binaxkirina mirî ya bi tirkî-erebî, nabin.

Jin li pêş mala yê mirî şînê dikin. Dêûdotên kesê ku mirî kincê xwe vajo li xwe dikin, dinalin, distrên, digirîn, bisk û porê xwe dirûçkînin û bi mistan li sing û berên xwe dixin. Li şîn û sersaxîyan odeyên jin û mêran ji hev cihê ne. Li odeyên mêran şîn tune û gotinên sersaxîyê

bi kurdî ne lê tirkî jî ketiye nav. Li odeya mêran Qoran û dûa tenê bi erebî-tirkî tên xwendin. Lê li odeya jinan erebî û tirkî tune yan jî pirûpir kême û xwendina Qoran û duayan bi tirkî-erebî jî tune, hîn ew nebûye edet. Li odeya jinan zimanê serdest kurdî ye û kilamên şînê bi kurdî tên stran, dêûdot û mermaliyên mirî yê din dikevin hembêza hevûdu û bi hev ra digirîn.¹

A

- Axu û Afacan/ Afacan xwaro/xwarê
- Axu û Afacan vexwaro/vexwarê
- Ar (Agir) vê malê keve/keto/ketê
- Ar vê mala bavê keve/keto/ketê
- Ar vê canê te keve
- Arî vêketiye/Magê/Magî ar î vêketiye

B

- Bela xwe biwinî
- Berî çavan bigre, rindiyên ku min jê ra kirî înkâr kirin
- Brûsk lêkeve/lêketo/lêketê
- Bi lêh da herî/çûyo/çûyê
- Bi satilcanê bikevî/keto/ketê
- Bi qizilqurtê bikevî/ keto/ketê
- Bi ta bikevî/keto/ketê
- Bi dev û rûyan warî (bihêyî) herdê
- Bi cehenemê ser sût(stûyê) xwe va herî
- Bicehime here ma ez te newînim
- Bicehime here hîn ku min bi te ranekîşandiye
- Bibiheçeyî/Tu bibiheçeyî
- Bi hecandin/ Vî qezewreşbûyî ez bi hecandim
- Bi xwaşî di tîrbê kevî/keto/ketê

¹ Ji bo zêde haydariya li ser bîngeha pêşdank û navlêkirinên ku min li jor qalkirî, li jêdera li dawîya nivîsê mêze bikin.

- Bizdoneko/Bizdonekê (Magî bizdoneko/Magê bizdonekê)
- Binaro/Binarê (Magî binaro/Magê binarê)
- Bi bedo/Xwelî vê yî bi bed
- Bi eynato/eynatê
- Bi mirûzo
- Bipertilî/wîhî ku tu bipertilî
- Bişehîtî/şehîtîyo
- Bê/Vê wijdano
- Bê fedî û heyayo
- Binguh xistin/Ku min bi şelmaqê li binguhê te xist, tû ê di dorûhevra çerx biwî
- Bi gepirê rakişandin/ Ku min yek bi gepirê te rakişand, tu ê bi devûrûyan warî(biheyî) herdê
- Bi çolê da diherê/Magî î bi çolê da diherê(î dîn bûye)
- Bi kuruşekî bi darda ye (cimrî)/Magî î bi kuruşekî bi darda ye
- Bes e te em kerr û lal kirin
- Bes e bêdeng be te em ji heş(hiş) bêhna kirin
- Bes e bi terikînê, çi te wêrewêr e

C

- Can jê bikişê/Can jê kişîyo/kişîyê
- Cinê min rameke ku ez rabûm ezê te xişxalî bikim
- Cehenime bibe here me çavên min te newînin

Ç

- Çavên te birijin
- Çav birçîyo/ Magî çavbirçîyo
- Çav bi derên/Çavên te biderên
- Çavpêlo/Çavpêlê/ Magî/Magê çavpêl
- Çavbelo/Çavbelê
- Çavberjêro/Çavberjêrê
- Çavpîso/Çavpîsê
- Çav bi kî/Çav bi kîyo/ Çav bi kîyê

- Çavsorô/Çavsorê /Magî çavsorô/Magê çavsorê
- Çavzero/Çavzerê
- Çokxwaro/Çokxwarê
- Çelnano(Çilnano)/Çelnanê
- Çalxin/Çalxino/Çalxinê
- Çînevîzo/Çînevîzê/Magî çînevîzo/Magê çînevîzê
- Çîn û çortana dermexe
- Çelderewino/Çelderewinê
- Çileko/Çilekê
- Çêhrepîso/Çêhrepîsê
- Çêrîn/ Magî î diçêrê/ Ter va î diçêrê!

D

- Dunê (duniyê/dunya) bi ser te da helweşê
- Dernexûn bûyo/bûyê
- Dest û pîyên xwe qe banekî
- Dest û pîyên te bişikên
- Destûpîyên te negirin
- Devsist/Magî/Magê devsist
- Dîniko/Dînikê/Magî dînik/Magê dînik
- Dîn bûye, ji rê vi derketiye
- Di herdî (erdî) reş kevî/ keto/ketê
- Di herdê da herî xwarê
- Di tirbê da dawestî/dawestê
- Di ber destan kevî/keto/ketê
- Di siwê negihêyî
- Di zar û biwîlan ra hato/hatê
- Di berda bimê/mayo/mayê
- Di tu deran negihêyî/negihêştiyo
- Doxinsisto/Doxinsistê
- Dûlî kereyo/Dûlê kereyê
- Dûlî kuçikayo/Dûlê kuçikayê
- Devjêyo(devjihevo)/Devjêyê

- Derewino/derewinê
- Devpîso/Devpîsê
- Devbikefo/Devbikefê

E

- Emiya(omiya) biwî/ bûyo/bûyê
- Ez hatim, ezê/eza te xişxalî bikim
- Ezê/Eza te bikûjim
- Eza xwe serjêkim/Ku te bi gorê min nekir eza xwe serjêkim
- Eza xwe bi darda kim/Ku te bi ya min nekir eza xwe bi darda kim
- Eşoreto/ Çi te xwe kiriye eşoret
- Ekiso/Magî çi ekis e
- Ezê pê çatî henîyê te va dim

Ê

- Ê ku nehatî serî kesî ware serî te
- Êke/ Magî/Magê êke

F

- Fişqo/Fişqê
- Fesado/Magî fesado
- Fiseko
- Fedî bike/Vê(bê) fedî heyayo/heyayê
- Famkoro/Famkorê

G

- Gawiro/Gawir biwî/ bûyo/bûyê
- Guhbelo/Magî guhbelo
- Gêjo /Magî gêjo/Magê gêjê
- Gayî Xwedêyo
- Gayî cotayo/Magî mîna gayo
- Gakuvî/ Magî gakuviyo
- Gurîyo/ Magî guriyo

- Guno/ Gundiro
- Gunehkaro
- Gavê lê hatiye kuruş/Magî gavê lê hatiye kuruş

H

- Har bûn/î har bûye
- Harinî/ î harinî bûye
- Hedî xwe bizane
- Heşkêmo/Magî heşkemo/Magê heşkême
- Herd (Erd) veqelişe tu têkevî/têkişeyî
- Hesûdo/Hesûdê
- Heramzadeyo
- Heşerî/Magî heşerî bûye herce ku bixesinî
- Hîş be, devî xwe ji xêra ra veke

Î

- Îşqê çavan birije/rijîyo/rijîyê

Î

- Înadkar /bi înado/Magî çî bi înad e!

J

- Jan di serî keve/keto/ketê
- Jêhrûziqum (Zêhrûziqum) xwaro/xwarê
- Ji vir da herî ji wir da neyî
- Ji niçkava gêr biwî/bûyo
- Ji sisêya heta neha be tu ê berdayî
- Ji destûpîyan da bikevî

K

- Kevir û kûçik bi ser te da biwarin
- Kezev reş biwe/ bûyo/bûyê
- Kul lê were/ hato/hatê

- Kul di bin çeng da hato/hatê
- Kul vêkeve/vêketo/vêketê
- Kulvêketî hundirê min anî xwarê
- Kul–mitik lê were/lêhato/lêhatê
- Kul di qirikê da hato
- Kulê neçê(pîs) lêwere/lêhato/lêhatê
- Kurm ê ketinê/Magî kurm ê ketinê î nahewê
- Kurbicino
- Kurfûto/Magî kurfûto
- Kerî ji kereyo/Kere ji kerayê
- Kerkero wer meke/Kerkerê wer meke
- Kêm biwe/biwî/Kêm bûyo/bûyê
- Kêm bîwî heş bi serê me va nehîştin
- Kêm biwe here, te ez bi hecandim
- Kêm biwe here ma çavên min te newînin
- Ku min bi te rakişand ez ê te di Fizanê ra derxim
- Kevir û kuçik bi ser te da biwarin
- Kuçiko / Magî mîna kuçikayo
- Kelmîzo/Magî kelmîzo
- Keçelo/Magî serkeçel
- Kokimo
- Kwîr biwî/bûyo/bûyê

L

- Lanet li te we
- Lêh bi malê da hato/hatê
- Lihevketî/Magî lihevketiyo/Magê lihevketiyê
- Lêvsêyo/lêvseyê/Xwelî vê yî lêvsê
- Lur/Magî luro/Magê lurê

M

- Mal mêrat biwe/ bûyo/bûyê
- Mal xeraw biwe/ bûyo/bûyê

- Mal wêran biwe/bûyo/bûyê
- Mal şewitîyo/şewitîyê
- Mal kesik bûyo/bûyê
- Mitikûmerez lêhato/lêhatê
- Magî mîna jinayo
- Magî î bi kurişekî bi darda ye
- Magî bejîyo/Magê bejîyê
- Mehde pîso/pîsê
- Mizêwiro
- Mal neketo/Malnekete

N

- Nefskero/Nefskerê
- Niçkava ger biwî/bûyo/bûyê
- Nanî dixwî heram be

O

- Ornag neçêyo/Xwelî vi ornagê we
- Ocax kwîr bûyo

P

- Parseko/parsekê/
- Pîsî bi eko/Magî pîsî bi eko/ Magê pîse bi ekê
- Pozbalcano
- Pozbiçilmo
- Pozkuro/Pozkurê
- Pîncu
- Porgijo/porgijê
- Pejmûrde/Magî pejmûrde/Magê pejmûrde

Q

- Qanser lêhato/lêhatê
- Qulqulkî biwî/bûyo/bûyê

- Qet nejinî
- Qet tu rojan nebînî
- Qerepereyî biwî/bûyo
- Qurşun lêketo/lêketê
- Qenere/ Magî qenereyo
- Qot bûyo
- Qizilqurtê bikevî/keto
- Qiran vêketo
- Qunde/ qundeyo/Magî qundeyo
- Qun bi xwelîyo/xwelîyê
- Qun bi eko
- Qun bi pîneyo
- Qurimê kinê/xwelî vi we qurimeke çing didê xwe
- Qelêr (qilêr)/Magê bi qelêr/Magî bi qelêr

R

- Rûh ji bikişe
- Rûswayo (riswa)/ Xwe kiriyê rûswa
- Rezil û rûswayo/Rezil û rûswayê

S

- Sû (stû) di bin va biwe/ bûyo/bûyê
- Sû (Stû) bişikê/şikesto/şikestê
- Serî xwe bixwe/xwaro/xwarê
- Serîyê xwedana xwariyo/xwariyê
- Serseqeto(serîseqeto)/serseqetê
- Serî bi cino/Serî bi cinê
- Serî siviko/Serî sivikê
- Simtirsoneko/simtirsonekê
- Sehtekaro
- Serserî/ Magî serserîyo
- Sêhrbazo/Sêhrbazê
- Sizi (size) lê were/Sizi lêhato/lêhatê

Ş

- Şorsisto/Şorsistê/Xwelî vi we şor çima sist in
- Şorpîso/Şorpîsê/De hîş be şor çima pîs in
- Şorê devî xwe bizane
- Şaş bûye/ Magî î şaş bûye/Magê ê şaş bûye
- Şerpeze biwî/ bûyo/bûyê
- Şerpelî biwî/biyo/biyê
- Şerro (Magî şerro/Magê şerrê)
- Şiksizo/Vê(bê)şiko/şikê

T

- Tu royan (rojan) newînî
- Tu di siwê negiheyî
- Têda hato//hatê
- Tu xêran nebînî
- Text û tac wergere/ wergeriyo/wergeriyê/
- Text û tac belav bûyo/bûyê
- Tireko/Tirekê
- Tir e/Tir e pîsî bi mehdeyo (tenê jin dibên)
- Tirê li binguh ketiye/Magî tirê li binguh ketiye
- Turo/Turî ji turayo
- Tevgêrneçêyo
- Tevger sisto /Tevgêr sistê
- Tû(tûv), Tû ji te ra
- Tîtikî heniyê/ku min pê tikî hênîyê va da tu ê di dor hevra çerx biwî

U

Û

V

- Vi (Bi) ber dupîya kevî/keto/ketê
- Vi /Bi) ber tomafîlê kevî/keto/ketê

- Vireko/Virekê/ Magî vireko/Magê virekê
- Vi (Bi) ber lêh kevî/keto/ketê
- Vê(bê) heşo/heşê
- Vê(bê) fedî û heyayo/heyayê
- Viseko/Visekê

W

- Wêlkanî biwî/ bûyo/bûyê/Magî wêlkanî
- Weledzînayo

X

- Xadim/Xadimo
- Xwelî vi we (be), xwelî vi sêri we (jin dibên)
- Xwelî vê we, tevgêr çima neçê ye
- Xwelî vi şekilê we
- Xwelî vi çalimê we
- Xwedê bela te bide
- Xwedê xezewê lêkiriye
- Xwe bixwêra bikişinî
- Xwîn verişîyo/verişîyê
- Xeniqiyo
- Xwîn di devûbêvilan ra hato/hatê
- Xeneqokî bûyo/bûyê
- Xinzîro/Magî xinzîro
- Xago/Xagê/ Magî xago/Magê xagê
- Xizan/Magî xizano/Magê xizanê
- Xêrnexwazo/Xêrnexwazê

Y

Z

- Zinaqî biwî/bûyo/bûyê
- Zinaqî kirin/Vî kulvêketî ez zinaqî kirim
- Zindiq/Magî zindiqo

- Zînekaro
- Zulimkaro/ Bi zulimo/Zalimo
- Zîyankaro
- Zimandirêjo/Zimandirêjê
- Zalimo/Zalimê

Çend zêfên ji doxîne berjêr

- Ar î vêketiyê/magê ari vê qulê ketiye
- Bê(Vê) aro/ Vê(Bê) arê /Magî bêaro/Magê bêarê
- Bi dêv da ek(gû) kiro/Bi dêv da rîyo (jin dibên)
- Bi devî bavê da ek(gû) kiro/rîyo (jin dibên)
- Bi dêv da mîz kiro/mîz kirê

(Ji devî mêran)

- Dev bi eko(gûyo) /Dev bi ekê
- Di(Bi) navranê da berdayo/berdayê
- Di qulê nayo/nayê
- Di qulê va radayo/radayê
- Di dayikûmaka nayo/nayê
- Di dêûxweh nayo/nayê
- Di dêûjinê nayo
- Di dêv nayo/ Di dêv kiro
- Di hestîyên bavê nayo/nayê
- Di qulûgilika nayo/nayê
- Di devûqula nayo/nayê
- Di qulûqewara nayo/nayê
- Di partelê nayo/nayê
- Di sînseleyê nayo/nayê
- Di gana nayo/nayê
- Di tire nayo/nayê
- Di gornê (tirbê) bavê nayo/nayê
- Di şorê nayo/nayê/Maka şorê guhême
- Di qulê çavan nayo/nayê

(Ji devî jinan)

- Ekî(gûyî) min di devî bavê we
- Ekî min bixwe/xwaro/xwarê
- Ekî xwe bixwe/xwaro/xwarê
- Ekî alêmê bixwe/xwaro/xwarê
- Ekî alemê di devî bavê we

(Ji devî mêran)

- Kun bi eko/ekê
- Qul bi xirê
- Kîrî min bixwe/xwaro/xwarê
- Maka qulê gihê mê
- Maka dê gihê mê
- Maka çehrê gihê mê
- Maka ton gihê mê
- Maka gilîkê gihê mê
- Maka partalê gihê mê
- Maka heşa gihê mê
- Maka qurîmê gihê mê

⁽¹⁾ Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

Wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Bermekiyên kurd di kûraniya dîrokê da

Mog - Mecûs - Bermek:

Lî dora salên 1100î b.z. gelê Mad (pêşiyên gelê kurd) li derdorên çiyayên Zagrosan bi cih û war bûbûn. Ji dewleta wan ra, ya wê demê li çiyayên Zagrosan, Gotiyom (Gotium) dihate gotin; li gor şaxê Gotî / Cûtî ji

pêşiyên Kûrdan in. Lê di hezarsalê pêşî yê b.z. da, bi navê Mad (Midiya) hatin naskirin. Mad bixwe ji yekîtiya şeş êlên mezin pêkdihatî, ew jî wek ku Diyakonov dibêje ev in: Boudloi. Arizatoi, Strouknates, Paretaknoi, Boussi û Magoi. Ev nav jî pir dişibihin ew ên ku Herodotes gotine.

Niha ji bo mijara me, ev êla Madan Magoi (Mag, Mog, Mûg) girîng e. Ji ber ku Ayîna Ezdayî (Yezdanî) wê hîngê li welatê Mad serdar bû û pêximber Zerdeşt jê ra Mezda Yesna yanê Ayîna Mezda gotiye. Wek ku di jêderên dîrokê da hatiye gotin, ev êla Magoi pispora kar û barên ayînê bûye. Rola wan dişibihe rola êla Lawî ya Îbranî ku ew jî pispora kar û barên ayîna Cihûyî bû û pêximber Mûsa jî ji wê êlê ye. Û herwisa dişibihe rola êla Qureyş ku ew jî pispora kar û barên ayînê ye li ba ereban di dema berî Îslametiye da û pêximber Muhemmed ji vê êlê ye. Vê êla Magoi di Zerdeştîyê da jî ev rola xwe parastiye. Dîroknasên Yûnanan (Girekan) ev nav bi awayê Magos / Magûs nivîsandine û ereban jî bi awayê Mecûs gotine. Peywendîya vê peyva Bermek pir bi peyva Mag / Mog yan jî Mecûs ra heye. Şîrovekirina herdiyan jî, ji du

hêlan va, pir li nêzî hev e:
 Yekem: Peyva **Bermek** ji peyva kurdî **Bermak** hatiye erebkirin. Di vê babetê da peyva **BER** tê maneya pêwan, oldar, xizmetkarê Xweda û peyva **MAK** tê maneya Mala Pîroz, Mala Reşen, Mala Dayîkî. Duwem: Ji parêzvanê pereştgeha zerdeştî (mala agir) ra **BERMOG** dihate gotin; yanê ew oldarê berpirsiyar ji ber pereştgehê va. Ev nav di jêderên erebî da bi awayê **BERMEK** hatiye, jiber ku tîpa (g) di zimanê erebî da tineye. Diyakonov dibêje ku di dema Sasaniyan da ji Magwpati = Mogbedan ra Mobedyan dihate gotin. Ev nav bi awayên (Mewbezan) û (Mewbedan) derbasî jêderên erebî bûye. Ev Mewabed berpirsiyarên pereştgehan (malên agir) bûn û ji serekê herî bilind ra (Mewbed, Mewbedan) dihate gotin. Aştâ vî Rêveberê Ayînî di hemû babetên ayînî da aştâ here bilind bû û rola wî wek rola Papa li ba Xirîştiyanan bû. Wî çavdêrî li dad û yasayê û pêkanîna dademendiyê, li pêkanîna nimêjê, lidarxiştina şahiyên di dema wan da û paraştina agirê pîroz di pereştgehan da dikir. Ji mafê wî bû jî ku di roja Newrozê da bersivê ji

padîşah bixwaze heger kesekî dozek li dijî wî (li dijî padîşah) rakiribe. Beşekî din ji oldaran hebû ku karê wan ew bû, agirê pîroz di pereştgehan da her vêketî bimîne. Ji van kesan ra (Harbed), bi kurdiya niha (arbed) dihate gotin. Yanê ew kesê ku herdem êzing û daran li agir dike da ku her vêketî bimîne. Di pirtûka pîroz *Aveştâ* da (*Athrapatî*) hatiye gotin û maneya (*Athrapatî* / *Harbed* / *Arbed*) her mîna hev e. Ev nav di jêderên erebî da bi awayê (*Herbez*), bi şêweyê gelejimarî (*Herabize*) hatiye. Ji serekê wan ra (*Herbezan* / *Herbez*) dihate gotin. Radeya *Herbezan* di aştâ duwem da piştî ya *Mewbedan* dihat. Ev peyva (*Mog* / *Mag*) di bermaya îslamî kurdî da bi awayê (*Şêx Mog*) heya niha maye. Li herêma Efrîn, li rojavayê Kurdistanê, bi gelemperî di sibeha roja îniyê da hin kes li ser malan digeriyan, hin sirûdên ayînî digotin û wisa hinek dirav, ard û zeyt dicivandin. Ev hên jî bi navê (*Şêxê Mog*) tên naskirin. Wisa tê xuyakirin ku ev nav bi encama têkilkirina navê îslamî (*Şêx*) û navê *Ezdayî* (*Mag/Mog*) pêkhatiye...

(Çavkanî: *Birnebûn*, hejmar 67/2017)

Alamanîya/Mainz, çirîya pêşin

Kilama şîné*

Oyy lo Ferat¹ o
Oyy bini qûm e
Oyy bi ser ra dihat o
Ne mêrikê Şerefliyê sibe de
Ji mala xwe derket o
Seet li deh û dudu ya
Li can ê Batîn bû celad o
Oyy Hew² dibê:
”teyr im, teyr im, teyrke ker im“
Ez a berve Almaniya şewitî herim
Ez a îza lawikê Batînî xwe bigerim

Oyy lo Ferat o
Oyy bê bini qûm e
Oyy bi sera dihat o
Ne mêrikê Şerefliyê ji sibe de
Ji mala xwe derket o
Li can ê Batînî min bû celad o
Bê lawî lawî Batînê min lawî
Îşlig ê spî çakêtê mavî
Ew çiflig a gî emegê Batîn e
Xwedê te mutetîk pê de
çing satîşê di zik de mayî
Bê erê lawo Batînê min lawo
Li ser rîya Qulekê di xew de mayo
Bavê nexweş çima qe de li xwe nenayo

Oyy bê Batînî min î bi lorik a
Bûk ê min ê hînê biçûke
Hewê bê bûkê qurban bi fediyê
Were kapiya derkeve
Bê apo rabe serê min xeliyê
Oyy lawo lawo Batînê min lawo
Çima kekê qe de li xwe nenayo

Oyy lo Ferat a
Oyy bê binî qum e
Oyy bi sera dihat o
Oyy keç keçê tê me wê navriyê wê navriyê
Ne Vêysel terê çifligê îş gûcê xwe kiriyê
Ne mêze dike karşi Batînî ramediyê
Oyy heyra bir o
Keçê min bes e; ”ne zemanê xwe ye”
Min xwang gî bi qurbana çavî Emir kir o
Ez çûm herdê temel hundirê min negirt o
Min lê meskir min got: ” kardeş ez herim
malê xwe ji heqê xwe derêm o ”
Min qemîş nekir carekê jê pirs nekir o
Oyy Oyy Oyy kurban!

Berhevkar:
Mehtab Îdelî
Zürich

*Kesekî ji gundê Celika-Yeşilyurtê bi navê Bahattîn Çelik di roja 05.10.2017an de bi ereba xwe li ser rêya Kuluyê qeza trafîkê de dimire. Ev kilama şîné li ser hatiyê gotin. Di ereba hemberî wî de jî du kes ji gundê Şerefliyê jiyana xwe ji destdidin.

¹ Çemê Feratê

² Hewik dayîka Bahattîn

Ew bê min nake

Mem Xelîkan

Dema Kewê bavê xwe wenda kir hê danzdeh salî bû. Keça malê, bi tenê wû. Dê û bavê wê, Gozê û Heco di kargehekê de kar dikirin. Kargeha, konfeksiyon û dûrinê. Heco, berpîrsiyarê parastinê, Gozê jî li wir karê dûrinê dikir. Hevdu li wir nas kiribûn. Heryek ji wanan, ji gundeki bajarê ku lê dijîn, bûn. Heyî û tuneşîya wanan, Kewa delal tenê bû. Mîna çavên xwe ew diparastin. Dexwazên wê, yek nedikirin dudi. Dixwastin wê bidin xwendin, ku ew bibe jineka zana.

Mixabin, jîyan li gora xwastina wanan bi rê neçû. Rojekê ji rojên payîzê, daran pelên xwe weşandibûn. Giya, çêre û heşinayîya derdorên kolan û kûçeyên bajêr zer û hişk bûyîbûn. Eyamekî xweş hebû. Heco û Goz, wek her roj li kar bûn. Dûv xwarina nîvro Heco hat, ber deriyê kargehê yê derva rûnişt. Ji berîka xwe, cixare û heste biderxist. Cixarek vêxist û kûr kûr kişand. Dûmanê cixarê, li dev û serçavan belav dibû. Hê cixara xwe xelas

nekiri bû, êş kete sîngê wî. Cixare avite erdê, destê xwe da sîngê xwe, xwî lêdiket û verişîya. Xarva hat û bi dev û rûyan kete erdê. Sekteya (qîrîz) dil bû. Hînî ciwan bû. Tu nexwaşiyên wî tunebûn. Mirineke giran û bi şewat bû.

Bi ser wê sekteyê de Heco, Goz û Kewa xwe ya delal bi tenê ci hîşt û çûbû rehmê. Dîna Gozê, bi serê wê de xelîyawû. Lê dizanî tu caran bi ax û nalînan, bi girî û feryadan kesî tu miri venegerandine. Jineka jîr û jêhatî wû. Xwe zû berhev kir. Dizanî qar û barê malê, li ser stû û milên wê ma bû. Pêşeroja Kewê û xwandina Kewê jî, girêdayîya wê bû. Dixwest ew, li ser lingên xwe daweste.

Keça xwe, xezala xwe awêni dikir. Kew da pêşberî xwe:

– Keça min, delala min, bavê te bi mirineke bêwext çû ser dilovanîya xwe. Nizanim lezgîniya wî çi bû? Xwedê rehma xwe lê bike. Cihê wî bihuşt be. Dizanim, bavê xwe wendakirin ne tiştêkî hêsan e. Mixabin, em çi bikin nekin êdî

ew li me venagere. Tu caran miri, venegerine. Ez sozê didim te, eza ji te re him bi dê, him ji bi bav bim. Birîna min û te yek e. Dixwaze ez û tu, du jin, li ser lingên xwe dawestin. Jîyana xwe bidomînin û dexwaza bavê te, bi cih bînin. Pîrr dixwast tu bixwînî û bibî jineka zana. Eza, karê xwe bikim. Meaşa bavê te jî heye. Em ê debara xwe baş bikin. Ji bo aborîyê, tu meraq neke. Çavên te, tenê li ser xwandinê bin keça min! Em ê, wîngê rihê bavê te jî şad bikin.

Kewê, bêdeng û bêes guh dida ser gotinên dayîka xwe. Dema bavê xwe wenda kir, hê nû dest bi dibistana navîn kiribû. Heco, ji wê re formayên dibistanê, çente, pirtûk, pênuş û lènûsk hwd. her tiştê cot bi cot kiribûn. Wê rojê, pîrr kêfxwaş bû. Te digot qey dine bûyê ya wî. Kewa wî, xezala wî, dest bi dibistanê dikir. Di nav şagirtan de dibirûsî. Keçeke xwînşîrin û kehîl bû. Dev poz biçûk, dêlimzirav, mîna bavê xwe, bejndirêj û navzirav bû. Çavên wê jî, dişopandin ser yê Heco. Mîna Heco, çavkesk wû. Porê wê jî, mîna porê Gozê çeqer bû. Heco bi Kewa xwe, şanaz û dilşad bû. Lê felekê Heco, nebaxşande Kewê û Gozê.

Ew rojên şanaz û dilşad bi wanan pîrr dîtibûn. Ew zû, him jî pîrr zû ji hevdu veqetandibûn.

Dûv Heco ve, Gozê qet tu kêmayî bi Kewê re nedihîşt. Xwe bi wê girêdabû. Xemla wê yê ku pê here dibistanê, kinc, meras hwd. û kincên li derva li xwe dikirî, ji yê herî baş dikirîn ku ew li nav hevalan fedî neke. Kewê jî, piştî xwe dabû dayîka xwe. Ew nedîşand. Ji gotina dayîka xwe bi der nediket. Li dibistanê jî, şagirteke jîr û jêhatî bû. Di her poleke dixwandî de, tim û tim serkeftî bû. Ev rewşa Kewê, Gozê kêfxwaş dikir, ew li ser lingan digirt û bi jîyanê girêdida.

Sal, bi qar û bar bin jî, zû derbas bûn. Sê salan şuva Kewê, dibistana navîn xilas kir dest bi lîsê kir. Wê hero, sibê zû ji xewê radibûn.

Gozê, xwîrini amade kir. Siftê Kew da berxwe, porê wê şekir. Xezala xwe ya delal, ji bo çûyîna dibistanê xemiland. Hê li ser sifrê bûn Kewê, destê xwe avite zikê xwe:

– Oy etê! Zikê min, got û li ser kêleka xwe ya rastê gêr bû û bîrva çû.

– Wêê. et bi qurban, çi bû, got.

Kew zû hate xwe, rabû.

– Nizanim, heşê min çû.

– Tiştê tune keça min, qey te xwe qefilandîye.

– Na na, ne weng e, etê.

– Netirse, ka serê xwe bide ser jûnî min.

– Etê, derbas bû.

– Dixwazî, huro nere dibistanê.

Li mal, vêsîneya xwe bigire.

– Na na, ez ê baş im. Derbas bû. Em rabin, tu here kare xwe, ez jî herim dibistanê. Mereq neke, derbas bû, tişteke nema, Kewê got. Û herdu, ji mal derketin çûn.

Wê rojê şuva, sivik bin jî ew nobetên Kewê, ji çend mehan carekê pê digirtin. Carcaran, li nobetan çeng û destên wê jî diqerisîn

Carekê dudiya, Gozê ew bire ser bijîjkan jî. Wanan jî, pîr guh pêve nekirin. Digotin; dibe ku ji ber stresê û psikolojik be.

Kew, ketibû heyjeh salîya xwe. Li lîsê, pola siseyan dixwand. Rojekê di polê de, di nava dersê de, nişkava pît gêr bû û serê xwe li masê xist. Dest û diranên xwe diguvaştin hev. Dest, çeng û lingên wê diqerisîn. Kef, bi ser dev û lêvên wê diket. Dicerifi. Mamoste û hevalan ew li erdê ramedandin. Çenga wê, ji hev kirin û paçekî paqij kirin navbera diranan ku ew zimanê xwe gez neke.

Mamosteyekê, kolonya anî, pê bîhnkirin dida. Li berxwedidan

ku destên wê ji hev bikin. Demekê şuva, Kewê bêhna xwe kûr kûr kişand. Çeng û destên wê, hêdî hêdî ji hev bûn û laşê wê sist bû. Çavên xwe vekirin, tenê got; xewa minê tê û kire xore xor, kete xewê. Mamostan, ew bi wî halî, kirin erebekê û birin nexwaşxaneyê. Bijîjkan, ji çend tehlîlan şuva navê nexwaşîya Kewê lêkirin. Gotin: Ew keps e. (epilepsi). Ji wê re, çend derman nîvisandin. Bijîjkan xwastin ku ew, mehekê şuva were venêrîne (qontrol). Mamostan ew birin mal û çî hatiyê serê Kewê yek bi yek ji dayîka wê re kat kirin. Dina Gozê, carek din bi serê Gozê de xelîya. Jîyana xwe, pêşeroja xwe bi Kewa delal ve girêdayî bû. Feleka bêbext, destê xwe ji pîstê wê nedikişand. Nedihîşt ew ber xwe bibînin. Dîsa ewrên reş, ser serê wana re çerx dibûn.

Dema bi Kewê ve herdu tenê man, Gozê berê xwe di Kewê alkir û got:

– Kewa min a delal, xezala min, tu qet xwe neêşîne. Xwedê yî mezin e. Derd dane, derman jî dane. Huro, ji bo tenduristîyê zanyarî û zanistî pêşta çûye. Eza te, bijîjk bi bijîjk bigerînim. Te, ji wê mêratê ku serê miriyên min xwarî, ji wê kepsê xilas kim.

– Erê, serê min diêşê, xewa minê tê.

– Erê keça min, parîyek nan û kevçiyek dudi şîv bixwe, dermanên xwe vexwe dûva çiqas dixwazî rakeve. Mamostê te got: “Ma Kew, du sê rojan li mal be, neyê dibistanê. Ma ew, vêsinaîya xwe bigire dûva were”. Ez jî, du sê rojan îzina xwe bixwazim.

– Bû, got û tiştêk nexwar, ne jî vexwar kete xewê.

Dûv wê rojê, ku navê nexwaşîye jî dane ser Kewê, morala herduyan jî xirab bûyî bû. Kew diçû dibistanê dihat. Lê wek berê ne xenê û xedar wû. Mîna berê, guh bi dersan ve nedikir. Ji bo wê, serkeftî jî nedibû. Navê nexwaşîyê, giran bû. Qet, ji serê Kewê bi dervediket. Bedena wê li dibistanê bû lê serê wê ne li dibistanê wû. Bi ser dermanan ve navbera nobeta (sekte) dirêj bûyî wû. Sivik bin jî, çend carên din li dibistanê nobet derbas kirin. Ew sekte ne dirêj bûn. Zû dihate xwe. Lê di nav hevalan de moralê wê xirab dikirin.

Goz jî kar, Kew jî dibistanê vegeirbûn mal. Di maleke, ji du goz û mavênîyekê de rûdiniştin. Derîyê malê hesinî bû û bi boyaxeke şîn boyax kiribûn. Ji malên ku bi

şev bi dizikî (Gecekondu) çêdikirin bû. Li taxeke bajêr ê xewle bûn. Mal biçûk be jî, têrî wanan dikir.

Êvar bû, ser sifrê rûniştî bûn, şîv dixwarin. Kewê got;

– Dayê, ez ê ji te re tiştêkî bejim.

– Bêje, dayîka min.

– Ez, huro dîsa bîrva çûm.

– Wêê, dê û bavê min bi qurban, dîsa?

– Erê.

– Giran wû?

– Na, mîna berê ne giran bû.

– Ji dermanan şuva, tu yê hê rind î.

– Erê. Dayê, ez êdî li nav hevalan ji ber vê rewşa ez têda fedî dikime. Di nav hevalan de, bîrvaçûyîn li min bi qar têye. Ez ê, guhê xwe jî nadime ser mamoste û dersan, mîna berê, serkeftî jî nabime. Eger tu jî bê erê, dixwazime navberê bidim dibistanê.

Gozê, bêdeng guh dida ser Kewê. Siftê, wek erînî bike serê xwe li ba kir. Dûva;

– Erê erê, delala min, te baş fehmedikime. Keça min, te çing xwastîye em wer bikin. Ma tu yê xwaş bî. Îsal navberê bide dibistanê. Here cem bijîjkê xwe were. Biryara te dayî jî, bi wî re parveke. Dermanên vî dayîn te, wek ew dixwaze bi wext

vexwe. Nexwaşîya te derbas bû, tu ya nûva dest bi dibistanê bikî. Tu ya, salek dudiya wenda bikî. Ma tu yê, xwaş bî. Qe ne mirin e!

– Mala te ava, etê! Ji bo ku te ez fehm kirime kêfxwaş bûm. Ez jî mîna te difikirime. Eza li mal jî dersên xwe bişuxulim. Him jî, bi te re karên malê jî bikim. Tu jî xwe pîrr diwestînî.

Kew li mal, Goz jî diçû kar û dihat. Çend meh jî weng derbas bûn. Jîyana wanan her roj wekhev monoton bi qar û bar, bi derd û kulên wan ve tev diherikî. Ber êvarê bû, Goz ji kar derketî bû. Li derva, esmanan evrên reş berhev kirîbûn. Têra xwe baran dibarî. Mîna ku ewr daketine erdê û qulbûyî bûn. Gozê sîdanka xwe vekir û bi zorê xwe gihande rawestgeha otobosê. Baran bi hemdî xwe dibarî û bi teqereqa ewran ve tev brûskê vedina. Dema giheşte mal, şil-şilkî bûbû. Derê malê ji hev kir;

– Kewê, Kewê got. Tu bersîv negirt. Kete hodê û dît, Kewê dernexûn raketîye. Ser devê wê, tijî kef û xwîn e. Kewê, hêdî hêdî çavên xwe vedikir, vala vala mês dikir.

– Wêê Kewê, malê min şewitî, dîsa bîrve çûyî?

Kewê, bi zorê lêvên xwe livandin.

– Nizanim, qey dîsa ew mîrata ye.

– Wêê delala min, ez bi gorê, ez te carek din bi tenê bernadim. Eza dest ji kar berdim. Eza wî karî li mal jî bikim. Na na, ez te bi tenê bernadim.

– Na etê, du roj in min derman wenexwarin. Ez, ji bo wê gêr bûm. Tu karê xwe bernede.

– Çima qurban? Çima? Çima te derman berdan.

– Ji min ku eza xelas bûme. Zûva ku min, nobet derbas nekirine.

Bi ser wê de, gozê dest ji kar berda. Ji bo ku Kewê bi tene nehêle. Êdî herdu jî li mal bûn. Demên wanan ku betal in, hê zêde bûn. Gozê hê zû zû Kew bire bijîjk û anî. Dermanên wê, bi destê xwe û bi wext didan wê. Ji bo debara dinê û tengasiya aboriyê, dest bi karê dirûnê kir. Ji cîran û hevalan re dirûn didirût. Kewê jî alîkarîya wê dikir. Wexta wanan betal zêde bû. Carcaran diçûn navenda bajêr digeriyan. Diçûn sînemayê. Diçûn li perqan rûdiniştin û çay-qehwe vedixwarin. Ew gerana, ji Kewê re baş dibûn. Bêhna wê fireh dibû. Şeş mehan, tu nobet derbas nekirin. Nexwaşîya wê, her diçû baş dibû. Morala wê û rewşa wê jî pîrr baş xuya dikir.

Li venêrînekê, bijîjk gotibû; “Rewşa Kewê, baş xuya dike. Veng çû, hetanî çend mehan şuva, îşalla em ê dev ji dermanan berdinê.” Bi wê gotinê wek mîzgînekê, Goz û Kewê kêfxwaş bûn. Bi wê xenê bûn û bi şanazîyekê, ji cem bijîjk derketin derva. Çûn, li resteurantekê zikê xwe têr kirin. Dûv xwarinê ve, çûn li baxçeyê pêşberî resteurantê çay wexwarin. Mîna ku herdu jî, ji nû ve hatibin dinê. Bi omdiyêke mezin, mîna du hevalan jîyan didomandin. Vê xeberê jî ew hê zêde bi jîyanê ve girê dan.

Bi ser wê gotina bijîjk ve, Kewê derman venexwarin. Ji dermanan osan bûbû. Gotina bijîjk, wêrekî dabû wê. Bi xwe û xwe digot; “Gotina bijîjk rast e. Çend meh in, wê mîrata sektê bi min negirt. Êdî, hewcetiya min a dermana nema.”

Dayikâ wê, ya ku emrê xwe û gulîyê xwe yên reş bi wê dayî, hay jê nebû ku ew dermanan venaxê. Bi ser venêrînekê de du hefte derbas bûbûn. Dû nivro wû. Dem, zivistan bû. Eyamî sar bû. Ji berfê, herderek spî dikir. Berfê, erd mîna çarşeveka spî nuximandî bû. Kolan û kûçe cemidî bûn. Meriv bi qar dimeşî. Rojeka wiqas sar bû ku Zivistana Romê ku digotin, ew roja bû.

Gozê:

– Me dirûna çend cîranan xilas kir. Ez herim vana bidim wana, eza perê xwe jî bigirim werim. Em ê so herin navenda bajêr bigerin. Eyamî sar e, te xwastîye, em ê herin sînemayê.

Kewê:

– Baş e, de tu here were.

Gozê:

– De tu jî, dor û paş xwe berhevke, van derana rêşke, ez werim em ê şîveka xwe bi ser êr din.

Kewê:

– Bû, tu here.

Kewê mal rêş dikir. Hişê xwe diçû. Hode, dor wê re çerx dibû. Gêr bû. Çeng kete hev. Destên xwe guvaştin. Dest ling û bedena wê mîna berê diqerisîn.

Ji der de Gozê li derê xist û tu bersiv negirt, bi lez deri ji hev kir û kete hundir.

– Kewê, Kewê!

Tu deng ji Kewê derneket. Kete hodê û dît Kewê dernexûn mîna laşekî raketîye. Dev û lêvên wê tijî kef û xwîn in. Serê wê da ser junî xwe û ew li ser piştê ramedand.

– Wêêê, malê min şewitandê çi bû? Kewê, Kewê ez qurban dîsa bîrva çûyî? Çima, ka lê bijîjk gotibû nexwaşîya te derbas bûyê. Ka?

Kew nehate xwe. Gozê mês kir, Kew bêhna xwe nakişîne, destê xwe da ser dilê wê, dil nedaviat. Meşî, li derîyê cîrana xwe xist û got; were, Kewa min bîrva çû. Lê mîna berê, nehate xwe. Bi cîrana xwe ve herdu, vegehrîn cem Kewê. Cîranê, halê Kewê dît ku ew ne di halekî baş de ye, got; "Tu daweste ez banga ambulansê bikim, em wê rakin nexwaşxanê."

Gozê, serê Kewê virde û wêda çerx dikir û tim digot Kewê, Kewê. Gozê, hay ji xwe nebû. Tê bigota qey xwe wenda kirîye, nedizanî çi dike.

Ambulans, bi sîreneke ku guhên meriya ker bike, li ber serîya lezgîniyê dawestî. Kew li ser sedyê, bi lez birin hundir. Bijîjk û hemşîre li serê wê civîyan. Berpîrsiyarê ambulansê ji bijîjk re got; "Dil û pişka wê dawestîyane, ew, arest bûye." Herkesekî karek dikir û li ber xwe didan ku Kewê xilaskin. Yek bi ser sîngê wê de diket, yekî hewa didayê, henan jî tamar ji hev kiribûn û derman didan wê. Mixabin, Kew ji xewa kûr şîyar nedibû. Nehate xwe, venegerî.

Nîv saetê şuva, bijîjkek ji hundir bi derket. Gozê serê xwe kiriye navbera destên xwe, henîşkên xwe

dayîne ser junîyên xwe vala vala mês dikir. Dema bijîjk dît, rabû çû ber wî dawestî. "Toxtor beg, Kewa min çawa ye? Li wê, baş binêre, heyî û tuneşîya min tenê Kew e," got. Hemşîrekê, ji bijîjk re wek ku bê; deng neke û mirinê kat neke, birûyên xwe berjor heynan. Dûva bi diskî, ji bijîjk re got; "Wê, hay ji xwe neye. Bi xwe û xwe diaxifê. Em wê, hêdî hêdî xeberdar bikin hê baş bibe." Wer jî kirin. Bijîjk ji Gozê re; "Em berxe didin, lê rewşa wê ne baş e." got û vegehrî hundir.

Du hemşîre, ketin bin çengên Gozê û ew birin rûniştandin dan. Pîrr neçû, bijîjk şuva vegehrî û ji Gozê re got; "Xaltî, tiştêkî em bikin nema. Serê te sax be!"

Mîna ku qurşîn berda dilê Gozê, destê xwe avite porê xwe, bi qîrini; wêê, mala min şewitî, got û ji pê de gêr bû.

Ronahîyê cihê xwe dabû tarîtiya şevê. Eyamî sar bû, li derva sermê dev û pozê meriyan dicemidand. Goz, li derva rûniştibû. Serê wê navbera destên wê de, kûr kûr difikirî. Qet deng nedikir, vala vala dor û paş xwe mês dikir. Kewa xwe ya gozel, wenda kiribû. Bi tenê, bi serê xwe mayî bû. Dîna wê, bi serê wê de xelîya bû. Her çiqas, ji wê re

gotibûn; tişteki tu bikî tune, here mala xwe, sibê were em cinazê te bidin te, bi gura kesî nekir. Tim û tim digot; “Na na, ew bê min nake.” Bi xwe û xwe, bi dengêki kes nebihîze tim û tim dubare dikir û digot: “Kewê, te li min çi kir? Te mala min şewitand, eza niha çi xwelîyê bi serê xwe kim? Te ez, sêwî cî hîştim. Eza niha, ji huro bi şuva piştta xwe bi kê dim? Eza xwe bi kê, helpisêrim? Wêê, te mala min şewitand Kewê!...”

Şev nivê şevê bû. Goz, li wî eyamî sar ku meri dicemidand çend saeta rûnişt. Li navberekê çi hate bîra wê nizanim, ji nişkava rabû çû hundir. Çû, rahîste sukura bijîjk; “Doxtor beg, li min baş mêze ke. Dizanim Kewa min, berxa min bê min nake. Eza herim mal. Lê hetanî ez hatim li Xezala min baş binêre. Kewa min, bi tenê nehêlin!...” got û bi lez ji nexwaşxanê biderket.

Dora dinê royê, ambulansê hate ber nexwaşxanê, ser sedyê, cinazek hebû. Ew bi çarşeveke kesk nixumandibû. Berpirsîyarê ambulansê, ji bijîjk re: “Ew mirî ye! got. Bijîjk, çarşev ji ser wê kişand û serçavên wê vekirin. “Mala minê, ez wê nas dikim, vava dayîka keça duh mirî ye, dayîka Kewê ye. Xwaska me ew duh berneda.” got.

Xortê ku ambulans anî, çend qutîyên dermanan ku hundirê wan vala, dirêjî bijîjk kirin û got: Vana, li kélaka wê bûn.

Bijîjk:

– Erê, dermanê kepsê ne. Dermanê Kewê ne. Xwe pê jehr daye, xwe kuştî ye.

– Destê wê yê rastê guvaştî ye, guçikê kaxizekê tê de xuya dikê.

Destê Gozê ji hev kirin. Di kaxize de: “Eza, herime cem delala xwe. Ew bê min nake.” nivisandî bû.

Pîrika Merxûr

Mistoyê Heco

mistoyeheco@hotmail.com

Hebûye tunebûye

Pir pir berê, wexta berx û guran di nav hebûnê de bi hev re divêsîn û ji têrbûnan di hembêza hev de radimedîn û bi dostanî dest li piştta hev dixistin li Axza Çolê gundekî biçûk hebûye. Li wî gundî jî Mistoloyek hebûye. Mistolo lawikekî pir ekis bûye. Delalîkê ber dilê dakê xwe bûye. Bi gotina dakê, nola şekiran şîrîn bûye.

Dakê tu carî nedicihiştiye ma gotineke Mistolo lê bibe didu. Ew bi şekir, mûj û mişqiran mezin dikiriye. Dakê Mistolo pir neçê û ekis ho kiriye.

Xwangeke Mistolo jî hebûye. Navê wê Mencê bûye, lê ew ne di xema kesekî de bûye. Mêla dakê tim ê li ser delalîkê xwe bûye. Xwang nola sêwiyekê mezin dibûye.

Di meselokên dakê de Mistolo tim î qehreman bûye û diçûye ji dakê xwe re ji pişt Girî Ziyaretê tenekeyek zêr û bûkek daniye.

Rojek ji rojan Mistoloyê me ye ekis xwanga xwe li dû xwe dixê û herdu xwang û birang xwe didin

rê, ku biçine Girî Ziyaretê. Dûr çûne nêzik vegeîne û herdukan şev li ser xwe reş kirine.

Wexta roj çûye ava û dinê kirasê xwe ye reş bi ser xwe ve kiriye, ew ji gund êpî bi dûr ketibûne. Ji westan û birçînan tu hal di wan de nemaye. Ewqas ku di şûna xwe de zemq mane, êdî nedikarîne gavekê jî biavêjin.

Şevê bi reşikahiya xwe re tirseke xof jî kişandiye ser wan û ev tirs di dilê herdu xwang û birangan de pêl bi pêl bela bûye, mezin bûye.

“Mistolo ez pir tatirsime. Min bihere malê.” gotiye xwangê û ji tirsaran leriziye. Ewqa tirsîye ku reng lê kişîye, spî-çolkî bûye. Xwangê bi çavên şil dewam kiriye: “Pir birçî me. Ez dakê xwe dixwazime. Min bihere malê...”

Mistolo jî pir ditirsîye. Herduk ketine hembêza hev û bi ser hev de girîne. Çiqas bi ser hev de girîne Xwedê dizane. Wexta aşt bûne mêze kirine ku hinekî wêde, di nav wê tariya xof de çîrek vêdikeve. Zûzûka şilikê çavê xwe ziwa kirine

û berê xwe dane wê çirê. Hatine û li ber malekê dawestîne.

Ev mal mala Pîra Merxûr bûye. Dîwarên malê ji paste çîkolate û şîraniyan, teq û deriyên wê jî ji lîmonada û lezzoyan bûne. Xwang û birangên me yên birçî hema xwe dane ser malê û dest bi ziktêkirinê kirine. Ji nişkave deriyê malê vebûye. Pîre gotiye, “Kî ye ew? Ka were ber çirê!”

Herdu xwang û birang neçar mane û hatine ber çirê. Pîre cardin gotiye, “Hûn kî ne? Li vê şevê li vir çi digerine?” Mistolo gotiye, “Ez Mistolo me, ev jî Menca xwanga min e. Em kê biçûna pişt Girê Ziyaretê. Me riya xwe winda kir û em ji vir ve derketinî. Em pir birçî bûnî. Me ji birçînan hinek ji pasteya dîwarê mala te xwar. Li me mexe. Dakê me wê sibê hinek paste ji dîwarê te re çêke.”

Pîrê çengê xwe xurandiye û gotiye, “Ew çi şora weng e. Hûn birçîbûn û we xwar. Hûn birçî nebûna we jixwe nedixwar. Hûn nola kurikên pir paqil xuya dibin. Ka werin hundir. Derva sar e û hûn jî pir westîne. Vê şevê bibin mêvanên min. Him li hundir neviyên min jî hene. Werin bi wan re hevaltîyê bikin heta seda.”

Pîrê Mistolo û Mencê bi vê şiklê xapandine û herduk kirine hundir.

Li vê malê Pîra Merxûr bi hersê neviyên xwe re dimaye. Neviyên wê hersêk jî bi Mencê re hemsal bûne. Hersêk jî keçik bûne û hersêk jî nola pîrê merxûr bûne.

Herpênc kurik bi kêf lîstine. Qirarek şûnva pîrê ji neviyên xwe re çav qirpandiye û gotiye, “Berxikên min çaxa ramedanê ye. Xewa we nayê? Mêvanên me westiya ne. Ma her kes here oda xwe û rakeve.”

Pîrê cihê Mistolo û Mencê li odeya kêleka aşxaneyê çêkiriye. Her kes kişîye odeya xwe. Qasek şûnva mîzka Mencê hatiye. Mencê deriyê odeyê vekiriyê lê ji çi re vekiriye. Pîrê di aşxaneyê de didanên xwe çerix dikirine. Mencê cîle vegeiriye odeyê û hal û hêkata pîrê ji Mistolo re kat kiriye. Mistolo bi çavên serê xwe îna nekiriye. Wî jî ji navbera derî re mêz kiriye û wî jî heman tişt dîtiye. Lê nizaniye çir bike.

Heta Mistolo were ser hişê xwe Mencê jê re gotiye, “Ez herim mayiniyê pîrê egle bikim tu jî di wê navberê de here neviyeke pîrê ûne têxe nav cihê min. Piştî wê Xwedêyî mezin e.” Mistolo bi gura xwangê xwe dike. Mencê derdikeve ji pîrê tasek şîrê kel dixwaze. Heta pîrê şîr

bikelîne Mistolo dihere neviyeke pîrê tîne dixê cihê Mencê. Di wê navberê de Mencê şûna mifteya derî di ber çavê xwe re dike. Mencê şîrî xwe vedixwe û tere rakeve û tê dikeve berlingên Mistolo. Qasek şûnva pîrê tê li dewsa Mencê neviya xwe dixwe.

Mencê Mistolo re dibêje, “Min şûna mifte hevisî. Tu here neviya dinê bîne ez jî heta hîngê mifte ji şûnê rakim. Mencê car din diçe axza dinê. Pîrê Mencê li hemberî xwe dibîne û çav li serî wê gewr dibin, lê bi xwe dikane û dibêje, “Keçika min çi dixwaze dîsa?” Mencê vê carê jî jê hevşikekê dixwaze. Pîrê hinek nanî kew dixê nav rûn û hêkekê bi ser de dişikîne. Heta hîngê Mistolo jî diçe neviya pîrê ya din tîne û dixê cihê Mencê. Mencê hevşika xwe jî dixwe û diçe ramede û tê dîsa dikeve berlingên Mistolo. Pîrê car din tê û bi niyeta Mencê bixwe neviya xwe ya din jî dixwe.

Mencê ji berîka xwe mifte derdixê û dide Mistolo û jê re dibêje, “Heta ez pîrê egle bikim tu him neviya din bîne, him jî xwe

bigihîne derî û deriyê derva ji me re veke.” Mistolo cardin bi gura xwangê xwe dike. Mencê dîsa tere axza dinê. Bi çavpêketina Mencê re pîrê dike dîn bibe, lê dîsa bi xwe dikane. “Keça min dîsa çi dixwaze?” dibêje pîrê. “Xwaska tengî mûj û mişqir hebûna, dakê min tim dide birangî min lê qe nade min.” Pîrê diçe ji kulînê hinek mûj û mişqir derdixê û herdu berikên Mencê pê tijî dike. Mencê cardin diçe rakeve. Pîrê cardin tê Mencê bixwe. Pîrê tê û neviya xwe ya din jî dixwe. Heta hîngê Mistolo û Mencê ji wir direvin, derdikevin derva û teq û deriyên mala pîrê didin ber keviran.

Pîrê bi dengê şikestina camê re vediciniqe. Li der mêze dike, lê ji çi re mêz ke. Mistolo û Mencê li der in.

Mistolo û Mencê ji pîrê xilas bûne. Heta pîrê derkeve derva revîne û ji wir bi dûr ketine. Di rê de mûj û mişqirên pîrê yeko yek diavêtine devê xwe. Pîrê nizaniye li ber hersê neviyên xwe bikeve yan li ber belengaziya xwe bikeve.

Çîroka min çû rast. Min xwar sîniyek mast.

Bîranîyek ji lîseya Cîhanbeylîyê

Ibrahim Korkmaz

Cihanbeylî, li Anatolîya Navîn, qazêzeke bajarî Konyayê ye. Cihanbeylî kurdên canbegî demizarandine, Cihanbeylî bi canbega nav kirine, pîranîya xelkê wir kurd in.

Dibistana lîse (*Cihanbeylî lîsesî*) da, him ji dibistana navîn jî hebu. Vê demê, sala 1973-74an da ez diçûm dibistana navîn, sinifa 3 ya.

Rojekê dersa dîrokê (tarîhî) bu, mamoste bahsa cemîyatên bi zîyan (*zararli cemîyetler*) dikir, nişkava muavîne mudurê dibistanê, navî vî Yakup Usta bû, bi mamostê va hat ket sinifa me û Yakup Usta bahsa *Kurdistan Tealî Cemîyeti* kir. Muavîn pir xirab avêt lingê kurda.

Em zarokên kurd me pir fedî kir, Me fedîya xwe ra me xwast serê xwe di hundirê sirake (kürsiye ke), bengzê me avêt, rengê me sor û reş bû, me bi xwe xwe go; acaba em kurd pir xirab in, bavpîrên me xirabî bi devletê kirine û nivê sinifa me kurd bûn û nivî ji tirk bûn. Zarokên tirk neçê me mize dikirin. Tiştêkî dîn tê bîrya min; çima pênc mamoste di sinifê da bûn, eger em dijî devletê tiştêkî bêjin, ew pênc mamoste, bi şahî û

bi îspat em didan dest polîs. Paşê ji em hewalên kurd, me fedî kir, em di nav xwe da bi kurdî xwe deng bikin. Hewalekî me hebû, navî vî Alî Kart, me jê ra digot; *Palavraci Alî*. Alî êdî fedî dikir bêje, ez kurd im, digot; esas eslî me ji Selanîkê hatîye û wî deraw dikirin. Me jê ra digot; xarziyê Atatürk.

Hevalek jî sira pêş min rudinişt, me jê ra digot; Bozo, ew kurd bû, paşê vî got, ez tirk im. Rojekê bavê wî li gûnd hatibû Cihanbeylîyê, wî bi Bozo ra kurdî deng dikir û min dît. Paşê Bozo hat sinifê, min bi kurdî ji Bozo ra qise (*küfür*) kirin, min xwest kî, Bozo bersiva min bi kurdî bide.

Feket Bozo sor bû, reş bû û xazîye di kirika xwe da dakaltan, serî xwe kir ber xwe, wekî mîsalê Nuh got û peygamber negot û bersiva min neda.

Ji dibistanê zarokên tirk ji me ra digotin; *kiro*, me jî ji wana ra digot; *hödük* û nav me da tu cara şer çinebû.

Ez salek şunda, çûm dibistana lîse, li bajarî Konyayê. Me xwanda-



vanên li Kurdistanê hatinê Konyayê û unîversîte dixwandin naskir, me ji wan hewalana ji bo mesela *Kürdistan Tealî Cemiyetî* pirsikir û hewalan gotin; devleta tirka pir derewa dike, pir lîstik ser kurda çêkrin, pir katlîam hanîn serî kurda û pir kurd kuştin û pir ji nefî kirin, ji me ra gotin.

Çend saleka şunda, ji me ra gazete *Roja Welat*, kovara *Rizgari* û *Özgürlük Yolu* dihatin. Me ev kovarana dixwand û me fam kir ku tirki ji me ra derawa dikin.

Esas bi wesîka û bi îspat me xwandî, ji bo *Kürdistan Tealî Cemiyetî* û bi 18 hejmar kovara *Jin* derketi bû. M. Emin Bozarşlan kovara *Jin* ji zimanê osmanî wegerandî zimanê kurdi û tirki.

Di kovarê da dibêje; endamên *Kurdistan Tealî Cemiyetî*, pişniyarek ji serokê cemiyetê Seyit Abdülka-

dir Bey ra tînin. Di peşniyarê da dibêjin; êdî devleta osmaniyan belav dibe, hemû miletên bindest in ji osmaniyan serî xwe radikîn û devleta xwe çêdikin, em kurd çima ji Stambulê runiştine? Em

jî herin welatê xwe û xelkê xwe bi rêxistinîki bikin û çima welatê xwe azad nekin?

Seyit Abdülkadir Bey bersiva xwe da dibêje: Birayên me yê mîsilman û tirk dijî kafira şer dikin, weki em jî serê xwe rakin û dijî birayên xwe yê mîsilmanên tirk rêxistinê bikin wê demê em birayê xwe paşwa (ji par ra) xençer dikin.

Ewa hişiyarbûn gelê kurd û rêxistina gelê kurd dide dastkandin û tirka ra alikariyê dikin.

Atatürk devlata tirka xelas kir bi şunda çex kurda bû, pir katlîam hanîn serê kurda û pir kurd jî nefî kirin, muvkafata Seyit Abdülkadir Bey û hevalên wi, mukafata xwe ji meydana Diyarbakirê bi 47 hevalên wî hatin darxistin.


Kopenhag

Dekleresyona kurdên êzdî

(1872)

Rohat Alakom

Lêkolîna bi navê *Ezdîxan û 97 Ferman* di sala 2018an de li Swêdê di nav Weşanxaneyê APECê de hate weşandin. Pirtûkê ji aliyê Amed Tîgrîs û Rojîn Zarg de hatiye nivîsîn.¹ Wek li vir jî xuya dike navê pirtûkê ji du beşan pêk hatiye: Êzdîxan û 97 Ferman. Peyva Êzdîxan bi wateya warên êzdîyan hatiye bikaranîn. Peyva ferman normal tê wateya emir, bi taybetî jî emrên ku ji aliyê padîşahan de hatine dayin. Lê belê di rewşa êzdîyan de û di vê pirtûkê de bi wateya emrê kuştinê kitlewî hatiye bikaranîn. Di gelek stranên kurdî de hawar û gaziya kurdan li dijî fermanan hildikişê erş û ezmanan: “*Fermana serê kurdan!*”. Her qeza, bela û komkujiyên ku hatine serê êzdîyan wek fermanekê hatiye navandin. Çawa em di dîrokê de û di nav rûpelên vê pirtûkê de jî dibînin jimara van fermanên ku bona êzdîyan derketine zêde ne: 97 ferman. Di beşeke pirtûkê de ev fermanan yek bi yek hatine rêzkirin. Fermana yekem di sala 638-639an de û ya



dawîn di sala 2014n de pêk hatiye. Ev yek tê wê wateyê ku di nav 1376 salan de êrişên kuştinê li hemberî êzdîyan her berdewam kirine û jimara wan gihiştîye 97an. Fermana dawîn ango fermana bi nimra 97 çawa tê zanîn hemû cîhan rakir ser pêyan û nefreteke mezin li hemberî ekstremîstên îslamî peyda kir. Çawa tê zanîn Daîşê (Îşîd) di sala 2014an de êrişeke mezin bire ser êzdîyan Şengalê, bi hezaran mirov kuştin û bi hezaran keç û jin berhev kirin, di

¹ Amed Tîgrîs û Rojîn Zarg, *Ezdîxan û 97 Ferman*, 2018, Weşanxaneyê Apec.

sûkan de wek dîl (kole) derxistin firotanê. Hemû ev yekan di sala 2014an de qewimîn. Di beşa duwem ya pirtûkê de gelek bi firehî li ser van bûyerên dawîn tê sekinîn. Pirtûk bona kesên bixwazîn kurdên êzîdî ji nêzik ve nas bikin rêbereke kêrhatî ye. Di pirtûkê gelek mijarên din jî hene li ser wan tê sekinîn. Wek mînak eşîr, dîrok, çand û gelek mijarên din. Di paşya bergê pirtûkê de di quncikê nasnameya pirtûkê de em rastî van peyvan tîn: “*Qewl, beyt, qesîde, şehda, dua û dîrozgehên êzdiyan*”. Mirov têkiliyên van peyvan bi naveroka pirtûkê re dikare fam bike. Li belê mirov fam nake ev peyvan ji kîderê bi dizîka ve hatine di paşya bergê pirtûkê de cîh girtine?

Mijara ku li vir ez diwazim li ser bisekinim mijara Dekleresyona 1872 e ku kurdiya wê di pirtûka Tîgrîs û Zarg de cîh girtiye.² Dewleta Osmanî dema dixwaze qasî 15 hezar êzîdî berhev bike û wan wek leşker bişîne şer, serek, mezin û berpirsên êzidiyan dekleresyonekê amade dikin û li wir sedemên neçûna leşkeriyê rêz dikin. Ev deklerasyona kurdên êzîdî ji 15 xalan pêk tê. Li jêr em hemû teksê dekleresyonekê ji nû ve diweşînin

û diwazim bala xwendevanan bikşînin vê çavkaniya dîrokî. Ev çavkaniya nivîskî li hemberî leşkeriyê wek teksteke protestoyê dikare bê hesabîn. Wergera tirkî ya vê dekleresyonekê berî çend salan di pirtûkeke li ser kurdan de cîh girt. Nivîskarê pirtûkê İlhamî Yazgan vê dekleresyonekê wek bûyereke giring dihesibîne: “*Tevgera Lidîjîderketina Wîcdanî û Êzdîtî*” (Vicdanî Red Hareketî ve Yezidilik).³ Pêşengên êzidiyan ku binê vê çavkaniyê îmze kirine nîşan didin ku çand, bawerî û erf-edetên wan çawa dest nadin ew herin leşkeriyê bikin. Wan kesan giringiya çanda xwe derxistine pêş û li hemberî leşkeriyê mirov dikare bêje ku pê şer dikin. Ji ber vê jî ev dekleresyona kurdên êzîdî wek bûyereke *bêtaetiya sîvîl* (serkêşiya bêşer) jî dikare bê nixandîn.

Dekleresyona 1872

“Em êzdî ji ber sedemên dîni yên ku me li jêr rêz kirine naxwazîn xizmeta artêşa osmanî bikin. Em jî weke suryanî û cuhiyan di şûna ku em leşker bidin artêşê, em dixwazîn bacê bidin. Ji derî vê gelek sedem hene ku em leşkeriyê nekin. Em ji wan çend di 15 xalan de, ji we re pêşkêş dikin:

2 Amed Tîgrîs û Rojîn Zarg, *Ezdixan û 97 Ferman*, rûp.200-202.

3 İlhamî Yazgan, *Tarihîn Akışında Kürtler*, 2007, Zer Yayinevi, rûp.75-84.

Dekleresyona 1872

1. Ne mumkun e ku êzdî di artêşê de wezîfe bigirin.
2. Li gorî ola me ji heft saliyên heta heftê saliyên, ji mezinan ber biçûkan ve li gorî salname uyan salê sê car, di dawiya meha nîsanê de du car, di destpêk û dawiya meya îlonê cara sêyem û di dawiya meha cotmehê de ji cara çarem divê em Melekê Tawis ziyaret bikin. Kesî ku van pîrozbahiyên pêk neyîne ne ji me ye.
3. Li gorî salnameya Julyan di navbera 15-20 meha îlonê de ji heft saliyên heta heftê saliyên, ji mezinan heta biçûkan her endamê me divê li Lalişê pîroz turbeya Şêx Adî ziyaret bike. Li gorî ola me kesî ku van berpirsiyariyên xwe yê olî bi cî neyîne, ne ji me ye.
4. Her êzdî, her roj bi derketina rojê û avabûna rojê re dua dike. Ciyên ku misilman, xirîstiyên, cihû yan jî kesek ji oleke din li wir be, êzdî nikarin li wir îbabetê xwe bikin. Heke êzîdiyek li gorî vê şertê helwest negire, kafir e.
5. Li gorê mercên ola êzdî her ferd bira û xuşkeke xwe ya/yê axretê hildibijêre. Xuşk û birayên axretê ji her alî ve alîkariya hev dikin. Her roj hevdu ziyaret dikin. Êzîdiyê ku her roj xuşk an birayê xwe yê axretê nebîne, kafir tê hesabandin.
6. Li gorî dînê me naye qebûlîkirin bûyereke ku tê cezakirin; misilmanek dema sibehê zû berî ku dest bi nimêjê bike bêje: ez xwe dispêrim te ji Rebê însanan hemû ji şerê vesveselecîyan, xwe dispêrim Xwedê. Heke ji me kesekî vê bibîhîse di cî de wir terk neke, ew ne ji me ye, bê dîn e.
7. Dema kesekî/kê ji me dimire, divê li cem pîr an şêx hebe û ji mirî re bêje” tu divê bi Melekê Tawis ê pîroz bawer bikî û bimirî. Ji ber ku ew berî her afirînan hebûye. Misilman, cihû, xirîstiyên yan jî ji oleke din ji te re bêje were ser dînê me, divê tu red bikî û tu bêjî ez bi Melekê Tawis ê pîroz bawer dikim.” Ku ev ji aliyê kesên din ve weke rastiyek neye testîqîkirin, kesê mirî bê dîn dibe.
8. Her kesê ji me, her sibeyan divê here ser gora Şêx Adî û ji axa wî ya pîroz perçeyeke bixwe. Nexwe ji dîn derdikeve. Kesê ku bimire û ji vê axa pîroz li cem tune be û berî mirina xwe hinek nexwaribe, ew ne ji me ye.
9. Em di meha berfanbarê (kanûnê) de sê roj rojî digirin, ne li xerîbiyê, divê em li ser axa xwe bigirin. Piştî roja sisêyan pîr an şêx şerabê pêşkêşî her kesî dike û divê her kes vexwe. Heke weha nebe rojîya wî/

wê qebûl nabe.

10. Heke kesek ji me here welatekî din, li wir ji saleke bêtir bimîne û bi paş ve vegere, êdî nikare bi jina xwe re bimîne. Êdî kes keça xwe nade wî mirovî. Heke kesekî keça xwe bide wî, ew jî bê dîn tê hesabandin.
11. Weke me di madeya çaran de dabû diyarkirin, her êzidiyek xuşk û birayekî xwe yê axretê heye. Ji wan yek dibe bira û ya din jî dibe xuşk. Heke îşlikê bide dirûtin, divê xuşka wi ya axretê cara yekem stûkurka îşlikî wî veke. Kesê ku vê wecîbeyê bi cî neyîne ne ji me ye.
12. Heke ji me yek îşlikekî nû bide dirûtin an jî bixwaze cilekî nû li xwe bike, divê wan bi ava pîroz a ku di tirbeya Şêx Adî de ye, bişo. Ew kesê ku cilên xwe bi wê avê neşo ji rêya dîn derdikeve.
13. Li gorî dînê me cilên rengê şîn ê tarî li xwe kirin heram e. Em weke misilman, cihû, xirîstiyar û dînên din porê xwe şenakin. Heke em bikin bê dîn dibin.
14. Ji derî me êzdiyan ew kesên ku tuwalet, hemam an ji tiştên weka wan ku bi hevkarî bi kar tînin, divê em bi kar neyînin. Eqşî wê, em ji dînê xwe re îxanetê dikin.
15. Di navbera xwarinên dînê me û yên din de ferqên mezin hene.

Weke nimûne em goşt, kundir, bamya, lahana, xas naxwin. Heta ciyê ku xas tê çandin em nikarin li wir bimînin. Ji ber ev sedemên ku me li jor rêz kirin û yên weke wan, em nikarin xizmeta leşkeriyê bikin û we ji wan tiştan agahdar dikin.

Nav û şanenavên (îmze) kesên ku ev daxuyanî dane, ev in:

Mîrê êzdî, mîrê Şêxan Husên
Mîrê olî yê devera Şêxan Şêx Nasir
Mixtarê gundê Mam Reşan Murad
Mixtarê gundê Muskan Eyyub
Mixtarê gundê Hatara Husên
Mixtarê gundê Beyban Hesên
Mixtarê gundê Huzran Numo
Mixtarê gundê Baqaşra Alî
Mixtarê gundê Başîqa Cemo
Mixtarê gundê Xoşava Ilyas
Mixtarê gundê Girê Pahn Cixd
Mixtarê gundê Kebare Koçek Qaso
Mixtarê gundê Sîna Ebdo
Mixtarê gundê Qesra Izeddîn Xeyro
Mixtarê gundê Kebertu Tahir.

Ev kesan deklarasyonê dişînin Stambulê. Demeke bêdengî û aramî dom dîke, êzdî bawer dikin ku dewletê daxwazên wan qebûl kiriye. Piştî demeke kurt dewleta osmanî carek din artêşa xwe dişîne ser Şengalê.

Westandim

Xizan Şîlan

arzûyên
li ber bayê felekê ketî
dara bextewariya biharên
pel weşandî
qêrîna gewriya bedenên
şewitî
û stûyê mezlûmên
bi kindira sêdarê ve
daliqandî
ez westandim
hovitiya
celadên serdeman
êşkenceya zîndanên rûreş
xwîna wek çemên melûl
herikînî
û bêhna cendekên ji kolanan
difûre
ez westandim
cehaleta
zimandirêjên xwenenas
axa şaristaniya ku ji kezebê
dinale
sînga berbangên
êş û keseran dikişîne
û rondikên
di korta çavên dayikan de
cemidînî
ez westandim
zarokên li quncikên تنها
sêwî mayî
xeyalên saf û sefil ku hatinî dizîn
endişeyên dahatûya nediyar

û bédengiya
Cîhana ker û kor
ez westandim
agirpêta
eşqa dilê sipîsar bûyî
qedera
kirasê xerîbiyê li bejna xwe
pêçayî
jana bêxewiya şevistanên payî
û tirsê ketî zikê tava heyvê
ez westandim
kul û kederên laşê demsalên
bêçare
hêviyên bask şikestî
keştiya giyanê li nav pêlên har
asê mayî
hêrs û nefsa mirovên hesûd
û zilma çaxên genî
ez westandim
şîrheramên
li baxê hezkirinê kemîn vedanî
xençera di cîgerê wîjdanê re
çûyî xwarê
tenêtiya li nav qelebalixan
dengvedana ramanên kûr
giraniya barê tûrikê pirsên
nependî
û gera li pey bersivên
di mêjiyê min de diçeliqin
ez westandim

Stockholm

Hevpeyvînek bi Zara Hacî Îwiş ve

Memê Mala Hine



Zara Hacî Îwiş

Foto: M. M. Hine

Çend sal berê li Stenbolê di Weqfa Îsmâil Beşikci de me wek Koma Sînemaya Kurdî her hefte filmên kurdî nîşan didan. Salona nîşandana filmê her hefte tijî dibû. Piştî temaşekirina filman, me li ser filman xeber dide. Wê demê jineke bi navê Sunayê tim dihat film temaşe dikir û bêyî ku xeber bide li şîroveyan guhdarî dikir.

Rojekê min ji Sunayê pirs kir bê ka çima ew li ser filman fikra xwe nabêje. Wê jî got, *kurmanciya min ne baş e*. Min jî jê pirsî ka xelkê kuderê ye. Wê got, *ez ji Polatliyê me*. Ez şaş mabûm. Min got, ez jî

ji Polatliyê me. Paşê min gundê wê pirs kir. Got, ez ji Mîkaîla me. Min jî got ez ji Yuzukbaşiyê me. Vê carê ew şaş ma. Got, diya min ji Yuzukbaşiyê ye. Paşê em hîn bûn ku diya wê Zarê û bavê min meriyê hev in. Min xwest ez diya wê nas bikim. Sunayê got, ew li Foçayê dimîne, lê dema ku hat ez ê xeberê bidim te. Lê li hev nehat û li Stenbolê min Meta Zarê nedît.

Havîna borî li Stenbolê min Suna dît û jê hejmara telefona diya wê xwest. Min got, ez dixwazim bi telefonê bi diya te re hevpeyvînekê çê bikim. Wê jî got, telefon neke,



Zara Hacî Îwiş û mêrê xwe Heyder

Foto: M. M. Hine

here ba wê û bavê min. Herdu jî wê gelek kêfxweş bin. Meta Zarê li Foçayê dima. Min jî dawiya havîna borî rêya xwe bi ser Foçayê re xist û bûm mêvanê Meta Zarê û Apê Heyder. Meta Zarê li Foçayê gelek dihat hezkirin. Ew di nav Komeleya **Jinên Aştiyê** yên Foçayê de ji bo aştiyê dixebite.

Min bi herduyan re du hevpeyvînen dirêj kirin. Ji ber ku herdu jî kal û pîr bûn, min xwest em bêtir li ser jiyana berê ya li gundan xeber bidin û ew tiştên ku êdî hatine jibîrkin ji wan bibihîsim. Ewil min bi Meta Zarê re xeber da. Min gelek tişt jê pirsîn û wê jî bi kêfxweşi bersiv da. Ji ber ku hevpeyvîna me gelek dirêj bû, min bi naçarî kurt kir.

¹Gundekî kurdan li Polatliyê ye. 75 kîlometre li başûrê Polatliyê ye û jî eşîra Canbegan e.

Meta Zarê, tu dikarî xwe bidî naskirin?

Zara Hacî Îwiş: Ez Zara Hacî Îwiş im. Navê diya min Bes e. Ez sala 1936'a li Yuzukbaşiyê¹ hatime dinê. Em sê xwişk û çar bira wûn. Birê min ê heq Hecî Memîş deh û şeş salî wû mir. Em li Yuzukbaşiyê gir bûn. Birê min cihê wûn şûnva bavê min, diya mîn û em du keçik hilgirtin birin Polatliyê.

Kîjan salê bû?

Zara Hacî Îwiş: Sala 1952'ya wû. Li Polatliyê bavê min dukana manufatura vekir. Ez jî çûm rev Lîla Qirpolî. Lê re Lîla Ehmed digotin. Ez çûm ba wê, min va xeftanana dirû. Min dirûnê li wê hu kir. Paşê ez



Zara Hacî Îwiş li Focayê bi dayêkên aşitîyê re.

Foto: M. M. Hine

hatim, bavê min çû Enqerê mi re makîne anî. Ew makîne hîn jî heye. Min dirûn kir, min rind jî dirûn kir. Lê şûnde jî min xeftan hiştin û fistan li xwe kirin. Paşê min fistan didirûn. Paşê ez bûm terziciyeka mezin. Min

mialima re didirû, 23'ê nîsanê de li xwe dikirin. Min xeftan, entari, qutik, îşlik didirûn û dikir dukana bavê xwe. Bavê min ew difrotin. Lê ku yekî qumaş anî, min perê xwe bixwe hildigirt. Ez dergistî wûm jî min pir pere berhev kiribû. Heyder pisxaltiyê min e. Tim digotin, 'Em kê te bi Heyder din'. Hatin ez xwastim û me nişan kir. Çar sal em weyn man. Heyder çû eskerê.



Kîjan salê hûn zewicîn?

Zara Hacî Îwiş: 1958'a em zewicîn. Suna min jî 1959'a Xwedê da.

Çar gede me wûn. Min dirûn dikir, Heyder jî ket memuriyetê. Me li Polatliyê xanî çêkirin. Em ê rind bûn. Fiqaretî qet nedihat bîrê



Zara Hacî Îwiş bi malbata xwe re.

Foto: M. M. Hîne

me. Ê dewletî jî dilê xwe bi me di-
ma. Lê şûnde me bar kir Enqerê.
Geda xwendin. Sinan, Sevda diçû
Enqerê dihat. Sema bû mialim, çû
Agiriyê. Me nîrî dike newe, me bar
kir Enqerê. Sevda ODTU sosyoloji
xwend, Sinan jî felsefe xwend.

Em ê rind bûn, lê felek neşa me
bir. Sevda 41 salî wû wefat kir. Lê
şûnda me bar kir, em hatin Foçayê.
Vê Foça jî Sevda rû me da. Sevda
got, baba madem hûn kê bar kin,
herin Foçayê, ez Foçayê hez dikim.
Deh û şeş sal in em li vir in. Sevê
gedê Sinan em çûn sê sala li Stenbolê
man. Paşê em dîsa çûn sê sala li wir
man. Min hîngê *Dayikên Şemiyê*
dîn. Ez her hefte diçûm hindê wan.

Çend sal in tu diçî ba Dayikên Şemiyê?

Zara Hacî Îwiş: Riya siftê ve ez
diçûm. Nizanim dehûpênc, dehû

şeş sal bûne. Ku ez li Stenbolê
wûma ez tim diçûm hindê wan. Ez
her hefte diçûm, rind jî wû.

Tu dikarî hinek ji me re qala Şîlanê bikî?

Zara Hecî Îwiş: Millet xeftan cihîşt.
Qumaşa xeftanê jî li dukana bavê
min pir wûn. Mi go ez vana çê bi-
kim. Min got "*Kültürümüzü canlı
bir kadında yürütemem ama bir taş
bebeğe yürütürüm*" (Ez nikarim çan-
da xwe li jineke zindî bikim, lê dika-
rim li bûkeke nezindî bikim). Min
girt va bûka çekir. Mi navê Şîlanê lê
kir. Zvakî me hat go "Bûkê, heyra-
na çavê te, vê bûkê bi min de! Te çi
xwest ez bi te dim." Mi go, na. Ba ev
jî torinê mi re bimê.

Te Şîlan 45 sal berê çekir?

Zara Hacî Îwiş: 45 sala zêdetir e.
Sinan diwê ez çûk bûm te Şîlan

çêkir. Belkî 50 sal e. Porê min dirêj wû. Min porê xwe jê kir, hunand û min lê kir.

Ew porê te ye. Hîn spî nebûye?

Zarê Hacî Îwîş: (Dikene) Porê min hîngê reş bû.

Dema ku hûn li gund bûn, di dawetan de we kêjan govend digerandin?

Zara Hacî Îwîş: Me baz dida, govend dikişand. Li dola zirneçî jî hewûn. Lê me bixwe jî digot. Me kilam digotin:

*Meyrê rawe siwa ye,
dengê diqa qewe ye...*

Pir wûn, me bîr kir, çû...

Em sê linga pêşde diçûn, sê linga paşde dihatin û me kilama Cemîleyê digot:

*Paş mala Cemîle neqew e
Pêş mala Cemîle neqew e
Xwezgîncî kaw e kaw e
Ez mirim tu sebeb e
Way Cemîle Cemîle...*

Gedelixê me rind rawirî. Em feqîr newûn. Pez hewûn, bargîr pir bûn. Berêvarê ez diçûm min bargîr çex dikir. Canîkî me yî reş hewû. Ez

çûm min go ez bînim, min dî gur ew birîndar kiriye. Li nav saza, li Kevirêqul² gura xwariye. Bavê min her ro bi taseke *ereb sabunu* ew birîna bişûsta. Birîn xweş wû. Hespê me weyn wû, li gund tenê wû.

Em diçûn Înê Osê. Sê çar mal em diçûn wira. Bîra me hewû. Bîr pir kûr wû, av bi kera dikişandin. Bazi ez jî lê siyar diwûm. Pez dihat, digotin olix a tijî kin. Ez li kerê siyar bûma biçûyama, biçûyama, digotin “ÊÊ” heywan hu kiriye demekî hema dadiwestî, çex diwû dihat. Dewle dikişandin, av boş dikirin, dîsa dixistin bîrê. Dewle xwe çerm bû.

Pezê me pir bû, pez dikirin bêriyê, ca siwê ca êvarê pez didotin. Şûna ku lê mexel diwû digotin fêz. Carkê li Înê Osê pez li fêzê rêz bûye heta ber mala me hatiye. Bavê mi hatiye ku gur ketiye nav pez, pez dixwe. Bavê min gotiye “Ca meke ez lê sêr kim, ka va gura dike çi bike.” Wî gotiye qey dike yek xwe re hilgire here. Niriye gur difetisîne dihêle, difetisîne dihêle. Hîngê bang kir haho, haho! Kûçik hatin, gur reviya, lê pez bela bela bû. Mekî pez berhev dikirin. Deh û dû mî miribûn.

² Kevirêqul bi saza xwe navdar e. Gelek gundên nêzik berê dihat ji vir qamiş dibirin û xanî çêdikirin. Cihê ku çiroka Qamişê Qul tê de derbas dibe ev der.



Bûkikên ku Zara Hacı Îwiş bi hunera xwe çekirine.

Foto: M. M. Hine

Sala ku cara ewil hûn çûn Polatliyê, li Polatliyê çi qas kurd hebûn?

Zara Hecî Îwiş: Me kurmanc dihemcartin. Sih mal hewûn. Mala Reşîdê Kolê hewû li Sîna³. Gedê wan paşê şirketa Baysal vekir. Kol jî xaltiya bavê min e. Meta min Basot jî dane Reşîd. Mala Osikê Soto hewû, lê re digotin Osman Alabay⁴. Ew jî zû wefat kir. Diya Osik Xaltiya Duduk me re merilixi dikir. Westê bavê min û diya min savê kirîna malê dukanê diçûn Stenbolê, em li

mala Xaltiya Dudikê radiketin. Rehmetî Osik hîngê diçû ortaokulê. Osik yekî çekîngen bû. Hîngê em pir ser hev de diçûn dihatin.

Merîkî Osik li gundê Sîna cara siftê qamyon anîbû gundê me û genimê me bar kiribû. Wê çaxê em gede wûn. Hîngê motor jî tunewû. Nêzikê em herin bajêr apê min motor anî. Lê biçerdover hewû. Gundiyekî me biçerdover kiribû, anî gund. Milet gî bi ereba bargîra wû. Erebe ga jî li gundê me pir hindik bû.

³Gundekî kurdan a li Yunaxê ye. Ev gund jî eşîra Canbegan e.

⁴ Osman Alabay, yek ji nivîskarên kovara Bîrnevîbûnê bû. Li ser zargotina kurdên Anatolyayê gelek berhemên devkî berhev kiribûn.

Li gund we çi penêr çêdikirin?

Zara Hacî Îwîş: Diya min rûn çêdikir, dixist avrijên, paşê jî pendirê yawan jî dixistin posta. Li Denizliyê bi ereba hespa dihatin pendir dikirîn, hêjîr û mûj difrotin. Diya min bi şîlafa berxa maya pendir çêdikir. Şîlaf ez diwêm mîdê berxa ye. Berx şerjê dikirin, şîlafa berxa nediavêtin pê maya çêdikirin. Hinek jî hêjîr dikirin. Şîlafa berxa dixistin nav kûzekê, pê maya pendir çêdikirin. Paşê bavê min li Akşerê hat diya min re got, “Êndî tu bi şîlafa berxa maya çêneke. Bindire, mi te re şuşeke maya anî.” Lê şûnda bi wê pendir çêkirin dixistin kûpa. Kûp jî ji Yormali û Emîrdağ û Gunyuzuyê tînan. Bajarê me yê nêzik ew bû. Kûzê avê jî tînan difrotin.

We li gund çawa nan çêdikir?

Zara Hacî Îwîş: Me li ser sêlê nanê zirav çêdikir. Neh deh ro carkê me nan lêdixist. Carkê diya min got “Lê lê, diwên li Yunaxê şeş me carkê nan lêdixin. Paşê gundiyan me jî mîna yê Yunaxê nan lêxistin.

We di teştê de çi dixwar? We çay çêdikir?

Zara Hecî Îwîş: Mistoyê birayê min li Polatliyê çay anîye, em gî li dorê civiyane hev. Mistoyê birayê

min çîkî kofalak bû. Yaziyê xwe jî rind bû. Çay anî, derve cezwe keland, çay avêt û ser jî çîkî por kir. Paşê demlemîş bû. Çay weng dirêj rû kir. Em pê kenyan me got “Tu çima weyn dikî?” Wî jî go, ev weyn diwe. Paşê bavê min jî çay kirî û lê şûnda me tim qaweltî kir. Çay paşê hat, lê qawe berê hewû. Tawa me hewû, aşê qawe hewû. Me qawe diqewirand û dihêrand. Hîngê ku mêvan hatin me qawe dida.

We qebwe çawa şîrin dikir? Şekir hebû?

Zara Hecî Îwîş: Erê şekir hewû. Me tim şekir li bajêr tîna.

Dogme hebû?

Zara Hecî Îwîş: Çanaxkî me yê gir hewû. Sifte goşt rîsi dikirin, oko dirêj dirêj dibirîn û xwê dikirin. Lê re rîsi diwên. Didan ser bendekê, hişk dikirin. Diya min ew tîna ser destarê xwê. Xalanê min pê bulxir jî pê çêdikirin. Me ew nedî. Şivanê me xwê pêz ser wî destarî dikir. Diya min kevirê destar û kevirê xwê temîz dikir. Wa risî li ser kevir datîna, bi kevirê lêdixist û pan dikir, dikir wê çanaxê. Biberê toz pê wer dikirin. Kîmyon jî pê wer dikirin. Zivistanê diya min ew dogme derdixist dikir ber şîva.

Wekî din tomast hebû. Mastê payîzê dimeyandin, qeymaxê wê digirtin, dixistin nav avrêja. Qeymax weyn top bikirana. Ew jî suzmîş diwe. Qum dikirin bin avrêja, weyn qaymax û pendir ziwa dikirin. Ew masta ziwa dibû, digirtin hûrê berxa temîz dikirin, dişûştin, mîna yê sicuxa dikirin. Paşê ew mastê hişk dixistin nav hûra û rind tiji bikirana. Hinek jî reşpeşik bixistana. Paşê dev girê didan û dardixistin. Ew weyn hişk diwû. Paşê ku zemanê xwe hat hûr hûr dibirîn pendir derdixistin. Marîfeta wî dike nekeşte. Keşt xirê tomast kewikî diwe.

We qet şîranî çêdikir?

Zara Hacî Îwîş: Na, qe şîranî tunewû. Me dikirî. Tiriye me tunewû em corcor⁵ çêkin. Me xoşav çêdikir. Kurmanc bê xoşav nawe. Nivankî ma hatin, mitleqe xoşava xwe çêwe. Ema reçil û şîranîye din tunewûn. Sucux, pastirme tiştê weyn jî tim dikirîn.

Demek pastirme berê ucuz bûye. Berê mayîne de kirîş diwûn, bavê min pastirme dikirî, yekî gir, li kirîşê dardixist. Me gede rokî bê dê û bavê xwe em nedîçûn çîçikî jê nedikir, nedixwar. Me tenê ser sifrê dixwar.

Dema ku tu zarok bûyî li gund barge û qîşle hebûn ne wisa?

Zara Hacî Îwîş: Em zivistanê li qîşlê diman, biharê, meha nîsanê em dihatin barge. Xaniyê me yê li qîşlê pir rind bû. Du qat wû. Bavê min bi xwe çêkirin dawû.

Tevna we hebû?

Zara Hacî Îwîş: Teyn hewû. Me xali çenedikir. Basota xwuşka min ter çêdikir, cilê hespa çêdikir. Namazlixê filikê çêdikir.

We çito boyax dikir?

Zara Hacî Îwîş: Boyecî dihatin gund. Tema ku payîz bû tê ca bindira boyecî bayn kin. Me rîsê xwe çile dikirin dibirin reng reng, te kîjan xwestiye dixistin nav stîla dikelandin û boye dikirin. Paşê ziwa dikirin. Ê bidana, perê xwe hilgirtana. Me bi xwe jî boye nedikir.

Metê, mala te ava. Sobbeteke gelek xweş bû. Tu her hebî.

Zara Hacî Îwîş: Mi jî pir kêf da. Rind bû tu hat me bi zimanê xwe deng kir, me qala zemanê bere kir.

⁵ Di nav Canbegan de ji bo dims, corcor tê gotin.

Helbest

Seyfî Doğan

-1-

tu
wî kalî ku ji jêr da teyî
nasdikî
wî kalî ku sihê xwe
wek notên kilameke şînê
li ser axê zer dihîlîze
ew kalî ku wek pelekî payîzê ku
li ser pêlên behrê dihejê
ew kalê ku wek kurşunê giran pi rê tere
ew kalê ku li dijî axkêşanîyê li ber xwe dida
ew kalê ku xwe bi cokî xwe da nûskandî
ew kalî ku li wan hersê bûkan temaşe dike
û qewsere ji hundir da dikşîne
ew kalê
serşivan bû
keriyên mezman cêrandin
çoyê wî li hewa wek buriskên biharê dihîlîst
pezî xwe ne gur ne jî diz nezîkê dibûn
lê ew bi xwe dizekî bi nav û deng bû
ne seat ne jî pusula xwe hebû
li gor rojê gav diavitin
kulavî wî li ser milên wî
deşt bi teşt
çîya bi çîya gerîye
kelekên xwe li ser erdê hîşk êşîyan
zureûzurên guran xêwên şevan lê herimandin
dî taldî zinaran da ar dada
şîrê guhangerm li xurînê vewxar

bîra zarokên xwe kir
bi hasretê jina xwe bû
hêstirk ji xwe re dikirin heval û dişlik
dema ku hesret aşt ne dibû
tûtin bi du kaxizan dipêcan
û heya bilurê dikir
te niha naskir?

-2-

ma tu carekê tûyî şîrî dayîkê xwe nekî
tê bi serxoşî heremzadetiyê bibî
tê pê le xalîyê ku destên nazli dagirtinî
wek lingşewitîya li nav malan derî bi derî bigerî
û parsîya merhemetiyê bikî
li ser her benî bihilîzî
lê tu li tu deran bi cîh nabî
tu normên ehlakî û dînî nasnakî
edî tu xulamekî bi hefserî
ê te hertim erîşa kokên te bikin
ji bo ku li rêzên pêş xuya bikî
tê bi qesmarekî bêderman bî
sewê tê etîk û estetîk
û heqî porsipîyan û rûsipîyan hekat in
cavên te yên pêl yên herdem
li benda îşmarekê bin

Rešo

-II-

Ecevit Yildirim

Li ser komkujiya Helepçê re çend meh derbas bûbûn. Êdî ne medya û ne jî kesekî din qala komkujiya li Helepçe nedikir. Ew hovîtiya ku li wir qewîmîbû hatibû jibîrkin jî.

Dema havînê bû. Dibistan ketibûn betlana havînê. Talebe gî bi hatina betlaneyê pir şa dibûn. Lê Rešo nedixwest betlane bibe. Ji ber ku gava dibistanên resmî diketin betlaneyê, Rešo mecbûr bû teve qursa quranê ya li camiyê bibe.

Bavê wî maneyeke pir mezin li perwerdeya dînî bar dikir. Kom û komeleya ku ew kara dikir jî karê xwe bi baweriyê mezin bi cîh dianîn. Di demên betlaneyên dibistanê de her sibehe bi mînbûsan mal bi mal digeriyan û talebeyên qursa quranê yek bi yek bi mînbûsê kom dikirin û dibirin navçeya ku camî lê hebû.

Rešo jî serî de û tu car jî li camiyê germ nebû. Atmosfera li camiyê jê re wekî dinyayeke xerîb û jî mentalîta wî pir dûr bû. Rituelên di camiyê de jê re xof dihatin.

Talebe gî bi hev re, bi xwendina pirtûkê ku ji zimanê wê yek

gotinek jî fam nedikirin mijûl dibûn.

Gava dema nimêjkinê dihat, xoce derbasî pêşiyê dibû û civatê jî li dû xoce saf digirtin û kiryarên wî dubare dikirin, nimê dikirin. Aqilê Rešo nedibirî, ku ewqas însan çing bi hev re heman tiştî bikin. Ne tişteki xwezayî bu.

Di avûrûyê camiyê de ew jî hevalên xwe yên fûtbolê jî dima. Welhasil sibehe saet hîn zû bû. Lê mînbûsa camiyê li ber mala wan xuya jî kir. Rešo hema qurana xwe kir destê xwe û li mînbûsa camiyê ya li ber malê dawestîbû nişt (siwar bû). Rešo silav li hevalên xwe yên di mînbûsê da û heta camiyê ketin nav sohbet û muhbetê. Piştî demekê mînbûs gihîşte camiyê. Talebeyan giya bi hev re rêya avdestxaneyê girtin.

Prosedûr û qaîdeya qursê weng îcab dikir. Berî derbasbûna hindirê camiyê avdestgirtin îcab dikir.

Piştî girtina avdestê talebe derbasî hindirê camiyê bûn û ketin hindir. Her yekî qurana xwe da ber xwe û heta ku xoce were xwe pê

egle dikirin. Piştî demekê xoce ketê hindir. Silaf li talebeyan kir û got:

– Kurikno! dibistana we ya resmi niha bi şeş hefteyan ketê betlaneyê. Ew ji bo me derfeteke mezin e. Emê di van şeş hefteyan de giraniyê bidin ser xwendina quranê ya bi tecwîdê. Hûnê her sibeh werin û heta êvarê li vir bin. Gerek her yek ji we xwe herî kêr fêrî xwendina quranê ya bi tecwîd bike. Gerek her yek ji we yasîne jî ezberê bike. Ji hêla din ve gerek hûn zanibin; Li Bulxaristanê komûnîst zilmê li birayên me yê misilmanên tirk dikin. Qomonîst dixwazin misilmanan asîmile bikin. Dengkirina bi tirkî qedexê dikin, navên gund û bajarên tirkan tên bulxarîkirin. Li wan tê ferzkirin kû navên bulxarî li xwe bikin. Nimêjkin, rojgirtin hatiye qedexekirin, cejna qurbanê û ya remezanê hatine qedexekirin.

Em jî birayên xwe yê misilmanên tirk li Bulxarîstanê naxwazin bi tenê bihêlin. Ji ber wê jî emê roja şemiyê herin zilma komûnîstên Bulxaristanê li bajarê Kolnê protesto bikin. Bila haya wê jê hebe, mîting jî wê bi xwendina qûranê destpê bike. Ezê we di van rojan de test bikim, ki ji we kanibe sûreya Yasîne xweşikîr bixwîne, ewê li meydana Kolnê jî sûreya

yasîne li hember bi hezaran însanan bixwîne.

Xoceyê camiyê gora xwe motîvasyoneke xweş dabû talebeyan. Motivasyona xoce bandor li ser talebeyan kiribû. Her yekî bi deng û awaza xwe qurana li ber xwe dixwendin. Dengê xwendina quranê hindirê camiyê tev dagirtibû. Bi nivro dema navberdayîne bû. Bi qasî niv saetê talebeyan di hewşoya camiyê de navber didan. Di navbera nivro de mijara talebeyan zilma li musulmanên Bulxaristanê tê kirin bû. Talebeyan di nava hev da deng dikirin. Hema bêje hemûyan kiryarên dewleta Bulxarîstanê şermezar dikirin. Helwestên wekî; tirk û misilmanên li Bulxarîstanê ne bi tenê ne û xwedîderketina li wan wekî qaideyekê insanî û îslamî dihat qebûlkin.

Her ku qala zilma li tirkên Bulxarîstanê dihat kirin, komkujiya Helepçe dihatê bîra Reşo. Birîna Helepçe hîn teze bû. De tu were wê, weşeta li Helepçe ne xema tu kesî bû. Ne xoceyê camiyê, ne serokê wê, ne rêvebirekî wê û ne jî yekî ji civatê xêra xudê rokê qala Helepçe nekiribû. Hebû, nebû tim qala Afxanîstan, Fîlîstîn, Îsrail û niha jî qala tirkên li Bûlxarîstanê dihat kirin. Halbûkî serokê camiyê

bi xwe jî kurdekî ji Omera bû. Firat jî lawkê wî bû. Firat talebeyekî jêhatî bû di xwendina quranê de. Quran herî xwesik wî dixwend.

Reşo di firsendekê de mijar ji Firat re vekir û got:

– Firat, va îşî Bulxarîstanê çi ye yaw. Aqilê min vê meselê qet nabire ha!

– Çima?

– Tê gotin ku li Bulxarîstnê zilm li tirkên tê kirin. Erê rast e. Lê, çend meha berî niha li Helepçe bombeyên kîmyewî li ser Kurdan hat barandin. Wê çaxê deng ji tu kesî derneket. Ez wê yekê rast û durist nabînim. Tu çi dihizirî ?

– Bi min tiştêkî xof di vir de tune ye.

– Madem em misilman in, wê çaxê gerek em ji her kesî re eynê helwestê diyar bikin. Bi min ya ku hatiye serê kurdan ji ya tirkên li Bulxarîstanê girantir e.

– Çi eleqeya me bi kurdên li Helepçe re heye?

– Çing yanî?

– Em tirk in. Ew jî kurd in.

– Weng nabe Firat. Em jî kurd in. Helepçe jî kurd e.

– Na lo, em ne kurd in. Em li Tirkîyê dijîn û em jî tirk in, tirk jî tirk in.

– Ew çi mantiq e Firat? Madem

weng e, wê çaxê tirkên li Bulxarîstanê jî Bulxar in!

– Na na, ne weng. Bulxarîstan kafîr e, komûnîst e. Li hember wan kafîran gerek em li birayên xwe yê tirk li Bulxarîstanê xwedî derkevin.

– Wele Firat, madem Helepçe ne ji me ye, ma çi bi me hatiye. Zilma ku li Bulxarîstanê heye li Tirkîyê jî heye. Çi zilma ku Bulxarîstan li tirkên dike, Tirkîyê jî li kurdan dike. Li Tirkîyê jî kurdî qedexeyê, navên kurdî qedexeyê, navên gundan kirine tirkî. Mesela navê gundê we bi kurdî Omera ye, bi tirkî kirine Tavşançalî. Va ne zilm û neheqî ye ?

– Va tiştên ku dibêyî jî aqilê min nabire. Ya ku ez dizanim, em tirk û misilman in. Bulxarîstan jî zilmê li birayên me yê misilman dike û em jî gerek birayên xwe yê li Bulxarîstanê bi tenê nehêlin.

– Yahû tu çima naxwazî qebûl bikî, zilma li Bulxarîstanê ku tu qalê dikî li gundê te jî heye. Tu çima qebûl nakî?

– Reşo min ji te re got, va îşana nakevin aqilê min. Dibe ku gundê bavê min gundekî kurdan be, lê gerek tu bizanî diya min jî tirk e û ez jî xwe wek tirkekî qebûl dikim. Loma ez birayên xwe yê tirk li Bulxarîstanê bi tenê nahêlim. Eger

tu pir dixwazî, tu jî here ji bo Helepçe tiştêkî bike !

– Wele Firat ez vê yekê nikanim qebûl bikim. Tiştê ku li vir diqewime ne heq e. Bi vî awayî ez nikanim teve mîtinga li Kolnê bibim. Madem tirkên li Bûlxaîstanê birayên te ne, kurdên li Helepçe jî birayên min in. Ez jî bi dilê xwe bi wan re me !

– Tu bi dilê xwe yî ...

Firat berê xwe da camiyê û ji cem Reşo veqetiya. Kes nemabû li hewşoya camiyê. Talebe gî ketin camiyê ku dersa xwe berdewam bikin. Reşo teneke din li bexçeyê camiyê ma û li ser mineqêşeya bi Firat re hizirî. Zilm li kê bê kirin zilm e. Çi kurd be, çi tirk be, çi misilman be û çi jî xristiyan be.

Camî mala xudê ye dihate gotin. Lê di pratîkê de camî ne mala xudê bû, mala Tirkan bû. Zimanê camiyê tirkî û erebî bû, rabûn–rûniştin, dan û standin, ruh û hestên civata camiyê her tişt bi tirkî bû.

Civata camiyê bi piranî tirk bûn. Tirkên li Bulxaîstanê jî perçeyek ji netewa xwe dihesibandin. Va tiştêkî xwezayî bû jî. Qet nebe ji bo xatirê kurdên ku dihatin wê camiyê, bi du gotina be jî qala komkujiya Helepçe

gerek bihata kirin, dihizirî Reşo. Lê komkujiya li Helepçe ne xema kesî bû. Ji ber camî camiyeke tirkan bû û civata wê jî hema bêje gîştik tirk bûn. Ma çi bi kurdan hatibû. Ji hendik kurdên heyî jî tu bertek tunebû. Ew jî bi ber bayê tirkan ketibûn û bi yekdengî gotin û helwestên wan dubare dikirin. Wekî ku her yekî ji wan kevirêkî ji ezman li serê wan ketibe, pergela xwe şaş kiribûn. Ser de jî xwe ji kurdbûna xwe dût dimêrandin. Gotina Firat ya ku digo diya min tirk e, gotina bavê wî anî bîra Reşo. Ma wî jî dema komkujiya Helepçe negotibû; Ew ne kurdên heqîqî ne. Kurd civateke entersan bûn. Ji Kurdbûna xwe dût disekinîn, lê belê tirkan û tirkên li Bûlxaîstanê wekî birayên xwe dihesibandin. Eşkere bû, ku kesî qîma xwe bi kurdî û kurdbûne nedikir. Ma ewqas însan şaş bûn, Reso tenê rast bû, bi xwe û xwe dihizirî Reşo. Belkî jî di gotina bavê wî de rastiyeke hebû û ew ne kurdên heqîqî bûn! Çi gotibû bavê wî; Kurdên heqîqî Kurdên Dersimê ne!

Pirsa ku Reşo niha lê bigere êşkere bû; Dersim ku der e û kurdên Dersimê kî ne !


Kurtenasandin

Meriv dikane romana Fikret Yildiz, *Li benda keskesorê* wekî romaneke biyografyayî jî bi nav bike. Di romanê da, rastî û xeyal di zik hev da ne. Bingeha romanê sereke jiyana Osê, bendewarê keskesorê ye. Osî ku nêzika dused salî di ber vê li gunde Mikaila (Polatli/ Tirkîyê) jiyîye.

Di kuriktîya xwe da, Os qezake piçûk, lê encamgiran derbas dike û lêva wî ya jor didire, êw lêvse dimê. Her tişt bi vê qezayê destpê dike. Carina qezabelake piçûk jiyana meriva serûbin hev dike û dibe sebaba bûyer û guhêrtinen mezin. Ji avûrûyê lêvseyî da Os pir û pir bi ber xwe dikeve û ji dilketîya xwe Hewê dûr disekine, jê direwe. Ji ber vê serhatiya dramatîk û tengîya jiyana eşirtiyê, Os bêzar dibe û direve, serîyê xwe heldine dihere Stembulê.

Rev û rêwîtiya Osê ya Stembulê ya bi hespê qir û seklawî macereyeke bi serî xwe ye. Li Stembulê, Os dihere medreseya Mewlane Xalîd û li wir melatîyê dihêvise. Li Stembulê ew Kevorkê ermen yê zêrfroş û keça wî, Asparikê nas dike. Paşê ew pê Asparikê va dizewice û herdu bi hev ra bextiyarîyê tam dikin. Lê pir najo, Asparik ducanî dibe û gava ku dergûşa wê tê dunyayê, ew û dergûş dimirin.

Ji çuyîna Stembulê panzdeh salan şûnda, Os vedigere cîh û warê bav û kalan û ba dê û dotên xwe. Ew careke



di dizewice, dilketîya xwe, Hewê li xwe mahr dike. Os xêran dike, camîya gund ji nûva dide çêkirin û dihere Hec. Li Hecê Os du kole û carîyekî dikire û bi xwe ra tîne gundê xwe. Serpêhatîyên wan bi êş û balkêş in.

Nivîskar, Fikret Yildiz di vê romana xwe da xeyal û rastî bi hostetî bi hev va hunandiye. Wî qehremanên romanê û serpêhatîya wan û qewimîyên wan dem û dewranan, êş û derdên giran yên wî zemanî zindî kirine.

Di romanê da, kon û warên kurdên Anatoliyayê bi taybetî yên êla Mikailî, rabûn û rûniştinên wan yên wê serdemê bi hûrgili û bi zimaneki heriqbar û nêzikî zaravayê Mikaila hatine nasandin.


“*Li benda keskesorê*” li benda xwendinê ye. Min ew xwend û jê hez kir. Pîroz dikim!

Nuh Ateş

Kitêbên kurdî
yên dersê
ji weşanxaneya Apecê

GRANIAS
TĂRAR





Şerê li ser caw VIII, 110 x 90 cm, teknîka tevlihev a li ser caw ji firca Hasan Hüseyin Deveci

<http://birnebun.eu>